
# LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK

NRLS

NAVENDA ROJAVA YA LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK

KOVAREKE DEMSALÎ JI NAVENDA ROJAVA YA LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK TÊ DERXISTIN - HEJMAR 14 PAYÎZ 2024




- **DOZÊN EWLEKARÎ Û BERGIRÎYÊ YÊN LI BAKUR Û ROJHILAYÊ SÛRÎYÊ**
- **EWLEKARÎYA XWARINÊ LI BAKUR Û ROJHILATÊ SÛRIYÊ**
- **BIPÊŞXISTINA PERGALÊN ÇANDINÎYÊ LI HERÊMA BAKUR Û ROJHILATÊ SÛRÎYÊ (WEKE BERSIV LI HEMBER GUHERTINA SEQAYÊ)**

Desteya nivîser:

**Hejar Şekir**

**Yûsif Mistefa**

**Kurdyar Dirêî**

Nexşedan: **Ehmed Mela**

Hemû danstan bi navê sernivîser li ser navnîşana jêrîn tên kirin:

nrls@nrlsrojava.com

Ji bo serdana sîteyê:

www.nrls.net

**Weşanên Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk (NRLS)**

**Mafên çapkirin û weşanê parastîne**

**Hejmara (14) Payîz – 2024**

**NAVEROK**

**GOTINA HEJMARÊ........................................................................... 4**

**DOZÊN EWLEKARÎ Û BERGIRÎYÊ YÊN LI BAKUR Û ROJHILAYÊ SÛRÎYÊ........ 5**

**EWLEKARÎYA XWARINÊ LI BAKUR Û ROJHILATÊ SÛRIYÊ ........................ 73**

D. Murşid Yûsif

**Bipêşxistina pergalên çandinîyê li herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyê (weke bersiv li hember guhertina seqayê) .................................................... 90**

## GOTINA HEJMARÊ

**Xwendevanên hêja:**

Bi bersivdayîna pirsên sereke yên wek: Siyaseta dijminane ya rêjîmên herêmî, çawa bandorê li dozên ewlekarî û parastinê yên li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê dike? Rêveberîya Xweser çawa bersivê dide rûbirûbûyînên cihêreng ên ewlekarî û jîngehî? Ew jî bi bersivdayîna li pirsên nesereke yên wek: Têkilîya di navbera têgehên ewlekarî û bergirîyê de çawa ye? Berztirîn rûbirûbûyînên ewlekarî yên ku herêm rastî wan tê, çi ne? Çarçoveya ku tê de danûstandinê bi van rûbirûbûyînan re dike çawa ye? Pêşniyarên dijderketina van rûbirûbûyînan çi ne; lêkolîna ″ **Dozên Ewlekarî û Bergirîyê Yên Li Bakur û Rojhilayê Sûrîyê**″, dixwaze armanca lêkolînê yên avakirina nêrînekê da ku pê dîmena ewlekarîyê di sala 2024 de, eşkere bikin, ew jî ji bo ku bala kesên ku li ser sazîyên Rêveberîya Xweser radiwesin û raya giştî bikişînin li ser van dozan, pêk bîne.

Jixwe ewlekarîya xwarinê, beşeke sereke ya ewlkarîya welatekî ye, ji ber kes û welatên ku ewlkarîya xwarinê bi dest bixin, dê azad û xwadî biryar bin. Lêkolîna ″ **Ewlekrîya Xwarinê Li Bakur Û Rojhilatê Sûriyê**″, vê pirsgirêkê şirove dike û ji bo bidestgxistina wê, çend pêşniyaran pêşkêş dike.

Êdî ji bo bidestxidyina ewlekarîya xwarinê di rewşa guherînên seqayî wek bilindbûna pileya germahîyê, zuhabûn û hwd, her wiha şêwazên avdanîyê yên kevin û rewşa şer û neewlkarîya li welêt, pêwîstî bi pêşxistina pergalên çandinîyê heye, êdî lêkolîna ″ **Pêşxistina pergalên çandinîyê li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyayê (wek bersiv li hember guhertina seqayê)**″, hewld dide ku vê mijarê têr û tijkî bike.

**Sernivîser**

# DOZÊN EWLEKARÎ Û BERGIRÎYÊ YÊN LI BAKUR Û ROJHILAYÊ SÛRÎYÊ

**Pêşek:**

Tevlîhevîya siyasî (kawsa siyasî)[1] tê wateya nebûna ferwerîyeke cîhanî di ser dewletên neteweyî re ku bikare pergala navneteweyî bisepîne. Êv yek bi xwe re rewşeke nezelalî û gumanan çêdike û berê wan dide wê yekê ku bi niyetin nerênî li hevrikên xwe binêrin; êdî bi dest xwe re ev yek dihêle ku tevdîrên xwe yên ewlekarî bigirin, mîna pirkirina çekan, lêçûna leşkerî û pêkanîna şerên derveyîn. Ev yek ji ber berteka dewletên beramber ku ew jî ewlekarîya xwe diparêzin, alozîyeke ewlekarî[2] bi xwe re derdixe; êdî li gor wê ev dewlet bi heman gavan bersivê didin û ber bi pevçîneke jêneger ve diçin; ew jî li gor dibistana rasteqîneyî[3] (dibistana dîtaneya têkilîyên navneteweyî). Bi tevî ku ev yek di rastîyê de nayê wateya ku bi rastî dê şer çêbibin. Ev alozîya ewlekarî bi şêweyê alozîyên aborî, siyasî û civakî, bi awayekî nerênî li ser gelên di bin desthilatdarîya van pergalan de bandorê dike; çi ku dadmendî, azadî û welatîbûn li gor pîvanên van pergalan, mîna wezaretên dewleta Oşînîya[4] ya aşopî, ji nû ve têne sazkirin.

---

[1] Pol Rowbinson. Ferhenga Ewlekarîya Navneteweyî. Çapa yekem 2009. Werger û weşan: Navenda Imaratê ya lêkolînên stratejîk – Ebû Dabî. R28.

[2] Alozîya Ewlekarî (Security Dilemma): Têgehek e ku rewşekê rave dike ku tê de xebata dewletekê ya ji bo xurtkirina ewlekarîya xwe, ewlekarîya dewletin din dixe bin gefan. Êdî dewletên din amadebaşîyan dikin ku bergirîya xwe bikin; ku êdî ew jî bi dest xwe re dewleta resen dixe bin gefan. Êdî ev di encamê de xebata ji bo xurtkirina ewlekarîyê, ewlekarîya tune dike. Heman jêdera borî. R272.

[3] Sebah Balê. Dîtaneya Rasteqîne di ravekirina lêkolînên ewlekarî de (Realism Theory in Security Studies). Dîroka weşanê 3.3.2021. Lînk: https://political-encyclopedia.org/dictionary/النظرية%20الواقعية%20في%20تفسير%20الدراسات%20الأمنية

[4] Dewleta Oşînîya ya ku li derdora wê bûyerên romana (1984) a nivîskarê inglîzî George Orwell (Corc Owêl) digerin. Ev dewlet amajeyê bi civaka hiyarerşîk û xapandina hikûmetê, her wiha çavdêrîya nepenî û lîstina dewleta stemkar a desthilatdar bi dîroka belgekirî dike. Ev hemû jî bi rêya çar wezaretên ku navên wan bi rastîya erkên wan re bi nakok in: Wezareta Rastîyê, Wezareta Aştîyê, Wezareta Hezkirinê û Wezareta Geşedanê. Jixwe wezareta hezkirinê ya herî metirsîdar e.

Ev tevlihevî di alozîyên Rojhilata Navîn ên dawîyê de têne dîtin ku alîyê rojavayî yê ku qaşo piştî hilweşîna Yekîtîya Soviyetê divê bûbaya hikûmeta cîhanî, nikare çareserîyên xwe -jixwe piştre hat nasîn ku ne çareserî bûn- li ser herêmê bisepîne. Weke tişta ku li Afganistan û Iraqê di destpêka sedsala 21ê de çêbûyî. Tişta ku dihêle berdewamîya vê yekê xuya be; berdewamîya alozîya Sûrîyê, şerê Xezayê û hewldanên Îran û Rûsyayê ku dijberên dewletên rojavayî ne da ku desthilata xwe ya siyasî û leşkerî li ser herêmê xurt bikin, heyanî asta ku Tirkî jî dixwaze cihekî xwe weke hêzeke herêmî bibîne û xwespartina li ser dewletên rojavayî kêm bike û mebestên xwe yên bûyîna hêzeke navneteweyî bi cih bîne. Hîn jî Neteweyên Yekbûyî bêçare ye yan jî vîna wê tune ye ku hevpeymanên xwe yên ku di herêmê de têne binpêkirin biparêze. Êdî qirkirinên komî, proseyên guhartina demografîk û koçberkirina milyonên mirovan pêk tên, lê diyar e ku berpirsên Neteweyên Yekbûyî tenê dikarin şermezar bikin. Her wiha hinek rapor ji rastîya xwe dûr têne amade dikirin; mîna rapora ku Rêxistina Lêborînê ya Navneteweyî[5] derxistî û tê de berpirsiyarîya binpêkirinên kampa Holê û yên di nava girtîgehan de, bêyî ku xwe bispêre tu çespan û rastîyên li ser erdê, diavêje li ser milê Rêveberîya Xweser. Li gor wê jî Rêveberîya Xweser di daxuyanîya xwe de eşkere kir ku tîma Rêxistina Lêborînê ya Navneteweyî[6] "serdana girtîgehên li Kampa Çînî ya li Şedadê û Panorama ya li Hesekê ku ji alîyê Hêzên Sûrîya Demokrat ve têne birêvebirin, nekiriye. Her wiha diyar e ku wan xwe spartiye hevdîtin û govantîya kesin girêdayî rêxistina DAIŞê yan jî şaneyên razayî ku belkî jî Rêxistina Lêborînê ya Navneteweyî li derveyî girtîgehan ew dîtine…".

Binkeftina dewletan bo çareserkirina alozîyên xwe û neçarebûna wan ji bo pêkanîna dadmendî û ewlekarîyê hiştin ku rêxistin û statuyin siyasî û rêveberî ji partî, komele û sazîyên sivîl derkevin ku ji alîyê civakên xwecihî ve têne destekkirin, da ku karûbarên wan ên cihêreng bi rê ve bibin. Li hin dewletên Rojhilata Navîn ev diyarde heye; mîna Libnan, Iraq, Sûrî û hwd. Siyasetmedarên

[5] Rêxistian Lêborînê ya Navneteweyî. Sûrî: Mirina komî, êşkence û binpêkirinên din li dijî girtîyan a piştî têkçûna Rêxistina Dewleta Islamî – Raporeke Nû. Dîroka weşanê: 17.4.2024. Lînk: https://www.amnesty.org/ar/latest/news/2024/04/syria-mass-death-torture-and-other-violations-against-people-detained-in-aftermath-of-islamic-state-defeat-new-repor /

[6] Malpera Rêveberîya Xweser. Zelalkirina tişta hatî derxistin.. têkilîyên derveyîn bersiva rapora rapora Lêborîna Navneteweyî dide. Dîroka weşanê: 28.4.2024. lînk: https://aanesgov.org/ar/?p=11630

rojavayî yên li ser raman dewletê tundrew in, hewl da ku li gor îdolojîya xwe rave bikin û di encama wê de têgeha “Pêkarên tund ên bê dewlet”[7] derxist; ku êdî weke têgeh ne zelal tê dîtin û li kêleka wê der barê çawanî û sedemên derketina wê de ravekirinin ne tekûz pêşkêş kirin. Êdî ev yek weke komên ku ji derveyî zagonê kar dikin; an ku weke “derzagonî” hatin binavkirin. Her wiha helwesteke ne avaker li beramberî wan hat standin; bi tevî ku ev rêxistin weke encama alozîyên ku seba siyaseta çêkirina dewletên neteweyî ya ji alîyê dewletên rojavayî ve çêbûne, pê re jî rola wan a di pêkanîna aramîyê û kêmkirina tundî û tevlihevîyê de. Nemaze ku têkilîyên dewletên hemdem û di bin fişara globalîzmê de ber bi pêşxistina van pêkaran ve diçin. Li gor hin lêkolerên rojavayî[8]: “Hevbandorîyên pergala navneteweyî di navbera du cîhanan de di nava dualîzmeke pêkvejiyanî de digere; ew jî “Cîhana dewletê” û “Cîhana pirnavendî” ne ku ji gelek beşdarên ku dikarin bandorê li ser karê navneteweyî bikin, pêk tên. Êdî ev yek bi xwe re şêweyekî beşdarîyan ê pir tevlîhev û zehmet derdixe. Li gor wê, hevdemî ku koma yekem xwe dispêre tekbûyîna beşdarîyên welatîbûnê; em dibînin ku koma duyem ketiye jêr rakêşanên bêşdarîyên nedisiplînkirî ku dînamîk û xwezaya wê xwe dispêre vîna azad a lîstikvanên tê de ku dikevin çareçoveyeke derveyî netewebûnê û rê dideyê ku bi nimûneyin cihêreng derkeve pêş. Beşek jê ji rêxistinên neferwerî pêk tê û beşa din jî ji bandora xebatên tekanî yên cihêreng…”

Dozên ewlekarî û bergirîyê yên piranîya dewlet, ferwerî û statuyên siyasî yên herêmê di nava hev de ne û êdî destwerdana karûbarên hundirîn ên alîyên din bûye beşek ji bawerîya siyasî, aborî û leşkerî ya piranîya dewletan. Li gor wê jî eger li gor stratejîya wê be dê destekdarê wê be û eger ne li gor stratejîya wê be dê dijberî be, her wiha eger sûdê nedê lê li dijî stratejîya hevrikan be, dê di navberê de bimîne. Ev yek di bi awayekî eşkere di helwestên tirkî, îranî, rûsî, amerîkî û hwd ên ji dozên ewlekarî û bergirîyê yên bakur û rojhilatê Sûrîyê re. Diyar dibe ku êdî bûye cihê guhdaneke mezin ji alîyê gelek danerên planên stratejîk ên van pergalan ve; êdî hinek hene dixwazin wê têk bibin û hinek jî bixin bin bandora xwe û serê wê bitewînin.

---

[7] Dr. Şehrezad Edmam. Pêkarên tund ên bê dewletê: Lêkolînek der barê çarçoveyên têgehî û dîtaneyî de. Kovara Siyasat Erebîya – Hejmar 8 – Nîsan 2014. Lînk: https://siyasatarabiya.dohainstitute.org/ar/issue008/Pages/Siyassat08-2014_Edmame.pdf

[8] Heman jêdera borî: R76.

Dahurandina dozên ewlekarî û bergirîyê yên bakur û rojhilatê Sûrîyê ku xwe bispêre proseyên siyasî, leşkerî û komplogerî yên bi navlêkirinên herî derbirîner, her wiha dahurandina raporên ku ji alîyê Hêzên Sûrîya Demokrat û Rêveberîya Xweser ên di warê siyasî, aborî, jîngehî û ewlekarîyê yên ji destpêka 2024an ve û raporên din ên têkildarî herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê, dikare pirsgirêka ewlekarî ya bakur û rojhilatê Sûrîyê û derdora wê ya jîwarî, her wiha peydabûna zemînekê ji bo derketina rûbirûbûyînin din ên ewlekarîyê di siberoja nêzîk de û di encamê de û li ser bingeha wan pêşkêşkirina hin çareserîyin guncav, bi awayekî baş zelal bike. Li gor wê jî ev lêkolîn weke hewldanekê ye ji bo balkişandina li ser vê pirsgirêkê da ku bi rêya vegotina rastîyan û gotûbêjkirin û dahurandina wan, were zelalkirin.

- **Girîngîya lêkolînê:**

Gelek lêkolînan di balkişandin û pênasekirina têgehên “Ewlekarî û Bergirî”yê de weke lêvegereke bingehîn xwe spartiye çarçoveya dewletê ku piranîya lêkolîneran tê de vedigerin peymana Westvalyayê 1648 Z. Lê belê di vê lêkolînê de em ê balê bikişînin li ser danasîna Rêveberîya Xweser ji ewlekarî û bergirîyê li ser hemû astên civakî û sazîyên leşkerî, ewlekarî, siyasî û aborî re ku dûrî desthilatdarîya dewlet nûnertîya wan dike. Ev yek rê dide ku nêzîkbûnek ji Rêveberîya Xweser û Hêzên Sûrîya Demokrat der barê dahurandina dozên ewlekarî û bergirîyê li bakur û rojhilatê Sûrîyê re, were avakirin.

- **Armanca lêkolînê:**

Balkişandina li ser berztirîn dozên ewlekarî û parastinê yên li herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê û awayê xwedîderketina li wan. Her wiha hewldana avakirina nêrînekê da ku pê dîmenê ewlekarî yê di sala 2024an de eşkere bikin. Ev hemû jî ji bo ku bala kesên ku li ser sazîyên Rêveberîya Xweser radiwesin û raya giştî bikişînin li ser van dozan, dê pêk were.

- **Pirsgirêka lêkolînê:**

Pirsgirêka lêkolînê di vê pirskirinê de ye: Siyaseta dijminane ya rêjîmên herêmî, çawa bandorê li dozên ewlekarî û parastinê yên li bakur û rojhilatê Sûrîyê dike? Rêveberîya Xweser çawa bersivê dide rûbirûbûyînên cihêreng ên ewlekarî û jîngehî? Dê bersivdayîn bi rêya pirsên şaxî pêk were: Têkilîya di navbera têgehên ewlekarî û bergirîyê de çawa ye? Berztirîn rûbirûbûyînên ewlekarî yên ku herêm rastî wan tê, çi ne? Çarçoveya ku tê de danûstandinê bi

van rûbirûbûyînan re dike çawa ye? Pêşniyarên dijderketina van rûbirûbûyînan çi ne?

- **Sînorên dem û cihî:**

Der barê çarçoveya demî de, dê bal li ser dozên ewlekarî û parastinê ji destpêka sala 2024an ve were kişandin ku tê de gelek pêşketinên dramatîk di helwestên herêmî û navneteweyî de çêbûn. Her wiha ravedana wan li ser ewlekarîya herêmê ku weke pêlek ji operasyonên tê de tektîkin nû yên ji bo têkbirina Rêveberîya Xweser, hatin bikaranîn. Pê re jî dê carinan vegerin demin heyanî astekê kevntir da ku têkilîya di navbera tiştên nû û sedemên wê yên seretayî de di ber çavan re derbas bikin.

Her wiha çarçoveya cihî jî; dê bal li ser herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê ku Rêveberîya Xweser wê bi rê ve dibe, were kişandin.

- **Rêbaza lêkolînê:**

Rêbaza wesfî ya dahuandinî, her wiha carinan dê xwe bispêre rêbaza hevrûkirinê jî.

- **Têgeh:**

Lêkolînê xwe spasrtiye têgeha “Rêveberîya Xweser” weke têgeheke berfireh ku pergala rêveberî, leşkerî, ewlekarî, siyasî, aborî, civakî û çandî li herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê ku weke rewşeke siyasî ya bêmînak di herêmê de û ji rewşên siyasî yên ku deverên din ên erdnîgarîya Sûrîyê, cudatir. An ku Rêveberîya Xweser a hermêna bakur û rojhilatê Sûrîyê, Hêzên Sûrîya Demokrat, Meclisa Sûrîya Demokrat, meclisên êl, pêkhate û komînan û ji bilî wan, di nava xwe dihewîne. Lê belê tevaya têgehên din dê li gor pêdivîyê di goşeyan de, kurteşîroveyek ji wan re were dayîn.

- **Serenavên beşan:**

**1.** Pêşek.

**2.** Têkilîya di navbera têgehên ewlekarî û bergirîyê de.

**3.** Rûbirûbûyînên ewlekarî yên li herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê hene û rêbaza danûstandina pê re.

Yekem: Bandorîyên siyaseta dijminane ya rêjîmên herêmî:

- Nêzîkatîya Rêveberîya Xweser ji siyaseta dijminane ya rêjîmên herêmî re.

Duyem: Xebatên tundrew ên rêxistina DAIŞê:

- Nêzîkatîya Rêveberîya Xweser ji xebatên tundrew ên rêxistina DAIŞê re.

Sêyem: Karên ku di çarçoveya sûcê birêxistinkirî de:

- Nêzîkatîya Rêvebrîya Xweser ji karên ku weke sûcên birêxistinkirî têne dîtin re.

Çarem: Der barê hilweşîna jîngehî de:

- Nêzîkatîya Rêveberîya Xweser ji hilweşîna jîngehî re.

**4.** Şerên nifşê çarem û yê pêncem weke navgînekê ji bo têkbirina Rêveberîya Xweser.

**5.** Bandora rûbirûbûyînan li ser jîngeha ewlekarî heyanî dawîya sala 2025an.

- Der barê ajendeyên pergala ferwerî ya herêmî de.
- Der barê xebatên rêxistina DAIŞê de.
- Der barê karên sûcê birêxistinkirî de.
- Der barê hilweşîna jîngehî de.

**6.** Navgînên bersivdayîna ji dozên ewlekarî û parastinê yên li herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê re.

**7.** Dawî.

**8.** Jêder û çavkanî.

- **Têkilîya di navbera têgehên ewlekarî û bergirîyê de:**

Ewlekarî û bergirî du têgehên bi hev ve pabend in ku yek ji wan bêyî ya din nabe. Her demê di danîna stratejîyan, rêvebirina alozîyan, rûbirûbûyîna gefan û dahurandina rûbirûbûyînên cihêreng mîna yên leşkerî, aborî, siyasî, jîngehî û hwd de, weke du têgehên sereke têne dîtin. Der barê ewlekarîyê de, ji ber pirbûna dozên wê, dayîna pênasyeke tekûz jê re, zehmet e. Lê belê piranîya

pênaseyên "Ewlekarî"yê[9] li derdora rizgarbûna ji gef, metirsî û tirsê û rêgirtina li ber wê ye. Her wiha xwedî rehendeke babetî ye; an ku çi qasî parastinê di vê rewşa mirov tê de dijî, peyda dike. Xwedî rehendeke xweyîtî ye jî; an ku çi qasî mirov bi ewlehî û azadîyê hest dike. Ewlekarî babeteke rêjeyî ye; li gor wê jî dibe ku mirov bikeve nava tirsekê de lê bêyî ku gef jê re hebe, yan jî gengaz e ku metirsîyek di siberojê de çêbibe. Ev yek dihêle ku em wiha bawer bikin ku ewlekarî ne tenê têkildarî rizgarbûna ji tirs an jî metirsîya ji tiştekî ku dê bi rastî pêk were ye, lê belê hin tiştên din jî di nava xwe de dihewîne ku gengaz e pêk were û jê re standina tevdîrên pêşwext divin. Ev yek bûye taybetîyeke balkêş a danasîna ewlekarîyê ya hemdem. Êdî bûye weke têgehgekê li kêleka ewlekarîkirina[10] dozên xwedî rehendên stratejîk tê bikaranîn, li gor wê jî xûyê ewlekarî lê tê zêdekirin, mîna ewlekarîya mirovî, ewlekarîya niştimanî, ewlekarîya navneteweyî, ewlekarîya jîngehî, ewlekarîya xwarinî… û hwd. Di encamê de em dikarin dozên ewlekarî weke çi helwest, gef, kar an jî rewşeke ku metirsiyê bi xwe re, tîne, rêz bikin. Dozên ewlekarî ji welatekî heyanî welatekî din ji hev têne cudakirin, her wiha dozên ewlekarî ji bo hemûyan heman in, lê li gor pêşkarîyê rêzkirina wan cuda dibe. Mînak; bazirganîya mirovan, madeyên hişbir, çek, belavbûna çekên tevkujî, teror û çetegerîya elektronîk (Hacker) berztirîn dozên ewlekarî ne yên ku ewlekarîya Amerîkayê dikin armanc. Her wiha zuwabûn, pevçûnên tîreyî û destwerdana tirkî û îranî di nava karûbarên hundirîn de, berztirîn dozên ewlekarîyê yên Iraqê ne. Armanca sereke ya pêkanîna ewlekarîyê, peydakirina saxlemîya mirov di warê madî û hestyarî di dema şer û aştîyê de ye.

Ewlekarî bi rêbazên cihêreng pêk tê ku awayê wan li gorî cure û qaseya metirsî yan gefê, her wiha li gorî tişta ku jîngeha derdor disepîne, dimîne. Li gor wê, xanîyên normal, penageh an jî odeya ewle (Panic Room) weke mînak ji bo navgînên pêkanîna ewlekarîyê di mercên cihêreng ên jîngeha ku mirov tê de dijî de, bibînin. Ji bo her navgînekê jî rêzikên wê yên taybet hene, lewre ji bo peydakirina ewlekarîyê ji bajar, civak, aborî, welat û her wek din re, navgînên

[9] Selîm Qesûm. Arasteyên nû di lêkolînên ewlekarî de (Lêkolînek der barê pêşketina têgeha ewlekarîyê di têkilîyên navneteweyî de). Weşan: Navenda Imarat a lêkolînên stratejîk - Ebû Debî \ Dewleta Imarat A Erebî ya Yekbûyî. Bê nimreya çapê û dîroka weşanê. R17.

[10] Pol Robenson. Ferhenga Ewlekarîya Navnetweyî. Werger û weşan: Navenda Imarat a lêkolînên stratejîk – Ebû Debî\Dewleta Imarat a Erebî ya Yekbûyî. Çapa yekem 2009. R268-269.

wan ên guncav hene. Ev yek weke derbirîna neyekser a têgeha bergirîyê ku bi dest xwe re yek ji navgînên parastinê ye, tê dîtin. Êdî parastin, girêdanka di navbera têgeha ewlekarî û ya bergirîyê de, tê dîtin. Li gor vê yekê, hewldanên parastina ji hemû êrîşên leşkerî yên cihêreng, ragihandina nerênî û bandorîyên alozîyên siyasî, aborî û bobelatên suriştî, weke derbirîna birêvebirina dozên ewlekarî û bergirîyê, têne dîtin. Mînak; şerkirina li dijî êrîşên DAIŞê, hêzên tirkî yan jî çalakîyên komploger ên rêjîma Sûrîyê û hevalbendên wê, her wiha beşdarbûna bi hêzên hevpeymanîya navneteweyî di şerê li dijî DAIŞê de, weke dozên ewlekarî yên li bakur û rojhilatê Sûrîyê têne dîtin. Êdî parastina cewherî yan parastina civakî, bicihanîna demokrasîyê, çakasazkirina jîngehî û diplomasîya civakî ji bo têkoşîna li dijî van metirsî û gefan, dikevin nava dozên bergirîyê. Mînak; amadekirina "Hêzên Parastina Civakê HPC"[11] ji bo şerê li dijî êrîşên rêxistina DAIŞê yek ji xwedîderketinên li dozên ewlekarî û bergirîyê yên li herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê ye.

Bergirî li cem mirovan bergirîyeke civakî ye, an ku hemû endamên komê bi awayekî hevbeş bergirîya xwe dikin. Êdî bergirî li kêleka xwarin û zayînê, erkeke resen a mirovan e û ne pêkan e ku jiyan bêyî wê bibe. Her çandek der barê têgehên têkildarî bergirîyê de, xwedî nêrîneke taybet e. Mînak; bergirî li gor bawerîya leşkerî ya kurdî tê wateya "Parastina hebûnê"[12] û li gor ferhenga Kambrêdc[13] a inglîzî tê wateya "Defence" an ku parastina ji êrîş an ziyanê ye yan jî çi tişta ku ji bo parastina ji êrîş an ziyanê tê bikaranîn e. Her wiha li gor ferhenga El-Meanî[14] ya erebî jî, bergirî tê wateya "Bersivdayîn û rêgirtinê.. an ku tişta ku di cengan de weke rêbazên bersivdayîna ji êrîşên dijmin re tê standin…" Cihêrengîya rêjeyî ya li cem her sê çandan derbirîna tirsa ewlekarî ya her yekê ji wan dike. Ji ber ku kurd rastî pêngavên qirkirina komî hatine, civakên ewropî gelek azar ji ber cengên olî û piştre yên neteweyî dîtin û civaka erebî ya

---

[11] Hêzên Parastina Civakê (HPC) yek ji cureyên xweparastinê ye ku beşek ji bawerîya leşkerî ya kurdî ji demên kevnar ve ye. di dema me ya niha de, komên piçûk ên xwebexşan ji hemû pêkhateyên bakur û rojhilatêûrîyê di nava gund û taxên bajar û bajarokan de ne. bi awayekî nenavendî çalakîyên bergirîyê û bi hevrêzîya li gel sazîyên Rêveberîya Xweser pêk tînin. Hêzên Parastina Civakê-Jin weke baskê wê yên jin tê dîtin.

[12] Ebdullah Ocalan. Manîfestoya Şaristanîya Demokrat – Berga Pêncem (Doza kurdî û Çareserîya Neteweya Demokrat). Werger: Zaxo Şiyar. Çapa duyem 2014. Bê weşan. R538.

[13] Cambridge; defense; Link: https://dictionary.cambridge.org/dictionary/english/defense

[14] Ferhenga El-Meanî El-Cami. Parastin. Lînk: https://www.almaany.com/ar/dict/ar-ar?/دفاع/

qebelî her demê rastî êrîşan hatiye; li gor wê dozên ewlekarî u bergirîyê ji bo her neteweyekê û li her dem û cihekî, ne weke hev in.

Der barê birêvebirina dozên ewlekarî û bergirîyê de, bi gelek navgînan pêk tê; mîna bikçekbûyîn, avakirina hevbendîyan, geşepêdana domdar, avakirina civaka zanînê, xurtkirina sincan, vejandina çandê, xweparastin, dijderketina ramanên ku kîn û tundrewîyê belav dikin, çaksazkirina alozîyên aborî, siyasî û bobelatên suriştî yên mîna guherîna bahewayê, têkçûyîna jîngehî û erdhejan… û hwd.

- **Rûbirûbûyinên Ewlekarî Yên Li Herêma Bakur Û Rojhilatê Sûrîyê Û Rêbaza Bersivdayînê Jê Re.**

Rûbirûbûyînên mayînê, ji bo hemû statuyan, ger rengê wê çi be jî, weke taybetîyeke jêneger e. Dibe ku ev rûbirûbûyîn ji hinek beşan re bûbe sedema hebûn û ji hinekan re jî bûbe alava tunekirinê. Dibe ku bi rêya zagonên suirştî yan jî bi rêya zagon û reftarên mirovan, têne birêvebirin. Her çendî hêza statuyekê mezin be jî, nikare rûbirûbûyînên ku rastî wê tê yan jî dê di siberojê de rastî wan were, tune bike. Dibe ku mirov ji vê yekê re, di tezên dîtaneya diyalektîkê de, ravekirinê bibîne.

Rûbirûbûyînên xwedî rehendên siyasî, aborî û jîngehî yên ku civak, pergalên ferwerîyê û rêveberî rastî wan tên û divê bi awayekî pragmatîk bersiva wan bidin, veguherîne dozên ewlekarî yên hemdem. Mînak; hêzên sosyalîst, ji bo metirsîya hevbeş a rêxistina DAIŞê de, xwe neçar dît ku bi hinek pergalên lîberal re bikevin nava têkilîyên bikêrhatî. Her wiha pergalên dewletî yên di warê îdolojî de hevrik in, xwe neçar dîtin ku bikevin nava projeyên bazirganî yên hevpar, da ku alozîyên xwe yên aborî derbas bikin. Tundîya parastina jîngehî jî veguheriye pêkareke nebikêrhatî ji bo dabînkirina gelek pêdivîyên çavkanîyên enerjîyê û dahatên diravî. Êdî bersivdayîna ji van dozên bergirîyî re (bi handera pêdivîyê) wiha bûye ku êdî zehmet e tê de rêgez û ramanên bêmînak bi rasteqînîya heyî re were hevsengkirin. An ku dozên ewlekarî û bergirîyê di dîroka me ya hemdem de veguherîne dozên hebûnê û her statuyek, çi dewlet, ferwerîyeke xwecihî yan rêxistin û heyanî malbat jî, di danûstandina bi van dozan re xwedî nêzîkbûneke taybet e.

Dozên ewlekarî û bergirîyê yên ku li herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê têne jiyîn, ji destpêka xwe ve û di bingeha xwe de doza hebûnê ye. Hinek rûbirûbûyînên ewlekarî hene weke: Siyaseta dijminane ya hinek rêjîmên herêmî, çalakîyên tundrew ên rêxistina DAIŞê, karên ku di nava çarçoveya sûcê birêxistinkirî de cih digirin û têkçûyîna jîngehî. Hemû jî çavaknîya piranîya pirsgirêkên civakî, aborî, tenduristî û siyasî yên li herêmê têne dîtin, di destpêka wan de jî koçberî û doza penaberan û buhabûn tên. Li beramberî wê jî ji alîyê sazîyên Rêveberîya Xweser ên cihêreng ve têkoşînek li dijî van rûbirûbûyînan heye da ku hebûna xwe biparêze. Di nîveka yekem a sala 2024an de qebareya van rûbirûbûyînan bi rêya pêkarên xweyîtî û babetî (objektîv û subjektîv) bilind bû, Rêveberîya Xweser jî bi rêya nêzîkbûneke taybet ji her yekê ji wan re, bersiv da wan. Ji bo nasîna vê rastîyê, piranîya rapor û daneyên ku ji Hêzên Sûrîya Demokrat, sazîyên Rêveberîya Xweser û Hêzên Ewlekarîya Hundirîn û hin raporên din derketine, hatin lêkolînkirin û dahurandin, her wiha bi tişta li ser erdê hatî dîtin re hat pîvandin, da ku nêrîneke giştî der barê dozên ewlekarî û bergirîyê yên li herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê di nîveka yekem a sala 2024an de, were sazkirin. Ew jî wiha ye:

**Yekem- Bandorîyên Siyaseta Dijminane Ya Rêjîmên Herêmî:**

Çar rêjîmên herêmî hene (tirkî, sûrî, îranî û rûsî) ku hewl didin Rêveberîya Xweser têk bibin û di destpêka wan de jî pergala tirkî ye ku bi awayekî eşkere dijminatîya xwe bi herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê re da xuyakirin û hewl da ku bi rêya pêkanîna rêze-operasyonên dagirkerîyê û êrîşan ji 2012an heyanî roja me ya îro, çi yekser an jî neyekser bi rêya komên çete yên girêdayî wê, tune bike. Em dikarin bibêjin ku siyaseta dijminane ya pergala tirkî jêdera piranîya pirsgirêkên ku li herêmê têne jiyîn e, ji wan jî pirsgirêkên siyasî, abroî, jîngehî û civakî.

Di dawîya berfanbara 2023yan de ev helwesta dijminane ya ku berîya wê wiha çênebûye, tundtir bû. Li gor wê jî hêzên tirkî rêze-êrîşên[15] hewayî yên

[15] Sûrîyên ji bo rastî û dadmendîyê. 158 rêxistinên sûrî armancgirtina tirkî ya ji bo kargehên sivîl li bakur û rojhilatê Sûrîyê şermezar dikin. Dîroka weşanê: 28.12.2023. lînk: https://stj-sy.org/ar/158/منظمة-سورية-تدين-الاستهداف-التركي-لل-
Ji bo ku qaseya ziyanên ku ji ber bombebaranê çêbûne binasin, li vê vegerin. Hiba Zeyadîn. Bombebarana tirkî wêranîyê li bakur û rojhilatê Sûrîyê bi xwe re tîne. Weşan: Human Rights

wêranker li ser kargehên petrolê, kargehên rajeguzarî û cihên sivîl ku di nava wan de kargeha zeytûnan, kargeha dirûtinê, kargeha êm, kargeha çementoyê, hola dawetan, kargeha çêkirina silinderên oksejînê ya ku tekane kargeh li Cizîrê ye, çapxane (Sîmav) û gelek cihên din ên sivîl, pêk anîn[16]. Her wiha gelek sivîlan jiyana xwe ji dest da û gelek jî birîndar bûn û rewşeke tirsê li deverê da çêkirin. Li kêleka wê jî bi milyonan kes bê av, elektrîk û sotemenî hiştin. Rapora hevbendîya rêxistinên civaka sivîl[17] amaje pê kir ku; "Di wê çaxa di navbera 13 û 16ê berfanbara 2024an de, 40 derbeyên tirkî li ser herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê hatin belgekirin.. Li gor wê, herî kêm 26 cihên jêrxaneya jiyangîr bi tundî ziyan dîtine yan jî nema dixebitin". Her wiha raporê tekez kir ku derbeyên hewayî ziyan gihand şeş êstgehên vejandina enerjîyê, her wiha êstgeha Siwêdîyê ya ku sûd digihand bêtirî milyonek kes, wêran kir. Li kelêka wê jî çar êstgehên şaxî yên veguhastina elektrîkê li Hesekê û gundewarê wê bi giştî, ji kar xistin. Her wiha bi dehan bîrên avê ku av digihand bêtirî 815076 kes ji xelkê bakur û rojhilatê Sûrîyê, bêtirî 38 nangeh û hejmarek sîloyên genim û aş wêran kirin. Êdî bêtirî milyonek kes li yazdeh bajar û bajarokên sereke bê elektrîkê hiştin. Pê re jî tevgera rêxistinên alîkarîyê yên li bakur û rojhilatê Sûrîyê sînordar kir. An ku operasyonên dijminane yên pergala tirkî ziyanên demdirêj li jêrxane û sektora rajeguzarîyê kirin.

Li ser asta jîngehê jî, pergala tirkî çavkanîyek ji bo pêlên qirêjîyê ya ku berîya niha weke wê çenebûye, bû. Bombebarana li ser kargehên petrolê yên li Rimêlanê ku di dawîya 2023yan de pêk hat, hişt ku madeyên petrolî bikevin nava çemê Ceqceq, çemê Xabûr û gola Bendava Bakurî ya li Hesekê. Vê yekê hişt ku Rêveberîya Xweser di dawîya çileya 2024an de komîteyên awarte bide avakirin, da ku bi rêya bendên seravî û derxistina madeyên petrolî bi destan, rê li pêşîya vê qirêjîyê bigire. Li gor rapora desteya jîngehê ya kantona Cizîrê[18], ev

---

Watch. Dîroka weşanê: 9.2.2024 lînk: https://www.hrw.org/ar/news/2024/02/09/turkiyes-strikes-wreak-havoc-northeast-syria

[16] Gerînendetîya ragihandinê ya Rêveberîya Xweser. Amara êrîşên dagirkerîya tirk li ser herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê. 26.12.2023. Weşan: Malpera Rêveberîya Xweser. Dîroka weşanê: 27.12.2023. Lînk: https://aanesgov.org/ar/?p=9537

[17] Syria INGO Regional Forum; Escalation of Hostilities in Northeast Syria, January 16th 2024; Posted: 17 Jan 2024; Link: https://reliefweb.int/report/syrian-arab-republic/escalation-hostilities-northeast-syria-january-16th-2024

[18] Malpera Rêveberîya Xweser. Encama Bombebarana Tirkî. Jîngeha Cizîrê sedemên herikîna petrolî di nava ava çemê Ceqceqê de zelal dike. Dîroka weşanê: 2.3.2024. Lînk: https://aanesgov.org/ar/?p=10604

herikîna petrolê hişt ku di ava sererd û binerd û xaka erdên çandinîyê ku li seranserî cihê qirêjbûyî ne, qirêjîyeke mezin çebibe, çi ku bi petrolê re gaz hene ku belavî nav hewayê dibin. Tê zanîn ku çemê Ceqceqê, ji ber ku desthilatên Tirkîyê avrêjîya xwe berdidin nava çemê Ceqceqê berî ku bikeve xaka Qamişlo, bi awayekî domdar qirêj e. Tişta ku dihêle bêtir qirêj bibe ew e, ku şaredarî karên paqijkirina wê dereng dixe. Dibe ku sedema wê jî kêmbûna dahatên wê yên diravî be.

Di destpêka meha adarê de, gelek nexweşîyên çerm li kantona Firatê derketin[19], hemû jî ji ber ku madeya Siyanîd a jehrî piştî ku kana zêr a ku li alîyê din ê çemê Firatê li Tirkiyê teqiya, herikî nava avê. Vê yekê hişt ku desteya jîngehê li kantonê berê niştecihan bide bikaranîna ava bîran heyanî ku bandora kîmyweî ji ser çem rabe.

Keysbazkirina avê di siyasetê de ji alîyê pergala tirkî ve, bû sedema ku piranîya kantonên herêmê di dabînkirina avê de û nemaze li bajarê Hesekê ku Rêveberîya Xweser ji tîrmeha 2023yan ve weke “Bajarê wêran” bi nav kiriye, zehmetîyan bikişînin. Desthilatên tirk û ji ber sedemên siyasî ava çemê Xabûrê ku weke rehê avê yê li kantona Cizîrê û yek ji robarên çemê Firatê ye, biriye. Vê yekê bi dest xwe re di dabînkirina avê ji bêtirî du milyon kes re, zehmetî çêkirine. Her wiha ava çandinîyê ji ser bêtirî 150 hezar hektar[20] erdên çandinîyê biriye. Ev yek bû sedema lawazîya hilberîna çandinî û ziyan dan sewalkarîyê û karê masîyan. Her wiha dagirkirina rêjîma tirkî ji êstgeha Elokê ya avê ya li gundewarê Serê Kanîyê re, hişt ku alozîyeke avê ji bêtirî milyonek kes re, yên li herêma di navbera bajarokê Zergan û bajarê Hesekê de, peyda bibe. Berpirsekî gerînendetîya avê ya Hesekê[21], pergalên tirkî, rûsî û sûrî tawanbar kir ku ew li dûv alozîya avê ya Hesekê û gundewarê wê ne û ev yek ji ber sedemên siyasî ye. Her wiha kêmkirina rêjeyên ava çemê Firatê ji alîyê rêjîma tirkî ve, bûye sedema gefeke rastîn ji jînewarên suriştî yên li seranserî çem heyanî alîyê Iraqê

---

[19] Malpera Rêveberîya Xweser. Heyanî ku bandora kîmyewî li ser çem nemîne.. jîngeha Firatê bang li niştecihan dike ku ava bîran heyanî du mehan bi kar bînin. Dîroka weşanê: 3.5.2024. Lînk: https://aanesgov.org/ar/?p=10665

[20] Malpera Rêveberîya Xweser. Mihemed El-Eswed.. Tirkî ava Xabûrê dibire da ku jêxaneya herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê lawaz bike. Dîroka Weşanê: 26.6.2024. Lînk: https://aanesgov.org/ar/?p=12926

[21] Robîn Umer. Rêveberîya Xweser bajarê Hesekê weke bajarekî wêran radighîne ji ber ku Tirkîyê ava wê birandiye. . Weşan: Morth Press. Dîroka weşanê: 3.7.2023. Lînk: https://npasyria.com/158014/

re. Berpirsekî di nava Rêveberîya Sivîl a bajarê Reqayê[22] de hişyarî da, ku eger birîna ava çemê Firatê ya ji alîyê dewleta tirk ve berdewam bike, di sala 2024an de, ji bilî %50 yan jî kêmtir ji terxanên avî yên ku ji projeyên çandinî yên sala 2023yan re hatine dabînkirin, dê neyê dabînkirin. Ev yek bi rastî jî bi rêya vegera werzê çandinîyê yê vê salê û zêdebûna alozîya avê di herêmê de, hat diyarkirin.

Bi destpêka werzê çinînê yê havîna 2024an re, amarên ne fermî[23] amaje pê kir ku agir bi 2443 hektar rûbera çandinîyê û 19 hezar darên zeytûn û fisteqên helebî ketiye ku hemû jî ji ber bombebarana tirkî û komên çete pêk hatine. Li kantona Minbicê tenê 300 şewat çêbûn.

Bombebaranên tirkî yên li ser kargehên hilberîn û rajeguzarîyê, bandor li budceya giştî ya sala diravî 2024 jî kir, ew jî li gor ku hevserokê desteya diravî ya giştî ya Rêveberîya Xweser, Dr. Ehmed Yûsif[24], tekez kirî. Li gor wê jî şkandinek bi qasî 389 milyon dolar[25] di budceyê de çêbû. Diyar e ku ev şkandin bandor li gelek sektoran jî kir, berztirîn ev sektor nirxê genim bû (0.31 dolarê amerîkî ji bo her kîloyekê) ku gelek cotyaran ew weke biryareke kirêt bi nav kir. Li gor wê, desteya çandinî û avdanîyê ya Rêveberîya Xweser daxuyanîyek weşand û tê de eşkere kir ku[26] “Ew nikare qezenceke mezin bide biraderên cotyar” her wiha diyar kir ku “Desteya çandinî û avdanîyê nirxekî ne li gor pîvanên lêçûn û qezencê daniye”. Her wiha bandorîyên şkandina diravî li ser rajeyên şaredarîyê jî çêbûn.

---

[22] Malpera Rêveberîya Xweser. Ji ber birandina Tirkîyê û çeteyên wê ji ava çemê Firatê re.. Çandinî û avdanî ya Reqayê hişyarîyê dide ku nema dikare di sala 2024an de nikare avê ji bo avdayîna çandinîyê dabîn dike. Dîroka weşanê: 11.12.2023. Lînk: https://aanesgov.org/ar/?p=9171

[23] ANHA. Bi hejmaran.. Ziyanên cotyarên hetrêma bakur û rojhilatê Sûrîyê yên ji ber bombebarana Tirkîyê û çeteyên wê. Dîroka weşanê: 13.6.2024. Lînk: https://hawarnews.com/arبالأرقام-خسائر-مزارعي-إقليم-شمال-وشرق-سوريا-جرّاء-القصف-التركي-ومرتزقته/

[24] Teysîr Mihemed. Şkandineke serhevdebûyî û tu planên çareserîyê tune ne. . ragihandineke dereng a fînansa 2024an a Rêveberîya Xweser. Weşan: North Press. Dîroka weşanê: 13.6.2024. Lînk: https://npasyria.com/187769/

[25] Ji bo bêtir bibînin: Meclisa geelan a demokratîk. Zagona fînansa giştî ya saka diravî ya 2024an. Jimar (7). Dîroka weşanê: 9.6.2024. Lînk: https://smne-syria.com/gc/archives/3098

[26] Malpera Rêveberîya Xweser. Di daxuyanîyeke çapemenîyê de.. çandin û avdanî sedema kêmbûna nirxê genim zelal dike. Dîroka weşanê: 28.5.2024. Lînk: https://aanesgov.org/ar/?p=12377

Der barê pergala sûrî de jî, hîn jî rijd e ku kontrolkirina xwe li ser tevaya bakur û rojhilatê Sûrîyê weke berîya 2010an vegerîne. Her wiha bi rêya vegera têkilîyên bi hin dewletên erebî re û hewldanên ji bo danîna têkilîyan bi Tirkîyê re, hewl dide ku raya giştî bixapîne ku ew di şerê xwe yê li dijî alîyên siyasî yên cihêreng ên sûrî de, bi ser ketiye. Lê li gor rastîyên li ser erdê heyî, berevajî vê yekê derdikeve pêş. Pergala sûrî di nîveka yekem a îsal de, hewl da ku asta çalakîyên xwe yên dijminane li dijî bakur û rojhilatê Sûrîyê xurt bike. Diyar e ku hewl daye ji pêngava xwe ya ragiahndinî ya li dijî herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê sûdê bigire, ku ji binkeftina çalakîyên wêranker ku di havîna sala borî de bi rê ve dibirin, dest pê dibe. An ku van çalakîyan xwe dispart xapandina raya giştî bi zanyarîyên şaş ku wiha dabeş dikir di navbera "Serbazgeha dewletê" ya bi serkêşîya pergalê, li alîyê din jî Rêveberîya Xweser bixe rewşa "Serbazgeha veqetîner". Hewl da careke din di meha tebaxê ya sala 2024an de li ser bingeha bawerîyên xwe yên ku -qaşo- şerê wî yê derûnî di avakirina hewayeke ewlekarî ya jihevketî li Dêra Zorê de bi ser ketiye, vê yekê dubare bike. Lewre berê xwe da wê yekê ku li jêr sîwana çeteyên bi navê "Artêşa Êlan" û "Difaa EL-Wetenî" êrîşî herêmên alîyê rojhilat ê Firatê bike û komin ji wan çem derbas kir û dest bi karên wêranî di hemû cihên sivîl ên deverê de, kir. Li kêleka wê jî pêngaveke ragihandinê ya ji alîyê ragihandina rûsî, îranî û tirkî, dihat meşandin. Bi vê yekê re hewl da ku hevrikîya êlî û netewperestîya tundrew li Hesekê û Qamişlo çêbike û êrîşan li ser cihên leşkerî û sivîl pêk bîn û çalakîyên komploger di nava goşeyên ewlekarîyê yên li her du bajaran de, geş bike. Lê belê ji ber rêvebirina binkeftî jê re, ev çalakî bi bin ketin. Dibe ku sedema vê yekê ew be ku di hesab û dahurandinên sazkerên çalakîya komploger de, şaştî û çewtî hebûn. Belkî jî planên xwe li ser şaştîyên ewlekarî û siyasî ava kiribûn. Bazara wan a ji bo peydakirina fitneyeke nijadî di navbera kurd û ereban de, vala derket. Êrîşên wan tu destek ji civaka erebî ya xwecihî ku helwesteke bêtir bi alîyê QSDê ve stand, bi dest nexist. Her wiha wêrankirina van êrîşan bo sektora rajeguzarîyê hişt ku hinek taybetmendîyên Rêveberîya Xweser derkevin û hişt ku ev nêrîn derkeve pêş ku "Rêveberîya Xweser ava dike û pergala sûrî jî wêran dike" nemaze gava dîmenek hat weşandin gava çeteyekî ji yên rêjîmê moşekekê diavêje kargeheke sivîl. Tişta ku bêtir vê yekê tekez dike, topbarandina wan a bêserûber e ku bû sedema pêkanîna komkujîyekê li gundên El-Dehla û Cedîdet El-Begara ku di encama wan de bêtirî 16 kesan û di nava wan de jin û zarok

hebûn, jiyana xwe ji dest bidin[27]. Vê yekê hişt Hêzên Ewlekarîya Hundirîn çargoşeyên ewlekarîyê û focên leşkerî yên li Qamişlo û Hesekê dorpêç bike û amadebaşîya derbasbûna wan bike ku hevdemî wê sê çalakîyên tolhildanê li dijî sê xalên hêzên rêjîmê yên li alîyê din ê çem, pêk anîn[28]. Hevtayî vê yekê zêdebûna hêrsa civakên xwecihî bi hemû pêkhateyên xwe ve ku vê yekê bi dest xwe re hişt hêzên rûsî bikevin navberê ku weke ragihandina binkeftina çalakîyê hat dîtin, bi tevî ku rêjîmê berevajî vê yekê bi rêya avêtina bombeyan her demekê li ser gundewarê kantona Dêra Zorê, da diyarkirin.

Der barê her du rêjîmên rûsî û îranî de, her du jî ne bi awayekî yekser ketine nava çalakîyên dijminane yên li dijî herêmê, lê belê bi rêya rêvebirina van çalakîyan û destekdayîna saloxgêrî, siyasî û lojistî ji hêzên rêjîmê re da ku çalakîyên xwe yên komploger pêk bîne, beşdar bûne. An ku êrîşa dawî ya rêjîmê li ser kantona Dêra Zorê, eger ne ji destekdayîna îranî û rûsî ba, ku her du jî ji alîyekî din ve siyaseta dijminane ya tirkî ya li dijî herêmê weke kaxezeke fişarê li ser rêjîma tirkî û Rêveberîya Xweser bi kar tînin, dê nikarîba pêk bîne.

Hîn jî her çar rêjîm hewl didin bigihiêjin lihevkirinekê di navbera hev de. Li gor wê, vekirina derîyê sînor ê Ebû EL-Zendîn, gotûbêja li ser vekirina rêyên navneteweyî yên M4 û M5 û hewldana pêkanîna hevdîtinekê di navbera Beşar El-Esed û Erdogan de bi serpereştîya rûsî, dikevin nava van hewldanan. Êdî têkbirina Rêveberîya Xweser armanceke hevbeş e gava em siyaseta rûsî ya derveyîn di ber çavan re derbas bikin. Her alîyek rêgeha xwe ya ku stratejîya wî ya li herêmê daniye, dişopîne. Ew jî bi rêya êrîşên yekser, şantajkirina bi rêya nakokîyên nijadî, reşkirina ragihandinî, fişara aborî û pêkanîna çalakîyên wêranker, pê tên. Di encamê de em dikarin bibêjin ku ev rêjîm di veguherîna bo pêkarên aramîya herêmê de bi bin ketin û siyasetên wan hişt ku civakên xwecihî li bermaberî wan bêtir bi hêrs bibin. Hevdemî wê jî li ser karîna Rêveberîya Xweser ji bo xwedîderketina li pirsgirêk û rûbirûbûyînên ewlekdarî, bandor kiriye.

[27] SDF PRESS. Amara komkujîyên hêzên rêjîmê li gundên Dehla û Cedîdet El-Begara. Dîroka weşanê: 9.8.2024. Lînk: https://sdf-press.com/?p=42808

[28] SDF PRESS. Hêzên meclisa Dêra Zorê ya Leşkerî tola şehîdên komkujîya El-Dehla û Cedîdet El-Begara hildide. Dîroka weşanê: 12.8.2024. Lînk: https://sdf-press.com/?p=42853

**- Nêzîkatîya Rêveberîya Xweser Ji Siyaseta Dijminane Ya Rêjîmên Herêmî Re:**

Ji destpêka avabûnê û ta niha, Rêveberîya Xweser di birêvebirina hevsengîya hêza li bakur û rojhilatê Sûrîyê de, li gor rêgeza "Bêalîtîya Siyasî"[29] û diplomasîya ji bo şerê li dijî DAIŞê û dûrketina ji şerê li ser textê desthilatdarîyê yê ku di navbera rikberî û rêjîmê de heye, baş dixuye. Li gor wê jî gelek destpêşxerî yên ji bo pêkanîna danûstandina bi hemû alî û hêzan re li pêş xistine, ya dawîyê jî daxuyanîya fermandarê giştî yê Hêzên Sûrîya Demokrat bû ku di 20ê tîrmeha borî de eşkere kir ku "Ew amade ne bi hemû alî û hêzan û di nava wan de Tirkî re jî danûstandinê bikin[30]". Lewre têkbirina Rêveberîya Xweser ji alîyê rêjîmeke herêmî ve hevdemî hebûna hevrikekî ku xwe pê digire, bûye mijareke ku bi baldarî nêzîkbûn jê re çêbibe. Ev yek di tunebûna bawerîyê û nebiyekbûna enîyan ku bi rêya wê êrîşan li ser herêmê pêk tînin, bi tevî ku armancên wan rastî hev jî tên, dibe pêkarek. Li gor wê, enîya bakurî ku ji alîyê rêjîma Tirkîyê ve tê birêvebirin heye, enîya rojavayî ya bi serkêşîya rêjîmê û hevalbendên wê heye û enîya hundirîn a ku DAIŞ wê bi rê ve dibe, heye.

Rêveberîya Xweser ji bo rûbirûbûyina li hember siyasetên dijminane yên rêjîmên herêmî, nêzîkbûneke li gor delîveyên xwe da meşandin. Em dikarin vê yekê bi rêya encamên civîna sêalî[31] ya ku pûşbera borî di navbera Meclisa Sûrîya Demokrat, Hêzên Sûrîya Demokrat û meclisa cîbicîkar a Rêveberîya Xweser de hatî lidarxistin, pênase bikin. Li gor wê jî lihevkirina li ser "Xebitîna ji bo

---

[29] Fermandarê giştî yê Hêzên Sûrîya Demokrat di gelek hevdîtinên xwe de diyar kiriye ku ew naxwazin bikevin nava şhevrikîya herêmî ya dewletan.. ji van hevdîtinan, binêre: Berai Sebrî. Geşta bakur û rojhilatê Sûrîyê: Hevpeyvîneke taybet bi fermandarê giştî yê Hêzên Sûrîya Demokrat Mezlûm Ebdî re. Weşan: Instîtûya Waşintonê ya siyaseta Rojhilata Jêrîn. Dîroka Weşanê: 3.4.2022. Lînk: https://www.washingtoninstitute.org/ar/policy-analysis/rhlt-shmal-shrq-swrya-hwar-khas-m-qayd-qwat-swrya-aldymqratyt-aljnral-mzlwm-bdy
https://www.washingtoninstitute.org/ar/policy-analysis/rhlt-shmal-shrq-swrya-hwar-khas-m-qayd-qwat-swrya-aldymqratyt-aljnral-mzlwm-bdy

[30] teysîr Mihemed. Mezlûm Ebdî: Em amade ne ku bi hemû hêzan re û di nava wan de Tirkî jî, danûstandinê bikin. Weşan: North Press. Dîroka Weşanê. 20.7.2024. Lînk: https://npasyria.com/189672/
El-Hedes. Hevpeyvîneke taybet bi fermandarê giştî yê Hêzên Sûrîya Demokrat Mezlûm Ebdî re. Weşan: Malpera El-Erebîyê El-Hedes. Dîroka weşanê: 28.12.2023. Lînk: https://youtu.be/2vd3hVA_aXU

[31] Malpera Rêveberîya Xweser. Di lêgerîna ji bo rêbazên çareserîya alozîya welêt de.. civîneke sêalî ku tê de Rêveberîya Xweser, MSD û QSDê beşdar bûne. Dîroka Weşanê. 10.5.2024. Lînk: https://aanesgov.org/ar/?p=11888

bihêzkirina kaxezên siyasî yên Rêveberîya Xweser, firehkirina têkilîyên erebî, herêmî û navneteweyî û nemaze der barê şerê li dijî DAIŞa terorîst û hevkarîya bi wan alîyan re di warê aborî, tendursitî, perwerdehî û gelek dosyayên girîng de" hat kirin. Lewre em dikarin vê nêzîkbûnê weke rêbazeke "Tanbûna Stratejîk[32]" a bi rêya meşandina siyaseteke ku di nava hevkarî û hevrikîyê de têkel e, bibînin. Bi awayekî gelemper em dikarin amajeyê bi berztirîn kaxezên siyasî bikin ên ku Rêveberîya Xweser di nêzîkatîya ji rûbirûbûyînên cihêreng re, xwe dispêrê. Ew jî wiha ne:

**1.** Hevkarîya Hêzên Sûrîya Demokrat û Hêzên Ewlekarîya Hundirîn bi hevpeyaman navneteweyî ya li dijî DAIŞê re. Li gor wê, piranîya berpirsên amerîkî di piranîya hevdîtinên xwe de berdewamîya destekdayîna ji Hêzên Sûrîya Demokrat re, diyar kirine. Di 3.9.2024 de Fermandarîya Navendî ya Amerîkî di posteke xwe ya li ser platforma X[33] de diyar kir ku.. "Fermandarîya Navendî ya Amerîkî bi destekdayîna Hêzên Sûrîya Demokrat a ji bo misogerkirina têkbirina DAIŞê û pêkanîna aramîya herêmî re, pabend e". Ev yek piştî ku Hêzên Sûrîya Demokrat destek da girtina hejmarek endamên DAIŞê yên ku ji girtîgeha Reqayê reviyabûn, pêk hat. Her wiha mezinên fermandarên hevpeymanîya navneteweyî di demên berê de daxuyandibû ku ew rojane bi Hêzên Sûrîya Demokrat re di nava têkilî û hevrêzîyê de ne[34] û di avakirina jêrxaneyê û şiyanên leşkerî yên gerek ên ji bo misogerkirina derneketina DAIŞê careke din, berdwam in.

**2.** Parastina aramîya kampa Holê ya ku di nava xwe de bêtirî deh hezar tundrew ji bêtirî şêst dewletên ku vegerandina wan red dikin, dihewîne. Di heman demê de ev dewlet ditirsin ku ji kampê birevin û vegerin li wan deveran karên dijminane pêk bînin. Ji ber ku aramîya kampa Holê bi aramîya bakur û rojhilatê Sûrîyê ve girêdayî ye; rêgirtina li ber têkçûna aramîya herêmê dê ne li gorî berjewendîya van dewletan be.

---

[32] Dr. Eymen Ibrahîm El-Sûqî. Tanbûna stratejîk li Rojhilata Navîn. Weşan: Koara siyasî ya navneteweyî. Hejmar 2015. Çile 2019. Berga 54. R30.

[33]@ CENTCOMArabic; 03.09.2024; Link: https://x.com/CENTCOMArabic/status/1830743843001582030?ref_src=twsrc%5Egoogle%7Ctwcamp%5Eserp%7Ctwgr%5Etweet

[34] Nivîsgeha ragihandinê ya herêmî li Dubey\wezareta derveyîn a amerîkî. Kurteyeke taybet der barê erka têkbirina DAIŞê de. Weşan: Balyozxaneya Amerîkayê ya li Sûrîyê. Dîroka weşanê: 28.2.2023. Lînk: https://sy.usembassy.gov/ar/إيجاز-خاص-حول-مهمة-هزيمة-داعش/

**3.** Rêveberîya zanistdar a bi rengê demokrasîyê ya herêmê; ku ev yek li gor ewlekarîya herêmî û navneteweyî guncav e. An ku nabe metirsîyek ji dewletên cîran ji herêmê re ku şer li ser ragihîne.

**4.** Parastina kenalên peywendîyê bi Şamê re, her wiha îmzekirina lihevkirinan bi hêzên rûsî re ji bo belavbûna artêşa rûsî li seranserî sînorên sûrî-tirkî ku di çarçoveya rawestandina şerê di navbera Hêzên Sûrîya Demokrat û artêşa rêjîma Tirkîyê ya piştî dagirkirina Serê Kanîyê û Girê Spî pêk hatî de. Ji alîyekî din ve jî Rûsya berdewamîya serkeftina Rêveberîya Xweser a li dijî rêxistina DAIŞê, li gor berjewendîyên xwe dibîne. Li gor pisporan[35] "Metirsîya Rûsyayê ya demdirêj di herêmê de heye; ew jî belavbûna terorê heyanî Rûsya û dewletên cîran e.. çi ku 3200 kesên rûsî hene ku ji destpêka 2014an ve derbasî Iraq û Sûrîyê bûne da ku li kêleka islamîstan şer bikin".

**5.** Beşek ji herêmên erdnîgarîya Sûrîyê, di peydakirina sotemenîyê de xwe dispêrin petrola bakur û rojhilatê Sûrîyê. Li herêmê ne kêmî %75 yedeka petrolê[36] ya Sûrîyê heye.

**6.** Tunebûna piralîtîyê di rêveberîya leşkerî, siyasî û karîgerî ya herêmê de, an ku ne mîna parçebûna peyrewîya di nava berpirsên rêjîma Sûrîyê de ku hinek ber bi Îran, hinek Rûsya û hinek jî dewletên erebî ve diçin, an jî hişmendîya çetetîyê ya ku komên çekdar pê herêmên li jêr dagirkerîya Tirkîyê de, bi rê ve dibin. Her wiha bêzarîya civakên xwecihî ji ber şerên îdolojî yên ku seranserî deh salên alozîya Sûrîyê tê de dijîn. Tişta ku dihêle xurttir bibe diplomasîya civakî ya ku heyanî asteke baş bi rê ve dibe ye.

**Duyem- Çalakîyên Tundrew ên Rêxistina DAIŞê**

Dirûvê operasyonên leşkerî û propagandayî yên heyî ku rêxistina DAIŞê li bakur û rojhilatê Sûrîyê, Deraa, çolistana Sûrîyê û nava Iraqê, her wiha hewldana wê ya ji bo mezinkirina operasyonên xwe yên vê dawîyê li Afganistan,

---

[35] James Sladen û hinên din. Stratejîya rûsî li Rojhilata Navîn. Weşan: Sazîya Rand \ 2017. R4. Lînk: https://www.rand.org/content/dam/rand/pubs/perspectives/PE200/PE236/RAND_PE236z1.arabic.pdf

[36] Samir Ebû Werda. Zevîyên petrolê li Sûrîyê.. yedekên heyî û hilberîneke jihevketî. Weşan: Maplera El-Taqqa. Dîroka weşanê: 20.1.2024. Lînk: https://attaqa.net/2024/01/20/حقول-النفط-في-سوريا-احتياطيات-واعدة-وإ/

Îran û Rûsyayê, her wiha zêdebûna çalakbûna wê li Afrîkayê[37], amajeyê pê dike ku di tektîkên wê de veguherînên binyadî çêbûne ku ew jî bi dest xwe re amaje bi guherînên di stratejîya wê de dike. An ku têgeha "Dewleta Islamî li Iraq û Şamê" nema têra hewldanên rêxistinê yên ji bo belavbûnê dikin, nemaze ku ji civakên xwecihî re bûye rêxistineke "Derbasdar". Çespana vê yekê jî ew e ku bi dehan endam û serekên wê ji alîyê hêzên bicihanîna zagonan li bakur û rojhilatê Sûrîyê û Iraqê û bi destekdayîna hevpeymanîya navneteweyî di nîveka yekem a sala 2024an de, rastî girtin an jî kuştinê hatine. Bi tevî ku di şayesandina operasyonên xwe de gelekî mezinbûnê jî dike. Li gor malpera Hêzên Ewlekarîya Hundirîn a bakur û rojhilatê Sûrîyê, kesên ku di nîveka yekem a 2024an de hatine girtin û navên wan eşkere bûye 77 endam in. Berztirîn ev kes: Emîrê rajeguzarîyên diravî yê rêxistina DAIŞê li Dêra Zorê[38] yê bi navê Xalid Hesen El-Selûm û nasnav "Ebû Fatime El-Şiêtî" li bajarokê Xeranîc ê gundewarê Dêra Zorê hatî girtin. Di heman demê de Hêzên Sûrîya Demokrat ragihand ku 233 endamên rêxistinê di nîveka yekem a sala 2024an[39] de hatine girtin. Derbeya herî mezin ku li rêxistina DAIŞê ket ew bû gava şeş fermandarên pileya yekem di çalakîyeke hevpeymanê de li çolistana Enbarê hatin girtin ku navê wê çalakîyê kiribû "Qevza Şêr"[40].

Gava çalakîyên rêxstina DAIŞê li herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê têne çavdêrîkirin, tê dîtin ku, hewl dide hebûna xwe li herêmê biparêze. Vê yekê bi rêya çalakîyên xwe yên ku armancên hinekî hêsan ji sivîl û leşkeran dide pêşîya xwe, ku hemûyan bi rêya çalakîyên takekesî yên xwe dispêrin tektîka "Lêxe û

[37] "Rêxistina DAIŞê ya terorîst ragihand ku wê di nîveka yekem a sala 2024an de 788 êrîs li ser asta cîhanê pêk anîne. Ji wan 536 li Afrîkayê ne ku tê de 2142 afrîkî jiyana xwe ji dest daye.." Ji bo bêtir binasin: Menber El-Difaa El-Afrîkî. Piranîya êrîşên DAIŞê bajarokên Afrîkayê dikin armanc. Weşan: Africa Defense Forum. Dîroka weşanê: 16.7.2024. Lînk: https://adf-magazine.com/ar/2024/07/غالبية-هجمات-داعش-تستهدف-البلدان-الإف/

[38] Malpera fermî ya Hêzên Ewlekarîya Hundirîn – Bakur û rojhilatê Sûrîyê. Di çalakîyeke bandorker a dezgeha ewlekarîya giştî de emirekî berz ê DAIŞê li Dêra Zorê hat girtin. Dîroka weşanê: 14.7.2024. Lînk: https://asayish.com/?p=12566

[39] SDF-PRESS. Amara operasyyonên ewlekarî yên li dijî DAIŞê di nîveka yekem a sala 2024an de. Dîroka weşanê: 4.7.2024. Lînk: https://sdf-press.com/?p=42544

[40] El-Hurra: "Qevza Şêr" fermandarin DAIŞê yên berz têk dibe.. Hûrgilîyên operasyona Enbarê. Dîroka weşanê: 13.9.2024. Lînk: https://www.alhurra.com/iraq/2024/09/13/وثبة-الأسود-تطيح-قيادات-داعشية-بارزة-تفاصيل-عملية-الأنبار

bireve" pêk tîne. Bi vê yekê sivîlên ku baceyan[41] nadin dike armanc an jî guleyan li rêbend û erebeyên leşkerî li herêmên dûr an jî kesên bicihanîna zagonê bi awayekî veşartî û di nava bazaran de, dike armanca xwe.

Rêxistinina DAIŞê beşek ji şiyana xwe ya ji bo berdewamkirina çalakîyên xwe yên li bakur û rojhilatê Sûrîyê, ji gelek çavkanîyan digire. Ji wan jî ev in:

**1.** Hêsanbûna çalakîyên wê yên di deverên ên bakurê Sûrîyê de yên ji alîyê hêzên tirk ve dagirkirî[42]. Her wiha xwespartina "Rêgeza oldarîyê (teqîtî)" piştî ku lihevhatin bi rêjîma Sûrîyê re pêk anîn. Komîteya Neteweyên Yekbûyî ya lêpirsîna der barê Sûrîyê de[43], li gor encamên lêpirsîna komkujîya ku 7ê nîsanê li Deraayê pêk hatî, tekez kir ku "Deh kesên sivîl û di nava wan de du zarok, ji alîyê milîsên alîgirên ferwerîyê ku piranîya wan jirêderketîyên berê yên ku (Lihevhatin pêk anîne) ne, bi awayekî hovane ew kuştin û pê re jî durişmeyên rêxistina dewletê (DAIŞ) bilind dikirin. Piranîya qurbanîyan jî hem bi kêran û hem jî bi guleyên ji nêz ve hatine kuştin ku hemû li jêr sûcên şer têne rêzkirin, weke kuştin û destdirêjîya li ser rûmeta kesayetî.."

**2.** Nekarîna rêjîma sûrî û hevalbendên wê ku rêxistina DAIŞê li çolistanê têk bibin. Her wiha siyaseta dijminane ya rêjîmê li beramberî herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê. An ku gava DAIŞ aramîyê li herêmê tev li hev bike, li gor dilê wê ye.

**3.** Berdewamîya pirsgirêka kampa Holê ku metirsîdartirîn kamp di cîhanê de ye. Li gorî hin berpirsên di nava Rêveberîya Xweser de, kampa Holê hîn jî armanca sereke ya rêxistina DAIŞê û madeyeke propaganayê ya ku di hemû dam û dezgehên xwe de bi kar tîne ye. Her wiha jinên di nava rêxistina navborî

---

[41] Yek ji van şaneyan li bajarê Reqayê di nîvê tebaxa 2024an de hat gritin. Lê binêre: SDF-PRESS. Hêzên me şaneyeke DAIŞê li Reqayê ku sêtîrên sotemenîyê dikirin armanc, têk bir. Dîroka weşanê: 17.8.2024. Lînk: https://sdf-press.com/?p=42864

[42] Dr. Şadî Ebdilwehab Mensûr. Şerên nifşê pêncem: Rêbazên teqeînê ji hundir heyanî ber bi qada navneteweyî ve. Çapa yekem 2019. Weşan: Weşanxaneya El-Erebî – Qahire. R63. Navenda belgekirina binpêkirinan. Dosyayeke taybet: Agahî û navên fermandar û şervanên DAIŞê yên ku aniha di nava komên çekdar ên gorêdayî Tirkîyê de, şer dikin. Dîroka weşanê: 19.8.2024. Lînk: https://vdc-nsy.com/archives/27336

[43] Neteweyên Yekbûyî. Komîteya Neteweyên Yekbûyî hişyarîyê dide ku tundîya şerê sûrî, hevdemî alozîya mirovî, berdewambûna cureyên şer û metirsîya ji şerê herêmî yê berfireh, gurtir bibe. Dîroka weşanê: 10.9.2024. Lînk: https://www.ohchr.org/ar/press-releases/2024/09/un-commission-warns-syrian-war-intensifying-amid-continuing-patterns-war

de zarokan li ser ramanê tundrewîyê perwerde dikin da ku çalakîyên kuştin û êşkencekirinê pêk bînin. Di nîveka yekem a îsal de, rêxistina DAIŞê bi hevrêzîya li gel rêxistina DAIŞê li derveyî kampê re, plan dikir ku gelek çalakîyên metirsîdar di nava kampa Holê de pêk bîne. Vê yekê hişt ku Hêzên Sûrîya Demokrat û Hêzên Ewlekarîya Hundirîn operasyonan di nava kampa Holê de bidin destpêkirin. Li gor wê, di meha sibatê de hêzên ewlekarî û leşkerî qonaxa sêyem a “Operasyona ewlekarî û mirovî” ya di nava kampa Holê[44] de bi dawî kir. Di encama wê de, emîrê ku berpirsê şaneyên di nava kampê de ye, bi nasnav “Ebû Sufyan El-Lehîbî” hat kuştin û kesê ku jê re dibêjin şerhîyê yekem (rewaker) û di ber belavkirina ramanên tundrew, derxistina fitweyên kuştinê û gefxwarina li niştecihên kampê de berpirsiyar e, yê bi nasnav “Ebî Ebdilhemîd” û li kêleka wî jî 85 endamên şaneyên rêxistina DAIŞê hatin girtin û gelek çek hatin desteserkirin. Di meha nîsanê de jî Hêzên Ewlekarîya Hundirîn operasyoneke ewlekarî di nava kampê de dane destpêkirin û di encamê de 25 kes ji metirsîdartirîn şaneyên di nava kampê de, girtin. Van kesan dewrîyeyên ewlekarîyê dişopandin û çavdêrîya wan dikir, her wiha di nava kampê de jin û mêrên ku îdolojîya DAIŞê red dikirin, êşkence dikirin û ramanên tundrew di nav niştecihên kampê de belav dikirin. Li gor daxuyanîya Hêzên Ewlekarîya Hundirîn[45], van şaneyan xwe amade dikir ku çalakîyên hevbeş di nava xwe de li dijî xalên leşkerî û ewlekarî, pêk bînin. Di destpêka meha tebaxê de jî şaneyek ji 7 kesan hat girtin ku plan dikir karên terorane di nava kampê de pêk bînin. Ev yek tê wateya ku DAIŞ endamên xwe yên di nava kampê de, ji bo destpêkeke nû amade dike.

**4.** Reşkirina ragihandiî û operasyonên dijmiane yên rêjîmên herêmî di mafê herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê de. Li gor wê jî rêxistina DAIŞê wiha dike ku di navbera bangeşeya xwe û vê reşkirina ragihandinî de lihevhatinekê çêbike. Vê yekê bi rêya keysbazkirina azarên niştecihên deverê, bi cih tîne. Ev azarên navborî jî ji ber van sedeman hene: Bandorîyên lêdanên hewayî yên tirkî li ser sektora rajeguzarîyê, sizayên navneteweyî yên li ser rêjîma sûrî, bandorîyên alozîya ku ev deh salên wê lidar e û zuwabûna ku li deverê peyda bûye, her wiha

[44] SDF-PRESS. Encamnameya qonaxa sêyem a operasyona “Ewlekarî û mirovî” ya li kampa Holê. Dîroka weşanê: 6.2.2024. Lînk: https://sdf-press.com/?p=41602

[45] Malpera fermî ya Hêzên Ewlekarîya Hundirîn li bakur û rojhilatê Sûrîyê. Endamin şaneyên DAIŞê li kampa Holê hatin girtin û hin operasyonên ku dê pêk bihatana, hatin têkbirin. Dîroka weşanê: 24.4.2024. lînk: https://asayish.com/?p=11662

bêxemîya karmendîtîyê ya li hin sazîyan heyî. Êdî propagandayê ji van re dike mîna ku bêmafîyên li ser civakên xwecihî ne û berpirsiyartîya vê yekê diavêje li ser Rêveberîya Xweser. Bi dest xwe re, ev yek jîngeheke ewlekarî ya lawaz çêdike ku bi rêya wê xebatên serbazkirinê, pêkanîna karên xirab û armancgirtina leşker û sivîlan, hêsan dike. Tişta ku li deverên gudewarê Hesekê, Dêra Zorê û Reqayê yên ku tê de çalak in, hatiye dîtin, ev bi xwe ye.

Her wiha rêxistina DAIŞê ji operasyonên dijminane yên rêjîmên herêmî yên ku vê rastîyê baş dizanin, sûd girtiye. Mînak; armancgirtina rêjîma tirkî ya bi qestî ku li derdora girtîgeha Sinaayê û girtîgehên din ku bi sedan endam û fermandarên DAIŞê yên metirîsdar dihewînin xist, her wiha pêngava bombebaranê ya di destpêka îsal de. Vê yekê hişt ku nivîsgeha karûbarên dadî û jinûveçêkirinê ya herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê[46] ya bi ser Rêveberîya Xweser ve, bangê li civaka navneteweyî û hevpeymanîya navneteweyî bike ku destwerdanê tê de bikin. Her wiha xalên kontrolkirinê yên Hêzên Ewlekarîya Hundirîn bombebaran kirin ku vê yekê hişt derbasbûna endamên rêxistina DAIŞê hêsan bibe.

**5.** Keysbazkirina mijara girtina bi sedan endam û fermandarên rêxistina DAIŞê li bakur û rojhilatê Sûrîyê ku weke şiyaneke giyanî ya ji bo germkirina endamên mayî li ser berdewamkirina karên cengewarî, bangeşeyî, wêrankarî û serbazkirinî, tê dîtin. Di vê babetê de fermandarên fermandarîya navendî ya Amerîkayê, Maykil Êrik Korêlla diyar kir ku “hîn jî bêtirî 9000 girtîyên rêxistina DAIŞê li bêtirî 20 girtîgehên girêdayî Hêzên Sûrîya Dmokrat hene. Ev bi serê xwe artêşeke girtî ye. Eger hejmareke mezin ji şervanên DAIŞê birevin, dê metirsîyeke mezin li ser deverê û derveyî wê çêbike…”[47]

---

[46] SDF-PRESS. Amara operasyonên ewlekarî yên li dijî DAIŞê di nîveka yekem a sala 2024an de. Dîroka weşanê: 4.7.2024. Lînk: https://sdf-press.com/?p=42544
Malpera Rêveberîya Xweser. Nivîsgeha karûbarên dadî û jinûveçekirinê.. ji bo raya giştî. Dîroka weşanê: 18.1.2024. Lînk: https://aanesgov.org/ar/?p=10048

[47]@ CENTCOMArabic; 03.09.2024; Link: https://x.com/CENTCOMArabic/status/1830743843001582030?ref_src=twsrc%5Egoogle%7Ctwcamp%5Eserp%7Ctwgr%5Etweet

- **Nêzîkatîya Rêveberîya Xweser ji Çalakîyên Tundrew ên DAIŞê re:**

Hîn jî Rêveberîya Xweser ji bo xurtkirina ewlekarî û aramîyê li herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê xwe dispêre diplomasîya civakî ya ku bingeha avabûna Hêzên Sûrîya Demokrat e ku di nava pêkhateyên leşkerî de sala 2015an av bûye. Ev yek li ser rêgeza "Ewlekarîya civakî" ji bo rûbirûbûyîna hemû gefên hevbeş û êrîşên rêxistina DAIŞê li kêleka hevpeymanîya navneteweyî, pek hatiye. Rêveberîya Xweser ev diplomasî bi rêya jinûvesazkirina "Peymana Civakî" ya ku rastî helwesteke dijminane ji alîyê rêjîmên herêmî û DAIŞê ve hat, li pêş xist. Lewre têkoşîna li dijî karên tundrew ên rêxistina DAIŞê xwe dispêre beşdarbûna çalak a civakê di vê proseyê de. Tişta ku amajeyê bi vê rastîyê dike, pirbûna endamên rêxistina DAIŞê yên ku di nîveka yekem a sala 2024an de hatine girtin, her wiha pirbûna armancgirtinên DAIŞê ji alîyên sivîl re ye. Diyar e ku beşdarbûna civakê di proseya xurtkirina ewlekarî û aramîyê de veguheriye siyaseteke bergirîyê ya çalak. Vê siyasetê, di birêvebirina dosyaya ewlekarîyê de nermahîyeke baş daye sazîyên bicihanîna zanonan û delîveyek daye civakên xwecihî ji bo pêkanîna parastina cewherî. Ji ezmûnên hevkarîya di navbera civak û sazîyên bicihanîna zagonê de ev in: Dîdara "Yekîtîya Niştimanî ya Êl û Pêkhateyên Sûrî ya Duyem" ku ji alîyê Rêveberîya Xweser a bakur û rojhilatê Sûrîyê û Meclisa Sûrîya Demokrat ve li bajarê Hesekê, di gulana borî de hatî lidarixistin. Di vê dîdarê de nêzî 5 hezar kesayetên civakî, olî (islamî, xiristiyanî û êzdî), şêx û rûspîyên êlên bakur û rojhilatê Sûrîyê û hin berpirsên Rêveberîya Xweserîya Demokrat beşdar bûn. Rêveberîya Xwser ev yek weke berdewamîya "Kongreya Xutrkirina Ewlekarî û Aramîyê" ku di nîva cotmeha 2023yan de hatî lidarxistin, destnîşan kir. Encamnameya vê kongreyê[48] bû weke belgenameya kar a di navbera civakê û Rêveberîya Xweser de. Piranîya biryarên wê lêborîn, biryarên karîgerî yên kantonan, çareserkirina tişta bi navê bêmafî ku ji alîyê ragihandina dijber ve tê behskirin û pêkanîna daxwazên ku piştre hatin, di nava xwe de hewandin. Ji nava bendên wê encamnameyê yên ku hatin bicihanîn; xwedîderketina li daxwazên niştecihan ên ji bi lêborîna bi xizmên wan di nava

[48] malpera Rêveberîya Xweser. Bi serpereştîya Rêveberîya Xweser û MSDê.. Dîdara duyem a yekîtîya niştimanî hat lidarxistin. Dîroka weşanê: 25.5.2024. Lînk: https://aanesgov.org/ar/?p=12303

kampa Holê de û rêdayîna ji wan re ku vegerin herêmên xwe.[49] Li gor wê jî desteya karûbarên civakî û kedkaran a Rêveberîya Xweser “Navenda Guhdana Civakî” li Reqa û Tebqayê ku yekemîn navend li ser asta Rojhilata Navîn e[50], vekirin. Ev navend hat vekirin da ku rewşa malbatên ku ji kampa Holê vegeryane bişopîne û wan careke din çalak bike û têkelî nava civakê bike, her wiha pêngavên hîndarîyê li kampan bi destekdayîna desteyên têkildar re, pêk bîne. Her wiha derketina bi dehan malbatên Dêra Zorê ji kampa Holê di nîveka yekem a îsal de, bi derhûdîya şêxên êlan[51] dabîn kir. Di meha gulanê de 69 malbat û meha tîrmehê jî 88 malbat vegeriyan. Meclisa cîbicîkar a kantona Dêra Zorê derhûdîya wan avête li ser xwe da ku wan bi cih bike, vegerîne malên wan, karûbarên wan bişopîne, belgenameyên kesayetî ji wan re derxe û destekdayîna gerek bide wan, da ku careke têkelî nava civakê bibin.

Ji alîyekî din ve jî, Rêveberîya Xweser di meha nîsanê de ragihand ku şandeyeke tacîkî[52] 50 kes ji niştecihên xwe yên li kampa Holê wergirtin, her wiha şandeyeke brîtanî jî 50 kes ji niştecihên xwe li gor belgenameyeke fermî wergirtin. Li kêleka wan jî bi dehan malbatên iraqî û qîrgîzî jî. Proseyên derxistina malbatan ji kampa Holê gaveke girîng bû ji bo dûrxstina wan ji ramanên tundrew û metirsîyên ku ji alîyê rêxstina DAIŞê ve li ser wan hebûn û têkelkirina wan di nava civakê de. Ev yek tê wateya valaderxistina yek ji dahatên ku rêxistina DAIŞê xwe dispêrê.

Di destpêka îsal de hin bijareyên civakî yên kantona Reqayê, rê da Hêzên Ewlekarîya Hundirîn ku destwerdanê di pevçûnên êlî de bike û navbeynkarîya wan bike. Berztirîn bûyerên ewlekarî yên metirsîdar ku kete jêr kontrolê, pêngava berfireh a li bajarokê El-Hemrat di 29ê çileyê de bû. Ev yek di encama

---

[49] Malpera Rêveberîya Xweser. Meclisa Cîbicîkar a Dêra Zorê dest bi pêkanîna rêkarên gerek ji bo dabînkirin û têkelkirina malbatên ku ji kampa Holê vegeriyane. Dîroka weşanê: 29.7.2024. lînk: https://aanesgov.org/ar/?p=14327

[50] Desteya karûbarên civakî û kar. Xebatên karûbarên civakî di nîveka yekem a sala 2024an de. Weşan: Malpera Rêveberîya Xweser. Dîroka weşanê: 10.8.2024. Lînk: https://aanesgov.org/ar/?p=14503

[51] Meclisa cîbicîkar a kantona Dêra zorê. Ji bo têkelkirinê û pêşkêşkirina destekdayîna gerek, meclisa cîbicîkar a Dêra Zorê dîdarekê ji bo malbatên ku ji kampa Holê vegeriyane pêk tîne. Weşan: Malpera Rêveberîya Xweser. Dîroka weşanê: 1.5.2024. lînk: https://aanesgov.org/ar/?p=11714

[52] Mihemed El-Qadî. Rêveberîya Xweser 50 kesên ni malbatên DAIŞê radestî komara Tacîkistanê dike. Weşan: North Press. Dîroka weşanê: 25.4.2024. Lînk: https://npasyria.com/184871/

nakokî û pevçûna di navbera êla El-Medlec û êla El-Cemasa de û li gor xwesteka rûspî û şêxên êlan û niştecihên deverê pêk hat. Li gor wê jî nêzî 82 kesên ku destê wan di pevçûnê de hebû hatin girtin û dest danîn ser qaseyeke mezin a çekan[53], di nava wan de jî vedînerên mayînan û balafirên dron bûn. Di destpêka meha tebaxê de Hêzên Ewlekarîya Hundirîn û meclisa rûspîyan a Reqayê civîneke hevrêzî li dar xist û tê de hat lihevkirin ku[54] "Destwerdana Hêzên Ewlekarîya Hundirîn ji bo navbeynkarîya pevçûnên êlî, vekirina rêyên ku ji ber sedemên ewlekarî ji alîyê Hêzên Ewlekarîya Hundirîn ve hatine girtin, xwedîderketina li daxwazên niştecihan ên ji bo çareserkirina madeyên hişbir û lidarxistina civînên mînayî wê. Ew jî li gor xwesteka miştecih û rûspîyên kantona reqayê û karûbarên sivîl, pêk hat".

Di nîveka yekem a sala 2024an de Rêveberîya Xweser du biryarên lêborînê derxistin. A yekem di 6ê nîsanê de bû ku ji bo hin sûcên pêkhatî[55] bû û ya duyem jî li gor xwedîderketina li encamnameya dîdara êlan hat derxistin. Li gor wê jî meclisa gelan a demokrat a Rêveberîya Xweser biryara lêborînê ya jimar (10) di nîva meha tîrmehê de derxist da ku girtîyên ku destê wan neketiye xwîna bêgunehan, serbest berdin. Armanca vê jî li gor meclisa gelan a demokrat[56] "xurtkirina aştîya sivîl û dayîna derfetekê ji wan re ye ku têkelî nava civaka sûrîyan bibin, ku ev dilê wan hatibû xweşkirin û destê wan nebûye bi xwîna sûrîyan, her wiha ji bo pêkvejiyana hevbeş di navbera pêkhateyên bakur û rojhilatê Sûrîyê de".

Li gor vê yekê, beşdarkirina civakên xwecihî di rûbirûbûyîna çalakîyên DAIŞê de beşek ji dozên ewlekarî û bergirîyê yên herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê ye. An ku bêyî cudabûna ku ev yek ji rêgezên demokrasîyê derketiye yan jî ji neçarî

---

[53] Malpera Rêveberîya Xweser. Ji b diyarkirina encamên pêngava navbeynkarîya pevçûnên li rojhilatê Reqayê, fermandarîya giştî daxuyanîyekê diweşîne. Dîroka weşanê: 30.1.2024. Lînk: https://aanesgov.org/ar/?p=10412

[54] Malpera Rêveberîya Xweser. Ji bo gotûbêjkirina niştecihan, Meclisa Cîbicîkar a reqayê civîneke hevrêzî li dar dixe. Dîroka weşanê: 12.8.2024. Lînk: https://aanesgov.org/ar/?p=14604

[55] Malpera Rêveberîya Xweser. Yasir Silêman. Zagona lêborînê xwedîderketina li bangên niştecihên bakur û rojhilatê Sûrîyê ye. Dîroka weşanê: 6.4.2024. Lînk: https://aanesgov.org/ar/?p=11313

[56] Malpera Rêveberîya Xweser. Ji bo xwedîderketina li encamên dîdara duyem a êl û pêkhateyên sûrî, meclisa gelan a demokrat zagona lêborîna giştî derdixe. Dîroka weşanê: 17.7.2024. Lînk: https://aanesgov.org/ar/?p=13839

ye vê yekê di bawerîya xwe ya ewlekarî de bigire dest, da ku hebûna xwe biparêze. Bi her halî ev yek tiştekî erênî ye û sûdê dide her du alîyan.

### Sêyem- Karên Di Çarçoveya Sûcên Birêxistinkirî de

Li herêma Rojhilata Navîn xebateke mezin a torên bazirganîya madeyên hişbir heye. Li gor raporên amerîkî, deverên sûrî yên li jêr kontrola rêjîma Sûrîyê veguherîne yek ji navedên cîhanî yên vê bazirganîyê. Her wiha raporê, Şam weke "Paytexta Kaptagonê[57]" bi nav kiriye. Di nava qerebalixa vê xebatê de, bazirgan ji ber sûdmendîya madî, herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê ji paşguh nakin ku vê bobelatê lê belav bikin. Her wiha rêxistina DAIŞê, piştî ku gelek dahatên xwe yên diravî ji dest dan, ev xebat kiriye yek ji çavkanîyên perekirina xwe. Her wiha em dikarin wê weke beşek ji proseyên dijminane yên dezgehên saloxgêrî yên herêmî li ser herêmê bibînin, ew jî li gor du nîşaneyan: Ya yekem, piranîya raporan, rêjîma sûrî tawanbar dikin ku destê wê di vê bazirganîyê de heye û wê belav dike. Ya duyem jî, bombebarankirina balafirên cengê yên tirkan li ser akademîya dij-madeyên hişbir" a li gundê Hemze Begê yê gundewarê Dêrikê, di 8ê cotmeha 2023yan de ku di encamê de 29 şagirtên akademiyê şehîd bûn. Li gor wê jî Hêzên Ewlekarîya Hundirîn pêngaveke tolhildanê li ser torên firotin û belavkirina madeyên hişbir da destpêkirin û ta niha jî berdewam e. Di hezîrana îsal de fermandarîya giştî ya Hêzên Ewlekarîya Hundirîn di daxuyanîyekê de eşkere kir ku destê hêzên dijber di derbaskirina madeyên hişbir bi qaseyên mezin bo herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê de heye. Her wiha ragihand[58] ku li ser 2387 dosyayan xebat hatiye meşandin, 3485 bazirgan, belavker û bikarhênerên madeyên hişbir hatine girtin û qaseyeke mezin a madeyên hişbir hatiye desteserkirin. Têkildarî vê yekê dezgehên ragihandinê

---

[57] Ehmed Munhim û Mehmûd El-Waqi. Sûrî.. Paytexta Kaptagnê. Weşan: Malpera El-Hurra. Bê dîroka weşanê. Lînk: https://www.alhurra.com/shorthand-story/161سوريا-عاصمة-الكبتاغون/
hişam El-Xenam. Şkandina Destê Kaptagonê.. Sûrî çawa vê madeya hişbir ji bo fişara siyasî bi kar tîne?. Weşan: Navenda Malkum Kêr – Karnîgî ya Rojhilaya Navîn. Dîroka weşanê: 7.8.2024. Lînk: https://carnegieendowment.org/research/2024/07/border-traffic-how-syria-uses-captagon-to-gain-leverage-over-saudi-arabia?lang=ar&center=middle-east

[58] Navenda ragihandinê ya Hêzên Ewlekarîya Hundirîn. Daxuyanîya taybet a xebatên roja cîhanî dijî madeyên hişbir. Weşan: Malpera fermî ya Hêzên Ewlekarîya Hundirîn – Bakur û rojhilatê Sûrîyê. Dîroka weşanê: 26.6.2024. Lînk: https://asayish.com/?p=12342

yên xwecihî[59] mukurhatinên torên saloxgêrîya tirk ragihandin, ku tê de eşkere dikin ku yek ji erkên wan belavkirina madeyên hişbir di nava xelkê bakur û rojhilatê Sûrîyê de bû.

Ji alîyekî din ve jî proseyên qaçaxkirina koçberan li seranserî sînorê bi dewleta tirk re berdewam e. Li gor wê jî Serê Kanîyê, Girê Spî û gundewarê Efrînê yên li jêr dagirkerîya Tirkîyê, deverên herî ku tê de derbasbûn û koçberî çêdibin, an ku komên çete dest danîne li ser dergehên qaçaxtîyê[60]. Li wan deveran ji deverên herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê yên sînorî bêtir qaçaxtî lê çêdibe. Gelek kes li wan deveran rastî êşkence û birîndarîyê jî tên û gelekan jî li ser destê cendermeyên Tirkiyê jiyana xwe ji dest daye[61].

Der barê karên dizîya çekdarî de, hin karên wiha li gundewarê Hesekê yê başûr hatin dîtin. Hêzên Ewlekarîya Hundirîn di pûşbera borî de komek girt ku karên şêlandin û dizîya çekdarî dikir[62], her wiha qaseyek çek li devera di navbera Hesekê û Holê de desteser kir. Li gor hevrûkirina bi deverên din ên Sûrîyê re, tu têjeyeke revandinê nehatiye tomarkirin. Piranîya sûcên di vê derbarê de pêk hatine jî li gor mebestên takeksî bûn. Ji alîyekî din ve jî şopandina gefên ku welatî li Dêra Zorê ji alîyê şaneyên DAIŞê ve dibînin, nemze veberhênerên petrolê yên ji bo standina bertîlan, zehmet tê dîtin. Lê belê di meha îlonê de Hêzên Ewlekarîya Hundirîn yek ji van şaneyan girt[63].

Der barê dosyayên gendelîyê de, Ehmed Şêxo (Hevserokê dezgeha çavdêrîya giştî ya Rêveberîya Xweser) daxuyand ku[64] “Dezgehê di nîveka yekem a sala

[59] Ji bo dîtinê: Alan Meîş آلان معيش; DESTÊN TARÎ - XELEKA 3 FÎNAL; 24.09.2024; Link: https://www.youtube.com/watch?v=UY-6JaqxYsQ

[60] Riwangeha Sûrî ya Mafên Mirovan. Bi tawana hewldana derbasbûna xaka Tirkiyê, komeke girêdayî Tirkîyê 5 sivîlan di nava devera bi navê “Kanîya Aştîyê” digire. Dîroka weşanê: 16.5.2024. Lînk: https://www.syriahr.com/714161/بتهمة-محاولة-دخول-الأراضي-التركية-فصي/

[61] Navenda belgekirina binpêkirinan. Cendermeyên tirkî di kuştin û êşkencekirina penaberên ku li wargeheke ewle digerin de berdesam in. Dîroka weşanê: 4.8.2024. Lînk: https://vdc-nsy.com/archives/68266

[62] Malpera fermî ya Hêzên Ewlekarîya Hundirîn – Bakur û rojhilatê Sûrîyê. 7 kesên ku karên dizîya çekdarî û şelandin dikirin li gundewarê Hesekê girtin. Dîroka weşanê: 14.6.2024. Lînk: https://asayish.com/?p=12307

[63] Hêzên Ewlekarîya Hundirîn – Bakur û rojhilatê Sûrîyê. Hin endamên DAIŞê yên ku bertîl ji welatîyên gundewarê Dêra Zorê distandin, hatin girtin. Dîroka weşanê: 21.9.2024. Lînk: https://asayish.com/?p=13176

[64] Malpera Rêveberîya Xweser. Xebatên dezgeha çavdêrîya giştî di nîveka yekem a sala 2024an de. Dîroka weşanê: 17.8.2024. Lînk: https://aanesgov.org/ar/?p=14639

2024an de 169 dosya çareser kirine û 32 têne lêkolînkirin û 257 gilî ji alîyê welatîyan ve hatine. Her wiha piranîya wan hatine çareserkirin û yên mayî jî xebata li ser wan berdewam e..” Her wiha amaje pê kir ku di xebata dezgeha çavdêrîya giştî de zehmetî hene, ew jî ji ber kêmbûna kadroyên pisporê çavdêrîyê û kêmbûna budceya dezgeha çavdêrîyê ye û destnîşan kir ku ew li ser çareserkirina wê dixebitin. Li gor ku li ser erdê hatî şopandin proseyên şopandina dosyayên gendelîyê di sektorên cihêreng de, dûrî ragihandinê têne meşandin. Ew jî li gor rapor û biryarên ku ji meclisa gelan a demokrat a kantona Cizîrê re, ku endamekî NRLSê tê de beşdar dibe, tê raberkirin.

Metirsîya van karên ku di nava çarçoveya sûcên birêxistinkirî de ne, ew e ku dikarin ji alîyê rêjîmên herêmî û rêxistina DAIŞê ve werin keysbazkirin[65]. Lewre gengaz e ku têkbirina xebatên ji bo têkoşîna li dijî van karan, bi awayekî bikeve nava berjewendîyên wan. Mînak; rêjîma tirkî gef xwarin ku eger hilbijartinên şaredarîyan li bakur û rojhilatê Sûrîyê pêk werin dê operasyoneke leşkerî li dijî herêmê bide destpêkirin, lewre Rêveberîya Xweser neçar ma ku li gor daxwaza hin partîyên siyasî û dewletên di şerê li dijî DAIŞê de hevkar in, bide paşxistin[66]. Tê zanîn ku ev hilbijartin weke navgîneke bikêrhatî ya ji bo pêkanîna çaksazîyên karîgerî di nava hemû şaredarîyan de ne. Êdî xerîkbûna pergala ewlekarî û leşkerî yên herêmê bi proseyên komploger ên ji alîyê rêjîmên herêmî û rêxistina DAIŞê ve, hiştiye ku di rûbirûbûyîna karên di çarçoveya sûcên birêxistinkirî de, lawazî çêbibe. Her wiha tunebûna stratejîyeke zelal a çapemenîya xwecihî ji bo şopandina van karên di çarçoveya sûcên birêxistinkirî de, şopandina gilî û rexneyên welatîyan û vekirina dosyayên lêpirsînê, hiştiye ku bi awayekî were keysbazkirin û weke kaxezeke reşkirinê li dijî Rêveberîya Xweser were bikaranîn. Di heman demê de jî destekê nade çavdêrîya civakî û xebatên sazîyên bicihanîna zagonê der barê gelek dozên tawanî de.

Ji alîyekî din ve, hîn jî pergala ewlekarî ya bakur û rojhilatê Sûrîyê ne xwedî dezgeheke saloxgêrîya diravî ya di têkoşîna li dijî perekirina terorê, karên di nava sûcên birêxistinkirî û gendelîya diravî de ye, an ku weke sazîyeke fermî. Piranîya karên li dijî van xebatan ku têne kirin, di navbera beşên cihêreng ên

---

[65] Ji bo bêtir bibînî: Dr. Şadî Ebdilwehab Mensûr. Cengên nifşê pêncem: Rêbazên teqînê yên hundir ber bi qada navneteweyî ve. Çapa yekem 2019. Weşan: Weşanxaneya El-Erebî – Qahire.

[66] Rêveberîya Xweser bi rêya Komîserîya hilbijartinan biryarek da ku her kantonek li gor mercên xwe yên guncav hilbijartinan li dar bixe…

Hêzên Ewlekarîya Hundirîn, Hêzên Sûrîya Demokrat û Dezgeha Çavdêrîya Giştî de, belavkirî ne. Her wiha helwesta dijminane ya rêjîmên herêmî rê nada ku têkilîyên fermî di warê têkoşîna li dijî sûcên birêxistinkirî yên dersînorî de, bi ferwerîyên herêmî û Enterpolê re çêbibin.

**- Nêzîkatîya Rêveberîya Xweser Der Barê Karên Di Nava Çarçoveya Sûcên Birêxistnkirî De:**

Rêveberîya Xweser di vê çarçoveyê de jî xwe dispêre heman nêzîkatîya ji bo têkoşîna li dijî karên tundrew ên rêxistina DAIŞê. An ku xwe dispêre diplomasîya civakî da ku civakê di proseya rûnirûbûyînê de beşdar bike. Êdî ew wiha dibîne ku dosyayên madeyên hişbir, gendelî û qaçaxtî, dosyayin ku bê xwedîderketina civakî zehmet in. Dibe ku ev yek ji wan sedeman be ku nahêle jîngeheke ewlekarî ya jihevketî ku bi rêya wê komên çetetî û revandinê, bazirganîya madeyên hişbir, şantajkirin û torên sûcên birêxistnkirî yên dersînorî, derkevin pêş. Tişta ku destekê dide vê texmînê jî, rengê civakî yê xweparêz ê civkanên xwecihî ye. Her wiha nerîtên êlî yên di navbera kurd, ereb û suryanan de rê nadin ku karên wiha pêk werin.

Li gor raporên Hêzên Ewlekarîya Hundirîn, piranîya proseyên girtina belavkerên madeyên hişbir, xwe dispêrin gilîyên welatîyan. Ev yek li gor zanebûna civakê ya bo metirsîya van madeyan û xwedîderketina mezin a civakê li qurbanîyên bombebarana dewleta tirk a li ser “Akademîya Dij-madeyên Hişbir” çi ku piranîya kesên jiyana xwe ji dest daye, ji deverên cihêreng ên herêmê ne. Mînak; xizmê yek ji girtîyên ku ji ber belavkirina madeyên hişbir hatiye girtin, ji koma lêkolînê ya NRLSê re diyar kir ku “ew ji ber girtina wî razî ne, da ku sizayên xwe bistîne”. Ev kes bi rêya gilîyê hevalekî xwe hatiye girtin ku madeyên hişbir pêşkêşî wî kirine da ku bi kar bîne. Her wiha xebatên Hêzên Ewlekarîya Hundirîn ên ji bo pêşxistina pisporîyên xwe û pirkirina dahatên xwe, li ber çavan têne dîtin.

Der barê dosyaya gendelîyê de jî, Rêveberîya Xweser dixebite da ku hejmara kadroyên xwe yên di warê çavdêrîyê de pispor pir bike û wan tev li perwerdeyên pispor ên karên dezgeha çavdêrîyê bike. Pê re jî tê dîtin ku hewldanên pêkanîna çaksazîyên karîgerî hene, an ku rewşa lawaz a rêjeyî dê bimîne heyanî ku ev armanc pêk werin.

**Çarem- Der barê Hilweşîna Jîneghî de**

Hevtayî bandorîyên operasyonên leşkerî yên rêjîmên herêmî û DAIŞê yên li ser kargehên rajeguzarî, jêrxane û jîngeha veberhênanî[67] yên herêmê ku di destpêka îsal de tundtir bûne[68], guherîna bahewayî jî bandor li rewşa aborî ya herêmê kiriye. Di heman demê de rêjeya hilweşîna jîngehî[69] jî bilind kiriye ku bi hin alozîyên hundirîn re, mîna alozîya peydakirina av û enerjîyê, buhabûn û rajeguzarîyên sivîl, ji dest derketiye û rêvebirina wê zehmet kiriye. Ji destpêka sala 2024an heyanî meha tebaxê, rêjeya guherîna jîngehî bi awayekî mezin li ser bakur û rojhilatê Sûrîyê bilind bûye û rewşa seqayê ya tundrew li ser bahewaya deverê serwerîya xwe berdewam kiriye. Rêxistina cîhanî ya çavdêrîya hewayî[70] tekez kir ku di tîrmeha borî de bilindtirîn pileya germahîyê li ser asta cîhanê, di dîroka nûjen de hat tomarkirin. Bandorîyên vê yekê li ser van hebû: Ewlekarîya aborî, ew jî bi rêya jidestdayîna gelek kesan ji dahatên xwe re û daketina dahatên diravî yên sektora çandinîyê. Hîn jî civakên xwecihî xwe dispêrin çandinîyê weke jêdera dahatan, mîna karkerî, bazirganî û çandinîyê. Ji ber zehmetîya hawirdekirina keresteyên vê sektorê, bandorîyên wê li ser projeyên navîn û piçûk ku xwe dispêrin berhemên çandinîyê, mîna nangeh û kargehên savar, şîremenî û zeytê jî bandor kiriye.

Hilweşîna jîngehî bi awayekî rêjeyî bandor li ser paşveçûna kereseteyên taybet bi pêkanîna ewlekarîya mirovî li bakur û rojhilatê Sûrîyê jî kiriye. Ew jî bi rêya nîşaneyên lawazîyê yên ku di van babetan de raber bûne:

- Ewlekarîya xwarinî: Di dabînkirina nan, sebzeyên xwecihî û êmê ajelan de zehmetî çêbûn.

- Ewlekarîya avî: Di encama nebirêkûpêkîya barîna baranê, bilindbûna pileya germahîyê, daketina ava çemê Feratê û ava binerd û birîna hêzên tirk bo

---

[67] Ferhenga “First”. Jîngeha Veberhînanî çi ye?. Lînk: https://www.firstbankeg.com/16636
[68] Desteya tenduristîyê. Daxuyanî ji bo raya giştî. Weşan: Malpera Rêveberîya Xweser. Dîroka weşanê: 28.12.2023. Lînk: https://aanesgov.org/ar/?p=9555
[69] Zanistnameya zanist û teknîkan. Jîngeh (Hiweşîn). Weşan: Zanistnameya erebî. Lînk: https://arab-ency.com.sy/tech/details/773/6
[70] World Meteorological Organization; July sets new temperature records; 13 August 2024; Link:
https://wmo.int/media/news/july-sets-new-temperature-records

ava êstgeha Elokê de, êdî li bajarê Hesekê û bajarê Dêra Zorê alozîyeke mezin a avê rûdaye.

- Ewlekarîya tenduristî: Bi awayekî zelal bi rêya pirbûna hejmara kesên bi jehrîyê ketine[71] û nexweşîyên kulbûnê, nemaze di mehên pûşber û tîrmehê de, tê dîtin. Her wiha rêjeya qirêjbûnê ku berîya niha me bal kişandiye ser, bilind bûye.

- Ewlekarîya civakî: Ev yek bi rêya berdewamîya koçberîyê, çi ji gundewaran ber bi bajaran ve yan jî bo derve, hatiye dîtin. Bi awayekî rêjeyî têkilîyên civakî lawaz bûn, ev yek bêtirî xwe li bajarê Qamişlo raber bû ku ji ber germahîya bilind, piranîya kesan xwest ku di malên xwe de bimînin. Her wiha ji ber rewşa hewayê ya germ ku bû sedema bandorbûna hestên dijminatîyê di nava mirov de, êdî hin nakokî û pevçûnên takekesî jî derketin pêş.

Bi gelemperî, sektora çandinîyê ya herî ku bêtir rastî bandorîyên guherîna hewayî hatiye ye. Di meha nîsanê de kantona Cizîrê rastî qeyraneke hewayî hat ku di encama wê de baranên xurt bariyan û bablîsokên baranî rabûn û pê re libên zîpikê bariyan, vê yekê ziyan gihand bêtirî 4500 donim[72] rûberên çandinîyê yên bi hilberînên cihêreng hatibûn çandin, mîna tov, sebze û hin şînkayîyên bêhnî (Giznîj û şembelîlk), ev yek tenê li ser asta Amûdê ye. Ji alîyekî din ve jî nerêkûpêkîya barîna baranê û pêlên germahîyê di werzê çandinîyê de heyanî astekê hilweşînek çêkir. Mînak; rûberên avî 6 milyon donim derbas nekir[73] û qaseya genim a ji cotyarên bakur û rojhilatê Sûrîyê hatî wergirtin, li gor ku berpirsekî desteya çandinî û avdanîyê ji NRLSê re daxuyand 771 hezar ton e, tê zanîn ku desteyê sala 2023yan milyonek û 150 hezar ton genim wergirt.

Qirêjîya jîngehî bûye çavkanîya metirsîyeke mezin ji bo ewlekarîya xwarinî. Li gor wê, derengbûna veguhastina gilêşa ku li bajaran ketiye ser hev bo cihên wan ên taybet, xwedî metirsîyeke jîngehî ya mezin e. Her wiha karên lêgerîna

---

[71] ANHA. Hejmarin metirs û beşin ku têra nexweşîyên jehrîyê li nexweşxaneya gel a Hesekê nakin. Dîroka weşanê: 13.6.2024. Lînk: https://hawarnews.com/ar-أعداد-مخيفة-وأقسام-لا-تتسع-لحالات-التسمم-بمشفى-الشعب-في-الحسكة/

[72] Satbyul Estella Kim and Others; Positive Association of Aggression with Ambient Temperature; Published: National Library of Medicine; Published online 2023 Jun 30; Link: https://www.ncbi.nlm.nih.gov/pmc/articles/PMC10303254/

[73] Malpera Rêveberîya Xweser. Ji ber qeyrana hewayî desteya çandinî û avdanîyê li Cizîrê rêjeya ziyanên rûbera çandinîyê ya li Amûdê eşkere dike. Dîroka weşanê: 3.4.2024. lînk: https://aanesgov.org/ar/?p=11385

di nava gilêşê de ku bûye diyadeyeke bikaranîna zarokan ji alîyê hin kesan ve ku bi aramnca qezenckirina sûdên diravî pêk tên, pir bûye û bandoreke nerênî li bajaran dike. Meclisa gelan a demokrat li kantona Reqayê neçar ma ku biryarekê[74] derxe ku bi rêya wê, diyardeya lêgerîna di nava gilêşa gemardankan de û belavkirina wan li nav kolanên giştî û baxên bajarê Reqayê de, bixe ber sizakirina zagonî de. Di meha pûşberê de şaredarîya bajarê Amûdê, piştî ku gilêş li bajêr ji ber xirabbûna erebeyên veguhastina gilêşê komî ser hev bû, lêborîn ji niştecihên bajêr xwest[75] û dest bi pêngaveke paqijîyê li nava bajêr kir. Her wiha li gelek taxên bajarên Qamişlo û Hesekê gilêş bi ser hev de kom bû. Dema ji karmendên şaredarîyê pirsa vê yekê hat kirin, sedema wê wiha da diyarkirin ku di dabînkirina sotemenî û parçeyên erebeyên veguhastina gilêşê de zehmetî hene. Tişta ku vê diyardeyê bêtir mezin dike ew e ku lawazî di hejmara projeyên taybet bi jinûveçêkirina gilêşê di nava bajaran de heye.

Di meha gulanê de hejmara nexweşên Laşmanîyayê li kantona Minbicê pir bû. Li gor wê jî desteya tendursitîyê ji destpêka 2024an ve nêzî 9 hezar nexweş tomar kirin ku ji sala borî bi rêjeya %50 bêtir e. Vê yekê hişt ku gerînendeya jîngehê, komîteya şaredarîyan û deteya tenduristîyê li kantonê dest bi pêngaveke hînkirinê bikin û li dijî mêşa ku vê nexweşîyê vediguhêze, di nava bajar û gundewaran de xebatê bikin.

Ji alîyekî din ve jî qirêjîya hewayî li bajarên sereke ji ber hejmara mezin a erebeyên cihêreng û bikaranîna welatîyan ji jeneretorên ku di nava xwe de şewatê çedikin da ku elektrîkê peyda bikin, pir bûye. Pê re jî toz û gemarên ku bi bayê re ber bi deverên niştecihbûyî ve diçin.

**Nêzîkatîya Rêveberîya Xweser der heqê wêranbûna jîngehî:**

Sazîyên Rêveberîya Xweser bandorên wêranbûna jîngehî bi awayekî çareser bike ku bi bûjenên peyda re hevseng be. Rêveberîyê bêtir guh da kirîza avê li herêmê û hejmarek proje û pêngavên hewarhatinê meşandin. Weke mînak, di

---

[74] Ehmde Yûnis (Cîgirê hevserokatîya desteya çandinî û avdanîyê ya Rêveberîay Xweser a bakur û rojhilatê Sûrîyê). Xebatên desteya çandinî û avdanîyê di nîveka yekem a sala 2024an de. Weşan: Malpera Rêveberîya Xweser. Dîroka weşanê: 19.8.2024. lînk: https://aanesgov.org/ar/?p=14674

[75] ANHA. Şaredarîya Amûdê lêborîna xwe bi gavin berçav werdigerîne. Dîroka weşanê: 26.6.2024. lînk: https://hawarnews.com/ar-عقب-الاعتذار-عن-التقصير-بدء-أعمال-نظافة-واسعة-في-مدينة/عامودا

meha gulana borî de, Desteya Rêveberîya Xwecihî li kantona Cizîrê ji 20 bîran 5 hazir kirin da ku avê ji bajarê Amûdê ber bi Hesekê ve bikişînin.[76] Jixwe ji dema êrîşên dewleta Tirk bi ser jêrzemîna herêmên bakur ên deverê de, ev proje rawestîyabû, lê niha û di vê rewşa ku bajar di alozîya avê de ye (di hundir û derveyî bajêr), pêngavên kolanê ji bo temamkirina projeyê berdewam in. di meha xezîrana borî de, Desteya Rêveberîya Xwecihî ya kantona Dêra Zorê pêngavek ji bo gihandina ava vexwarinê bo niştecihên bajarokê Sûrê dest pê kir.[77] Ew jî bi rêya 11 sehrîcên avê û piştî banga niştecihan ji ber kêmbûna ava vexwarinê û zêdebûna pileyên germahîyê. Di meha Tîrmehê de û piştî çeksazkirina kenalê av bi rêya projeya ``Kenala Avdana Xabûrê`` herikî. Ev kenal bi qasî 50km-î dirêj e. Ev proje beşek ji pilansazîya Rêveberîya Xweser li Dêra Zorê ye. Av ji bo avdana 220 donimî û peydakirina avê ji bo 270 hezar niştecihî û bi rêya 5 îstgehên avê yê sereke hat dabînkirin. Îstegên wê jî ev in: Îstgeha ava Herîze, îstgeha ava Herîce, îstgehên ava Xamiyt el-Sûr û Mergede. Jixwe pê re jî qonaxa duyem a projeya gihandina avê bo bajarê Hesekê berdewam e.

**Ji bo projeyên geşepêdana jîngehê yên ku Rêveberîya Xweser ew di vê salê de ragihandine, ev in:**

1. Ew ê teqîgehekê ji bo analîzkirina ax û avê di Navenda Lêkolînên Zanistî ya Çandinî û Afirandin û Cihêwazîyê veke da ku nimûneyên ax û avê pêşwazî bike ji bo ku kêşeyên madeyên sereke yên sîstema çandinîyê yên av, ax û riwekan nas bike û çareser bike. Armanc ji vê yekê jî zêdekirina hilberandina berheman da ku xwetêrkirin li go hejmara niştecihan pêk were.[78]

---

[7676] ji bo agahîyên zêdetir der barê projeyê de hûn dikarin li malpera Rêveberîya Xweser, ``Rêveberîyên xwecihî yên Cizîrê projeya kişandina ava vexwarinê ber bi Hesekê ve dikişîne (piştî ku weke bajarekî wêranbûyî hat ragihandin`` binihêrin. Dîroka weşanê: 3. 8. 2023, lînk: https://aanesgov.org/ar/?p=5918

[7777] Malpera Rêveberîya Xweser: Rêveberîya Xwecihî ya Dêra Zorê pêngavekê ji bo gihandina avê bo niştecihên bajarê Sûrê dest pê dike. Dîrok: 12. 6. 2024. Lînk: https://aanesgov.org/ar/?p=12716

[78] Malpera Rêveberîya Xweser: Çandinî û Avdan xizmeta teqîgehî ji bo analîzkirina av û axê li Navenda Lêkolînên Zanistî ya Çandinîyê dest pê dike. Dîrok: 3. 7. 2024. Lînk: https://aanesgov.org/ar/?p=13161

2. Ew ê 15000 darên cûr bi cûr biçîne.[79] Dar li sazîyên Rêveberîya Xweser û parêzgehên çandinîyê û daristanên heyî hatin belavkirin.

3. Desteya Jîngehê[80] di Rêveberîya Xweser de pilansazîya xwe di destpêka sala 2023an de ragihand. Tê de projeya analîzkirina avê li tevahî Bakur û Rojhilatê Sûrîyê hebû. Her wiha projeyên avakirina daristanên nû û pêngavên çandina daran û hînkirina milet ji bo parastina jîngehê, amadekirina hiljimartinekê der barê qirêjbûna ba li kantona Cizîrê, ev tev projeyên Desteya Jîngehê ne.

4. Aktîvkirina teqîgehekê ku taybet bi analîzkinên dermanan e.[81] her wiha teqîgeheke analîzên cûreyî li Qamişlo hat avakirin û nexweşxaneya giştî ya li Kobanê û nexweşxaneya zayînê li Qamişlo hat berdewamkirin

5. Ji bo kontrolkirina agirên ku di nav zevîyan de pê diketin, komîteyeke rewşên awarte ji bo parastina berhemên çandinîyê li kantonên herêmê hat sazkirin; ew jî bi rêya hevrêziya bi Hêzên Parastina Civak û Çandinîyê. Her wiha bolkeyên leşkerî li ser rêyan hatin avakirin da ku destwerdana bilez bikin. Di wan de alavên agirkujê hene. Van navendan karîbû piranîya agiran kontrol bikin.

Ji alîkeyî din ve wêranbûna jîngehî û hilweşîna îsteha Siwêdîyê hiştin ku gelek welatî dest bi sîstema enerjîya rojê û parzûnên avê û çandinîya di odeyên pilastîkî de bikin. Lê belê ev gavên han ne bes bûn ku xwesteka zêde ya enerjîyê û şikandina nirxê heyberên çandinîyê û kêmkirina xwespartina li jenetoran ji bo dabînkirina enerjîyê, werin peydakirin. Ev ji bilî ku bajar bi siwareyên ku li ser ardûya dîzil û benzînê dixebitin, tijî bûye.

[79] Desteya Jîngehê: Projeyên Desteya Jîngehê di nîva yekem a sala 2024. Weşanger: Malpera Rêveberîya Xweser. Dîroka weşanê: 10. 8. 2024. Lînk: https://aanesgov.org/ar/?p=14506

[80] Malpera Rêveberîya Xweser: projeya analîzkirina avê li tevahî bakur û rojhilatê Sûriyayê…girîngtirîn projeya Desteya Jîngehê ya sala 2024an e. dîrok: 21. 1. 2024. Lînk: https://aanesgov.org/ar/?p=10098

[81] Desteya Tendurisitîyê: Tenduristîya herêma bakur û rojhilatê Sûriyayê civîna xwe ya nîvsalane li dar dixe. Weşanger malpera Rêveberîya Xweser. Dîroka weşanê: 11. 7. 2024. Lînk: https://aanesgov.org/ar/?p=13418

**Şerên nifşên çarem û pêncem weke rêbazekî çewsandina Rêveberîya Xweser:**

Dewletê hêz di destê xwe de hişt û bû alîyê tekane yê ku şer dike yan li hemberî şer radiweste. Ew jî li gor peymana Wistefalîya (1648)[82] ku wê şerê olî di navbera katolîk û protistant de li Ewropayê bi dawî kir. Ev yek bû urfek di dewletên neteweyî de û paşê li Asya, Afrîka û Amerîka. Lê bi pêşketina teknelojîk di biwarê leşkerî û saloxgerî de, rûbirûyên ewlehîyê yên ku sînorên siyasî di navbera dewletan de derbas diin û ziyanê digihînin civak û jîngehê zêde bûn û bû faktoreke şer. Li gor pisporên leşkerî, [83]Qada şer a ku tê de du artêş pev diçin, nema weke berê ye; ji ber guhertinên ku di rewşa şerê hemdem de çêbûne û ji ber bawerîyên şer ên kevin êdî nema bi kêrî rewşa nû tên. Ya ku vê bawerîyê şîrove dike, zêdebûna gefên ku torên tewanên rêxistinkirî û rêxistinên tundrew û bandorên bragmatîya dewleta neteweyî û mezhebî di pêkanîna ejndeyên xwe de pêk tînin. Her wiha bandora guhertina seqayê û belavbûna nexweşiyan. Van tevan şêwene nû yên şer encam dane; her wek şerên nifşên çarem[84] û pêncem. Sîstemên dewletî ev jêderên gefan kirine mîna yekîneyeke tekûz û hevgirtî ji bo êşandina dijminên xwe. Ew jêder kirine mîna rêgezeke stratejîk ku piraniya tiştên di dariştina bawerîya ewlekarî ya taybet bi dozên ewlehî û berevanîyê peyda dikin. Wate, ew têgeh, rêgez û bingeh in ku ji bo danîna siyaset û Stratîcîyên ewlehî tên diyarkirin da ku li hemberî gef û kelemên cûr bi cûr bi awayekî rêxistinkirî di hemû sazî û di hundirê civakê de

---

[82] Zeyneb Hisnî Izedîn; Bandora şerê nifşê çarem li ser ewlekarîya erebî (lêkolîna rewşê); rêxistina Dewleta Islamî. Weşanger: Navenda Erebî ya Demokratîk a Lêkolînên Stratejîk, Aborî û Siyasî. Dîroka weşanê: 24. 7. 2016. Lînk: https://democraticac.de/?p=34525

[83]Ji bo agahîyên zêdetir, li Ceneral Robêrt Simêt vegere: bandora hêzê: hunera şer di cîhana hemdem de. Wergêr: Mazin Cendelî, çapa yekem 2008, weşanger: Sazîya Mihemed kurê Raşid Al Mektûm û Mala erebî ya Zanistan (Naşirûn-Beyrût).

[84] Şerên nifşên çarem (GW4) ev têgeh cara pêşîn di sala 1989an de derket û bi şerê li herêmeke ku nîşaneyên wê ne zelal in û di navbera her du gerînendeyên şer û karê siyasî de ye, hat naskirin. Kesine siyasetmedar an şervan vê herêmê mijûl dikin. Her wiha bi navê şerê newekehev (Asymmetric War) tê naskirin. Ew jî tê wateya şerê ku ji alîyê çekdarî û nenavendîya rêkaran… ve di navbera her du alîyan de ne weke hev e. şerên nifşên çarem bi pêş ket û bû GW6. Êdî tê de navgînên ragihandinê, rêxistinên civaka sivîl, oposizyona siyasî, rêkarên saloxgerî…hatin bikaranîn.
Ji bo agahîyên zêdetir: Peymangeha Karûbarên Ewlekarîya Cîhanî û Berevanîyê (IGSDA) Nifşên şer weke ku konêlê amerîkî Wilyem Is Lînd danîne. Dîroka weşanê: 21. 11. 2020.
Lînk: https://igsda.org?/أجيال-الحروب-كما-وضعها-الأمريكي-كولو/lang=ar

were sekinandin. Ceneral ``Robêrt Simêt`` di pirtûka xwe ya bi navê ``Bikêrhatina şer`` de dibîne ku ``hewildana berevanî û ewlkekarîyê, hewildaneke şerbar e ku ji rûbirûbûna eşkere û veşartî û ji rûbirûbûna di navbera mirovên xwedî berjewendî û pêşîneyên cihêreng de tên der. Ev yek nexweşîyeke ku di hemû civakan de cihgirtî ye…``[85]

Bikaranîna jêderên gefan ên cûrbicûr weke yekîneyeke tekûz û hevgirtî ji bo lêdana dijminan, şêweyekî şer ê aloz e ku em dikarin bibêjin ew şerê bişax e yan jî şerê pirenî ye. Em xwe di vê yekê de dispêrin danasîna Ceneral ``Karil Fon Kilawzifîrtiz``[86] a ji şer re ku ew şer weke wisa dibîne``Karek ji karên hêzê ye da ku dijmin were neçarkirin ku xwesteka me pêk bîne. Sepandina vîna me li ser dijmin, armanca şer e. têgeha ``nifşê çarem ê şeran``, vî şêweyê şer şîrove dike.

Ji ber ku wêranbûna jîngehî di piranîya xwe de ji diyardeya hilandina germayîyê ku weke pirsgirêkeke cîhanî ye, daye der, mirov dikare hevsengîya di navbera siyaseta dijminane ya sîstemên herêmê û çalakîyên Daişê û karên ku weke sûcên birêxistinkirî tên hesibandin, weke şerekî buhesibîne ku bi ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê de tê meşandin. Ji ber ku stratejîka berevanîyê ya li ba Rêveberîya Xweser xwe dispêre piştgirîya civaknê xwecihî, serkeftina pêngavên wan alîyan li dijî herêmê, di dûrxistina vê piştgirîyê de ye. Çimkî li gor Kilawzfîtiz[87], ``armanca şer ew e ku dijmin ji şekên wî bêpar bihêle û wî neçarî radestbûnê bike.``Mirov dikare vê yekê bi rêya van xalan bibîne: bi rêya propogendaya li dijî Rêveberîya Xweser, astengkirina xizmetguzarîyan bi rêya topbarandina jêrzemîn û avahîyên xizmetkarîyê, qutkirina avê, bikaranîna têkilîyên navneteweyî da ku heya ji wan were qutbûna siyasî li ser Rêveberîyê bisepînin. Girtina dergehên sînorî yên navneteweyî bi Bakur û Rojhilatê Sûrîyê jî û qedexekirina beşdarîya Rêveberîya Xweser di têkilîyên diplomatîk de û berdewamîya Daiş di operasyona xwe ya îdyolojîk bi rêya malperên civakî û pêrewên xwecihî û bikaranîna rewşa aborî û derûnî ya zehmet ji hêla hin çakakvanan ve…tev dikevin nav sûcên rêxistinkirî de. Tev jî dixwazin nakokî û dûrbûnekê di navbera civakên xwecihî yên Rêveberîya Xweser de çêkin.

[85] Ceneral Robêrt Simêt: Bikêrhatîyên Hêzê: Hunera şerê hemdem di cîhanê de. Wergêr: Mazin Cendelî. Çapa yekem 2008. Weşanger: Sazîya Mihemed kurê Raşid Al Mektûm û Mala Ereban a Zanistan Naşirûn-Beyrût, r29.

[86] Karil Fon Kilawzifîrtiz, der barê şer de, wergêr: Selîm Şakir el-Imamî, çapa yekem 1997, weşanger: Sazîya Erebî ya Lêkolîn û Weşanê. Beyrût. R103

[87] Jêdera borî, r:106

Rêveberîya Xweser jî têgeha xweparastinê û nermbûna di birêvebirina têkilîyên hundirîn û derveyîn de weke esas ji bo stratejîka xwe ya berevanîyê de bi kar tîne, nemaze ku bawerîya ewlekarîyê ya Rêveberîya Xweser serwextî hin şêweyên pêşketîtir ji van şeran bûye ku jê re ``şerên taybet``[88] tê gotin: Şerê taybet ew şer e ku dixwaze armancan pêk bîne; ew jî bi rêya bikaraîna aoavên madî û maneweî ji bo kuştina civvakê yan jî alîyê armancgirtî da ku ew alî xwe radest bike, bêhîbîbûn, reşbînî û bixwenebawerî werin belavkirin. Her wiha ji bo peydakirina nezelalîyê nerîn, helwest û ramanan de û ji bo kûrkirina nakokîyên nesereke û yên çêkirî û piştguhkirina nakokîya sereke û afrirandina nakokîyên hundirîn û piştguhkirina nakokîyên civakî…

Xuya ye nêzîkatîya Rêveberîya Xweser durist bû. Ya ku vê tekez dike ew e ku Rêveberîyê karîbû statûya xwe biparêze, hedarî û aramîyê li herêmekê dabîn bike ku dora wê tev hêzên dijmin in ên ku dixwazin wê tune bikin. Berevanî weke ku Kilawzfîtiz gotî: [89]``Şêweyê herî bihêz ê şer e ku dihêle binkeftina dijmin bêtir misoger be…`` ji alîyekî din ve nêzîkatîya Rêveberîya Xweser li hember gefan bixe di nav rêgeza Sin Toz: ``Bibinxistina stratejîka dijmin``. Wate, parastina pêwendîyên di navbera Rêveberîya Xweser û civakên xwecihî de. Ya ku vê yekê tekez dike, binkeftina pêngavên hêzên rêjîmê yên bi ser Dêra zorê de di destpêka meha tebaxê de. Her wiha binkeftina pêşbînîya rêjîma tirkî ku wê protestên berfereh li dijî Rêveberîya Xweser ji ber nebaşîya xizmetguzarî û zehmetîya dabara jiyanê derkevin. Lê tevî ku wê jêrzemîn û avahîyên byolojîk li herêmên bakur ên herêmê rûxandin û tevî ku dergehên sînorî girtî ne, rêxistina Daişê nikarîbû hembêzeke xwe ya gelêrî çêke, ragihandina ku li ser tayê bawerîyê dilîst bi bin kest. Ev ragihandin ji hêla sîstemên desthilatên herêmê û Daiş ve dihatin birêvebirin da ku kînê di navbera civakên xwecihî de belav bikin û fitneyeke nijadî, tîreyî û herêmî biafirînin. Tişta navborî dide diyarkirin ku herêm rastî şerên ji nifşê çarem û pêncem tê[90] ku di gelek alîyên xwe de mîna şerê tayabet e ku karmendên

---

[8888] Ji bo agahîyên zêdetir li vê lêkolînê vegerin: Komîteya Lêkolînên zanistên civakî li Akademîya Civaka Demokratîk, şerê taybet û bikaranînên wî, çapa yekem, mijdara 2017. Weşanger: Komîteya Lêkolînên zanistên civakî-Qamişlo

[89] Karil Fon Kilawizfîtiz, Der barê şer de, wergêr: Selîm Şakir el-Imamî, çapa yekem: 1997, weşanger: Sazîya Erebî ya Lêkoîn û Weşanê, Beyrût, r 528.

[90] Dr. Şadî Ebdilwehab Mensûr, Şerên Nifşê Pêncem: rêbazên teqandina ji hundir ve di qada navneteweyî de. Çapa yekem 2019, weşanger: El-Erebî lilneşir û eltewzî- Qahîre

leşkerî û ewlekarî li herêmê têgeha wê bi kar tînin. Ev cûreyê şeran xwe dispêre stratejîka ``rûxandina ji hundir ve``. Ew jî bi rêya bikaranîna kêmasîyên ku di tevna civakî de hene (tu civak her çiqasî pêşketî be,bêyî van kêmanîyan tune ye), her wiha rageşîyên civakî, nijadîm olî, mezhebî û siyasî jî diafirîne û nakokîyên heyî berferehtir dike û nerazîbûna li ser rewşa heyî gur dike bi awayekî ku êdî her tişt ji kontrolê derkeve. Ev şer bi rêya cîgir û weklan pêk tê û ji pişt perdeyan tê birêvebirin da ku dijmin were rûxandin bêyî ku pêwîstî bi destwerdana leşkerî ya rasterast a derveyîn hebe. Ew jî bi rêya hilweşandina sazîyên byolojîk, jevxistina yekîtiya gel bi awayekî ku derfetê dide ji bo avakir[91]ina sîstemeke desthilatê ya nû ku li gor berjewendîyên alîyên êrîşkar be. Ya ku vî rêbazê şer li ba dewletan cuda dike, kêmbûna lêçûnên wê li gel xwedûrxistina ji kêşeyên ku ji ber şerên kilasîkî encam didin. Her wiha ew derfetekê dide birêveberê şer ku hezkirina civakên xwecihî bi dest bixe û bi şêweyê rizgarker xwe bide nîşandan. Ew jî piştî ku welat bigihêje astekê ji tevlîhevî û hilweşîna hundirîn ku tiştek nemabe parçe bibe. Ev yek dide diyarkirin bê çima ev cûreyê şer xwe dispêre rêbazên şerê derûnî ji yê leşkerî bêtir. Ji ber wê jî ragihandin weke girîngtirîn çeka şerên nifşê çarem û pêncem tê hesibandin.

Sîstemên desthilatên herêmî û rêxistina Daişê vî şerî li dijî herêmên bakur û rojhilatê Sûrîyayê bi kar tîne; ew jî ji bo sedemên girêdayî berferehkirina çarçoveya xwe ya cyosîyasî û byolojîk. Ev sîstem ne ku ji alîyê xweparastinê (berevanî) ve vê siyasetê dimeşînin lê belê ev berevanî xwe dispêre dîyolojîya wê ya tunekirina tundrew. Rêjîma tirkî û bi piştgirîya qeterî, pilanan bi rê ve dibe da ku kartelên aborî li welatên ku di bin desteserîya Ixwanan de ne damezirîne; ew jî weke wîlayetên dewleta Osmanî li welatên Şam û bakurê Afrîkayê. Desteserîya ixwanan li ser desthilatîya Misir, Sodan, Tûnis, Lîbiya û Xezayê hatin bikaranîn hewildan hatin kirin ku ew Sûrîyê jî desteser bike, Ixwanan du caran cîhad bi awayekî eşkere li dijî civakên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê ragihandin; cara yekê di dema êrîşa bi ser Efrînê de bû[92] (zivistana 2018)

91

92 Kan Bûzdoxan: Nimêjkerên tirk di 90 hezar mizgefê de lava dikin da ku artêşa şaxê zeytûnê bi ser bikeve. Weşnager: Ajansa Anatolyayê. Dîrok: 21. 1. 2018. Lînk: https://www.aa.com.tr/ar/تركيا/المصلون-الأتراك-في-90-ألف-مسجد-يدعون-لنصرة-جيشهم-في-غصن-الزيتون/1037339

û cara duyan di dema êrîşa bi ser Serê Kanîyê û Girê Spî de bû[93] (havîna 2019).Rêjîma Îranê jî xwedî projeyeke mîna ya Tirkiyayê ye lê kirasê şîîtîyê lê ye. Tevî ku tu nîşane tune ne ku guhdaneke îranî ji alîyê rêgezeke îdyolojîk ve di herêma bakur rojhilatê Sûrîyê de heye lê tevî wê jî desteserkirina herêmê ji alîyê stratejîk girîng e da ku karibe li hember dijminên xwe yên herêmî û navneteweyî raweste û siyaseta hinartina şoreşa islamî ya îranî bimeşîne (Îran tu derê nahêle ku naxwaze şoreşa xwe lê belav bike). Siyaseta Rûsiyayê jî ne kêmî ya Îranê ye ku dixwaze li hember dijminên xwe yên navneteweyî raweste. Li gor lêkolîneke Navenda Rand[94], ``Rûsiya dixwaze Sûrîyê bike navendek ji bo birêveberîya wê ya di Rojhilata Navîn û Afrîkayê de (mîna birêveberîya amerîkî li kendava ereban).`` Ji bo rêjîma sûrî jî, armanca wî zelal e, ew dixwaze desteserîya xwe li ser tevahî herêmê vegerîne. Daiş jî xwedî projeya dewleta islamî ye. Sosretên ku bi navê dîn kirin, şerê wî yê ku niha dike, didin diyarkirin[95].

Armanc ji pêşandana van tiştan, zelalkirina armancên di pey vî şerî de û naskirina nasnameya alîyên ku vî şerî bi rê ve dibin. ``Şer li gor Ceneral ``Robêrt Simêt``[96] li ser çar astan tê birêvebirin; siyasî, stratejîk, meydanî û tektîkî. Her yek ji wan bi awayê rêza berbijêr ve dikeve çarçoveya ya din de. Destpêkê ji asta siyasî. Ev ast çarçoveyê dide tevahî çalakîyên astên din ên ku dixwazin heman armancan pêk bînin. Ev ast jêdera desthilatdarî û biryarê ye û girêdana di navbera astên din de dabîn dike…`` Ev jî dide diyarkirin ku çar şerên nifşê çarem

malpera el-Alem: Mizgeftên Tirkiya jî beşdarî êrîşa bi ser Efrînê de bûne, dîroka weşanê: 22. 1. 2018, lînk:
https://www.alalam.ir/news/3307086جوامع-تركيا-تشارك-في-الهجوم-على-عفرين/

[93] Ajansa Anatolyayê; Mizgeftên Tirkiyayê û hin welatên din bi lava û xwendina Quranê ji bo serkeftina hêzên kanîya aştîyê tije bûne. Dîroka weşanê: 10. 10. 2019. Lînk:
https://www.aa.com.tr/ar-السياسة/مساجد-تركيا-وبلدان-أخرى-تصدح-بالأدعية-وتلاوة-القرآن-نصرة-لقوات-نبع-السلام-/1608482

[94] Cêms Siladin û hinên din. Stratejîka rûsî li Rojhilata Navîn, weşanger sazîya Rand 2017, lînk: https://www.rand.org/content/dam/rand/pubs/perspectives/PE200/PE236/RAND_PE236z1.arabic.pdf

[95] Dr. Şadî Ebdilwehab Mensûr, şerên nifşê pêncem, rêbazên teqîna ji hundirî ve li qada navneteweyî. Çapa yekem, 2019, weşanger, el-Erebî llneşir û eltewzîi, Qahire, r19

[96] Ceneral Robêrt Simêt: Bikêrhatîyên Hêzê: Hunera şerê hemdem di cîhanê de. Wergêr: Mazin Cendelî. Çapa yekem 2008. Weşanger: Sazîya Mihemed kurê Raşid Al Mektûm û Mala Ereban a Zanistan Naşirûn-Beyrût, r30.

hene, her yek ji wan bi awayekî serbixwe li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê tê birêvebirin (lê bi giştîarmanca wan tevan tunekirina Rêveberîya Xweser e). Li gor taybetmnedîyên ku Kolonêl ``Wîlyem Is Lînd`` (xwedîyê teorîya ``nifşên her çar şeran``) diyar kirine, ``ew pêkanîna karên tundîya laşî û hişî ye bi rêyapêngavên reşkuştin û belavkirina gotara kînê bi rêya kesên xwe siyasetmedar, rewşenbîr û lêkoler dibînin. Her wiha ev rêbaz êrîşî xal û fermandarên leşkerî dike û xwe dispêre tektîkên terorê[97] yên ku xwe dispêrin bingeheke ``neniştumanî``; li vir jî navê Daiş û girûpên çete xwe dide pêş. Ev cûreyê şer bi awayekî nenavendî tê meşandin. Ew êrîşeke rasterast bi ser çand û îdylojîya dijmin de dike û komkujîyan li dijî sivîlan dike. Ev vê yekê li herêmên dagirkirî dibînin ku terora avî tê meşandin, jêrzemîn û avahîyên byolojîk ên ku ji bo jiyana niştecihan pêwîst in tên hilweşandin, niştecih tên koçberkirin û mafên wan tên binpêkirin. Ev yek jî qeberaya fişara li ser Rêveberîya Xweser dide diyarkirin û qasîya rastîya nêzîkatîya wê ji bo rawestîna li hember van rûbirûyan jî.

**Bandorên astengîyên li ser jîngeha ewlehîyê li herêmê heya dawîya sala 2025:**

Herêma bakur û rojhilatê Sûriyayê beşek ji herêmeke berferehtir e ku berê di bin serwerîya dagirkerîya osmanî de bû. Lê paşê dewletên ku di Şerê Cîhanê yê Yekem de bi ser ketin, ew li ser komek dewletên neteweyî dabeş kirin; ew jî bi rêya hejmarek rêkeftin ku ji rêkeftina Saykx-Bîko dest pê kirin. Ev rêkeftin bûn sedema kêşeyên ewlehîyê yên aloz ku li kêşeyên ji ber dagirkerîya osmanî encam dabûn, zêde bûn. Dewletên nijadperest nikarîbû nasnameyên neteweyî yên cûbicûr di dewleta tirkî yan jî yên erebî de bipişêvin. Di encamê de û ji ber rêjîmên zordar wan nikarîbû nasnameyeke niştumanî di hundirê dewletên xwe de ava bikin. Ji ber wê jî xuya ye zehmet e ku em dozên ewlehî û berevanîya dewletekê ji yên din cuda bikin. Weke nimûne, doza kurdî hê cihê nerehtîyê ye li ba van rêjîman. Îdyolojîyên dijberî hev ên ku ji derveyî sînor tên dihêlin ev rêjîm di rewşa nakokîyên domdar de bin. Îdyolojîya avakirina dewleta ``Wîlayet el-Feqîh`` û îdylojîya vejandina dewleta Osmanî û îdyolojîya dewleta islamî ya

[97] Zeyneb Hisnî Izedîn, bandora şerên nifşê çarem li ser ewlekarîya neteweya erebî, lêkolînkirina rewşa rêxistina Daişê, weşanger: Naveneda Demokratîk a Erebî ya Lêkolînên stratejîk, aborî ûs siyasî, dîrok: 24. 7. 2016. Lînk: https://democraticac.de/?p=34525

erebî ya sunî li gel îdyolojîyên netewperest ên erebî û tirkî..tev li herêmê hene û xwe didin pêş. Li alîyê din jî bradîgmeya neteweya demokratîk heye ku berovajî van îdyolojîkan e û piranîya civakên herêma bakur û rojhilatê Sûriyayê serwextî wê bûne û ew pejirandine. Ev civak ji wan îdyolojîyan nefret dibin. Ya ku balê dikişîne ew e ku hêzên ku ev îdyolojî wan bi rê ve dibin, li xaknîgarîya Sûriyayê hene û yek ji sedemên sereke ne yên ku hiştine alozîya sûrî bibe alozîyeke herêmî. Ev yek jî bi awayekî zelal dide diyarkirin ku dozên ewlehî û berevanîyê di navbera dewletên herêmê de têkelî hev bûne. Lê li şûna hevkarîya avaker (weke ku siyasetmedarên van dewletan didin diyarkirin di daxuyanîyên xwe de) şerên veşartî bi rêya wekîlan pêk tên.

Tevî serkeftina rêjeyî ya rêgeza bêalîbûnê ango ``xeta sêyem`` Rêveberîya Xweser nikare di alozîya Sûriyayê de xwe ji nakokîyan dûr bihêle. Xuya ye ew heta niha hê hewil dide rêgeza bêalîbûnê biparêze; ew jî bi rêya parastina kenalên pêwendîyê bi dewletên rojavayî, Rûsiya û Rêjîma Sûriyayê re. gerek e ev yek mîna hêzekê be ku rê li ber berferehbûna tirkî û îranê li bakur û rojhilatê Sûriyayê bigire (ji ber peymanên di navbera wan de). Xuya ye vê siyasetê hinek rê da Rêveberîyê ku hedarî û aramîyeke rêjeyî peyda bibe û hin çareserîyên bilez û demkî ji bo bandorên van rûbirûyên ewlehî yên li hemberî wê peyda bibin. Eger em bawerîyê bînin ku îdyolojîkên dijber tu caran nikarin bi aştî bi hev re bijîn, naxwe bragmatî jî dikare bi rolekê bilîze ku agirbestan di navbera wan de peyda bike. Ew jî li gor rêgeza derenghiştina pilanê heya dema peydabûna rewşa guncav ji bo serkeftina wê.

Sê faktor hene ku ew ê cûreya astengîyên ewlehî yên li hemberî herêmê heya sala 2025an diyar bikin: kêmbûna alavên berevanîyê yên guncav ji bo rawestîna li hember êrîş û ziyanên tirkî li ba Rêveberîya Xweser, nexasim ku beşdarîya wê li gel Hevpeymana Navneteweyî di şerê li dijî Daişê de, ziyanên tirkî ranewestandin bi qasî rawestandina ziyanên rêjîma sûrî. Mirov nikare bawerîyê bi dewletên Hevpeymanê bîne çimkî bragmatî wan bi rê ve dibe. Faktora duyem, berdewamiya helwesta dijminane ya rêjîmên herêmî li hember herêmê. Faktora sêyem jî berdewamîya bandorên guhertina seqayê ye. Li gor van faktoran mirov dikare pêşbîn bike ka çi guhertin ji destpêka sala 2024an ve dê di pêşveçûna van astengîyên ewlehî de çêbe. Ew jî bi vî awayê li jêr:

- **Ji bo ejindeyên rêjîmên desthilatê yên herêmî:**

Rêjîma tirkî tu nîşaneyên guhertina siyaseta xwe ya dijminane li hember herêmê, nîşan nade. Heta guhertinên ku di siyaseta wî de pêk hatin ku hewil da bi rêjîma sûrî re li hev were, xwe sipart bingeha rêgezên rêkeftina Adeneyê (1998) û bi rêya wê hewil da Rêveberîya Xweser sînordar bike û biçewisîne. Dewleta Tirk hê jî gefan li herêmê dixwe, herêmê topbaran dike, kesên siyasetmedar û payebilidên civakî, siyasî, leşkerî û çandî li herêmê dikuje. Operasyona wê ya li dijî Rêveberîya Xweser jî berdewam e. Jixwe mirov nikare zêde hêvîyên xwe bi guhertina rêjîma tirkî jî xurt bike, çimkî piranîya partîyên tirkî tu nîşaneyên rawestandina nakokîyan bi bakur û rojhilatê Sûriyayê re nîşan nadin. Ji alîyekî din ve Amerîkayê tu tişt ji bo rawestandina rageşîya di navbera Tirkiya û herêmê de nekir û stratejîka wê ne zelal e. xuya ye ew rêbazê ``nezelalîya bisûd``[98] û siyaseta ``qeraxa şer``[99] di nêzîkatîya xwe ya li hember herêmê bi kar tîne. Ya zelal jê tenê pabendîya pêşîne ya parastina enîyên heyî. Mirov nikare binase ka qasîya berdewamiya van siyasetan heya kengî ye. Li gor van tiştan, xuya ye rêjma tirkî dê êrîşên xwe bi ser herêmê de bidomîne. Ji alîyê siyasî ve jî dibe kulevhatinê bi rêjîma sûrî bi serpereştîya rûsî bike, ji alîyê leşkerî ve jî dibe ku pêngavên xwe yên toparana asîmanî û bejahî bike û hin herêmên din jî dagir bike (dema derfet bi dest bikeve). Ji alîyê saloxgerî ve jî dibe ku reşkuştin û şerê taybet bimeşîne û ji alîyê aborî ve dê dorpêçîya aborî û girtina dergehên sînorî bidomîne. Jixwe berê rêjîma Iraqê jî hewil dabû sînor bigire

[98] Rêgeza ``nezelalîya bisûd`` yek ji taybetmendîyên siyaseta derveyîn ya amerîkî li hember Rojhilata Navîn e. Ev rêbaz ji hêla Hinrî Kisîncir ve du danûstandinên Amerîka bi Çînê re di sala 1973yan de hat derxsitin. Hemû dewletên ku dixwazin mîna tecrubeya amerîkî (weke hêzeke desteser) bikin, vî rêbazî bi kar tînin. Nezelalîya bisûd dihêle alîyê bihêz karibe şîroveya xwe ya têkilîyên bi alîyê din re (alîyê lawaz) bisepîne, nexasim di şîrovekirina rêkeftin û belgeyên levkirinê de ku wan li gor bragmatîya xwe şîrove dike. Ev jî tê wê wateyê ku stratejîka alîyê bihêz ne zelal e û em nikarin pêşbîniya guhertinên ku dê di helwesta wan de çêbin, bikin. Her wekî rêkeftina di navbera rûs û tirkan de ku di encamê de pişta xwe da Efrînê ji bo tirkan û amerîkîyan jî pişta xwe da Serê Kanî û Girê Spî û derfet da Tirkiyeyê ku wan dagir bike.

[99] Ew siyaset bi awayekî navneteweyî piştî Şerê Cîhanê yê Yekem belav bû. Afrînerê wê wezîrê derve yê amerîkî yê berê ``Dalas`` bû. Wî di hevdîtineke rojnamegerî de wisa pênaseya wê kir: ``Rêbazê min di tevgerê de ew e ku ez bûyeran ber bi alozîyeke tekûz ve bibim, paşê ew wê kirîzê ber bi qeraxa şer ve bibim. Dema hemû nêzî wê qeraxê bibim û bêna wan ji tirsan biçike, ew neçar dibin ku xwe vekişînin da ku dawî neyê. Bi vî awayî tişta ku ez dixwazim bi giştî bi dest dixim…`` ji bo agahîyên zêdetir: Mihemed Hisên Heykel, Girêkên derûnî yên ku Rojhilata Navîn desteser dikin. Çapa yekem, 1958, weşanger: Beşgeha Elerebîye ya çap û weşanê. Qahire, r45

tevî ku bi rêya wî dergehê sînorî di salên 2014-2015an de bi hezarên êzîdiyan ji Daişê ji hêla YPG û  YPJ ve hatin rizgarkirin, piştî ku hêzên artêşa Iraqê û hêzên pê re revîyan.

Ji bo guhertinên ku heye di vê rêyê de pêk werin, hejmarek babet hene ku mirov dikare bibêje ew stratejîk in û dibe ku derkevin pêş. Ew babet jî ev in: tu berjewendîya tirkî di vegera desteserîya rêjîma sûrî û hevpeymanên wî li ser bakur û rojhilatê Sûriyayê tune ne. Armanc ji hewildanên dewleta Tirk ên tunekirin û sînordarkirina Rêveberîya Xweser, ew e ku desthilatekê mîna ``hikûmeta demkî`` û ``hikûmeta Rizgarîyê`` (Inqaz) ên alîgirên wê ne, damezirîne, ne ku wê radestî rêjîma sûrî bike; nexasim ku bakur û rojhilatê Sûriyayê bi gencîneyan dewlemend e. Dibe ku rêjîma tirkî hevrêzîyê bi rêjîma sûrî re bike da ku Rêveberîya Xweser biwestînin. Ew jî bi rêya pêngavên komploger ên cûr bi cûr. Wate, em nikarin zêde tekez bibin ku dê levkirineke temam di navbera her du rêjîman de çêbe ku bi rêya wê herêm were êrîşkirin û bi hêsanî radestî rêjîma sûrî were kirin. Dibe ku ya bibe sedema piştghkirina tirkî ji bakur û rojhilatê Sûriyayê re, kêşe û rageşîyên hundirîn in; çimkî siyaseta rêjîma tirkî dibe sedema alozîyeke nasnemeyê di hundirê civaka tirkî de, bi taybet di navbera kur û tirkan de ji alîyekî ve û ji alîyê din di navbera tirkên islamîk û yên neteweperest de. Ziyanên ku tirkên nijadperest digihînin koçberên sûrî li bbajarên ku piranîya wan tirk in û xesareta islamîyan di hilbijartinên şaredarîyê li Stenbol û Enqerayê de, rastîya vê alozîyê tekez dikin. Hêjayî gotinê ye ku silamîyên tirk hestên xwe yên der heqê islamîyên sûrî de piştguh kirin û berê xwe dane koma ixwanan a filestînî. Piştî ku pêşewayê partîya xêrxoşîyê ya nû ``Fatih Erbikan`` (yek ji cemserên islamî li Tirkiyayê), ji perlemana tirkî xwest ku hêzên tirkî ji bo piştgirîya Filestînê bişîne[100], wî xwest ku hevrêzî bi rêjîma sûrî re jî were kirin da ku koçberên sûrî vegerin welatê xwe û wî wisa got: ``Divê ev yek bi rêya pêwendîya bi rêjîma sûrî re (eger pêwîstî hebe) were pêkanîn; çimkî heya asteke mezin şer li wir rawestîya û Esed desteserîya xwe li %70-80 ji xaka Sûriyayê vegerand.[101]`` Her tim rêjîma tirkî

---

[100]Spotnîk Erebî, Pêşewayê partîyekê di perlemana tirkî de doz dike ku hêz ji welat ber bi Xezayê ve herin, dîroka weşanê 2. 11. 2023. Lînk:
https://sarabic.ae/20231102-زعيم-حزب-في-البرلمان-التركي-يدعو-لإرسال-قوات-من-بلاده-إلى-غزة/
.1082730189html

[101] Tirk Pers, kurê Erbekan tekez dike ku gerek e sûrî vegerin welatê xwe, dîrok: 27. 6. 2024. lînK
https://www.turkpress.co/node/101984

xwesteka xwe ya levhatina bi rêjîma sûrî û misrî re eşkere kirîye;[102] ew jî bi buhaneya piştgirîya doza Filestînê. Ji bo ku guhertinên di helwesta rêjîma tirkî de li hember dozên herêmî veşêre û ji bo ku alozîya aborî ya li Tikiyayê û ji ber bêçarîya rêjîma tirkî ku ew li hember erdhejeke mezintir a ku pispor dibêjin[103] ku ew ê li Tirkîyayê bixe, raweste, ragihandin dixwaze bi doza filestînî perdeyekê biavêje ser van alozîyan. Ji ber wê jî mirov dikare bibêje ku heye rewşa hundirîn a tirkî biteqe yan jî pilansazên tirk hay ji vê rastîyê hebin û hewil bidin berê xwe bêtir bidin rewşa hundirîn û hewil bidin wê çareser bikin da ku hinekî pêla tundîyê hinekî kêm bibe. Helwesta tirkî ya li hember rêjîma sûrî hejmarek pêşbîniyan di nava xwe de dihewîne. Ew dixwaze rê li ber destwerdana rêjîma sûrî di nakokîyeke pêşerojê di hundirê Tirkiyayê de bigire. Nexasim ku her tim Erdogan dibêje ku çalakîyên ``faşîst û nijadprestan`` (weke ku ew wan bi nav dike) zêde dibin û tirsa wî ji çêbûna derbeyeke leşkerî ya nû[104], derdikeve pêş; nemaze ji ber helwesta hin efsrên tirk ên nijdarperest ên hezkerên Atatork di şahîya derçûna akademîka leşkerî.  Ji bo başkirina Tirkiya ji têkilîyên xwe yên bi Rêveberîya Xweser re, ev yek girêdayî stratejîka dewletên rojavayî li hember herêmê. Yan Rêveberîya Xweser weke statûyeke siyasî û rêveberî dê were pejirandin; ew jî li ser esasê ku rêjîmê rewatîya xwe ya desthilatdarîya welat ji dest daye. Ev yek li gor biryarên navneteweyî dê pêk were. Wate, statûyên heyî di birêvebirina herêmê xwe de bidomin. Yan jî ji herêmê vekişin; ev jî dûr e çimkî Sûriya heye bibe herêmek ji bo derbasbûna rêya bazirganî ya cîhanî; çimkî hin pêşbînî hene ku buhayê levhatina tirkî û sûrî ew e ku rêyeke navneteweyî were vekirin ku Entab bi Heleb, Şam, Uman, Kendava Eqebe ve girê bide û heya bi rêya el-Cezîre el-Erebîya bigihêje rêya

[102] [102] Reuters; Turkey's Erdogan calls for Islamic alliance against Israel; Posted: 07.09.2024; Link:
https://www.reuters.com/world/middle-east/turkeys-erdogan-calls-islamic-alliance-against-israel-2024-09-07/

[103]Ben Hubbard and Safak Timur; He Warned Turkey About Earthquakes. Now He Fears [103] for Istanbul; Posted:06.10.2023; Link:
https://www.nytimes.com/2023/10/06/world/europe/turkey-earthquakes-naci-gorur.html

[104] Tirkiya Niha: Hin hûrgulîyên nû der barê derçûna akademîka leşkerî li Tirkiyayê, dîrok: 12. 9. 2024. Lînk:
https://www.turkeyalaan.net/2024/09/12/تفاصيل-جديدة-حول-حادثة-تخرج-الأكاديمي/

Hindistan-Ewropa. Ev rê (Entab-Eqebe) bi rêya Tehran-Bexda, Şam û Beyrûtê re tê birîn. Her wiha hin pêşbînî der barê rêya Besre, Qamişlo, Heleb û Laziqîyê de hene ku ew jî bi vê rêyê re tê birîn. Ev rê pir girîng in û beşek ji hevrikîya aborî ya cîhanî li Rojhilata Navîn in. Ji alîyekî din ve Rûsiya û Îran (dijminên welatên rojavayî) dixwazin hêzdarîya xwe li ser hesabê hêzdarîya tirkî li herêmê xurt bikin. Ji alîyekî din ve dibe ku rêjîm stratejîka xwe biguhere û têkilîyên xwe yên bi Rêveverîyê re baş bike. Ev yek ji bo rêjîmê baş e ji ber rola ku herêma bakur û rojhilatê Sûriyayê di avakirina Sûriyayê de bilîze, ev ji bilî sûdwergirtina wê ji hêza leşkerî ya HSDê di belavkirina ewlehîyê li Sûriyayê. Xuya ye ev tiştên navborî di nîva mayî ya sala 2024an de nepêkan in, lê di sala 2025an de her tiş dê zelaltir bibe.

Bi gelemperî mirov dikare rewşê di van çend mehên hatî de wisa puxte bike: êrîşên dijimnane yên rêjîma tirkî dê li hember herêmê bi awayekî nebirêxistinkirî dê bidomin. Wate, rageşî bi awayekî ne li pey hev dê bidome; ev yek dê di çarçoveya hewildanên rêjîmên tirkî û sûrî yên vegerandina bawerîyê di navbera wan de û levkirina wan li ser lawazkirina Rêveberîya Xweser bi rêya şerên nifşê çare û pêncem, pêk were. Di heman demê de hêzên amerîkî dê bargehên xwe li bakur û rojhilatê Sûriyayê xurttir bike, nemaze piştî levkirina pêşîne di navbera hêzên amerîkî û iraqî ji bo vekişîna hêzên amerîkî ji nîva Iraqê û bicihbûna wan di baregeha Herîr li herêma Kurdistanê. Her wiha karîn û şiyanên Daişê li çolistana Sûriyayê dê zêdetir bibe. Dibe ku piştî binkeftina wî ya xwekomkirinê li çolistana Enbarê û kuştina fermandarên wê yên mezin, çolistana sûrî bixe qadeke sereke ya çalakîyên xwe. Wate, mayîna hêzên amerîkî li bakur û rojhilatê Sûriyayê û başûrê wê, dê wêneyê Rêveberîya Xweser weke ``statûyeke hikûmî ya ne ji dewletan`` xurttir bike. Dibe ku pêleke nû ya koçber û penaberan berê xwe bidin herêmê. Ev pêl dê ji [105]wan kesan be ku levkirinên ewlekarî yên bi rêjîma sûrî re li Îdlib û gundewarên wê û gundewarên Helebê napejirînin (di çarçoveya levkirina di navbera rêjîmên sûrî û tirkî de, eger pêk were). Fermandarê giştî yê HSDê di civînekê de amaje kir ku bakur û rojhilatê Sûriyayê amade ye ku koçberên Îdlibê û herêmên bakur û rojavayê Sûriyayê pêşwazî bike.

[105]SDF PRESS: Fermandarîya Giştî ya hêzên me civînekê bi artêşa şoreşgeran û lîwayê el-Şimal el-Dîmoqratî re li dar dixe. Dîrok: 18. 9. 2024. Lînk: https://sdf-press.com/?p=43134

Ji bo rêjîma Sûriyayê, ew tu nîşaneyên hevjiyana bi Rêveberîya Xweser re û pejirandina wê weke rewşeke siyasî nîşan nade. Ew ê hewil bide bi rêya nifşê çarem ê şer ango şerê taybet û bi rêya hevkarîya bi Tirkiya û hevpeymanên xwe Rûsiya û Îranê re desteserîya xwe ya li herêmê vegerîne. Ew ê dest bi şerekî propogendayê bike da ku bêhêvîtî û dudilîyê belav bike û nerîneke giştî der barê angaştên ``destkeftîyên demkî`` de saz bike û ji bilî van rêbazan bi kar bîne.[106]Dibe ku careke din hewil bide rageşîyê li kantona Dêra Zorê di van mehên bê de gur bike û şaneyên Partîya Basê çalak bike da ku nakokîyeke nijadî û neteweperest di nav civakên erebî de belav bike. Ya ku vê yekê tekez dike, birêxistinkirina komekê ji kesayetên êlan ên girêdayî rêjîmê di bin navê ``Dîdara Êlên Ereban``[107] li bajarê Humsê di nîva meha îlonê de. Ev hevdîtin bi hejmarek helwestên nijadperes û mandelekirina astengîyên bi melyonan sûrî ji ber siyaseta zordar a rêjîmê, derket. Dibe ku ew Minbic û Reqa jî di pêngavên xwe yên xerabkirinê yên pêşbînîkirî de bi kar bîne. Her wiha dibe ku pişta komên islamî yên tundrew jî bigire (weke ku pişta wan li dijî hêzên amerîkî li Iraqê di destpêka vê sedsalê de girt). Dibe ku ew heman şaneyan di şerê li dijî hêzên amerîkî yên li bakur û rojhilatê Sûriyayê de bi kar bîne; ew jî bi rêya şaneyên Daişê yên ku bi rêjîmê re lihevhatinên ewlekarî kirin û şaneyên basî û girûpên girêdayî Îranê jî bi kar bîne. Her wiha dema rêjîmên sûrî û tirkî li hev werin, dibe ku ew endamên rêxistina Qaide jî li herêmên Îdlibê ji bo heman armancê bi kar bîne. Dibe ku paşê rêjîma sûrî agahîyan der barê wan de bide rêveberîya amerîkî da ku başiya xwe bide diyarkirin û di heman demê de xwe ji van endamên tundrew û yên ji alîyê îdyolojîk ve ne weke wî ne xelas bike.

Bi awayekî giştî rêjîm dê her nikaribe êrîşên yekser bi ser herêmê de bike. Ji bo babeta peydakirina rêbazekî levkirinê bi Rêveberîya Xweser re, ew tiştekî nedûr e çimkî Rêveberîyê tu caran serxwebûna xwe ya ji Şamê ranegihandîye û helwesteke dijminane jê negirtîye. Rêveberîyê zêdeyî carekê ragihand ku ew amade ye ji bo diyalog û çareserkirina pirsgirêkan di navbera xwe û rêjîmê de.

[106] ji bo agahîyên zêdetir: Komîteya Lêkolînên Zanistên Civakî li Akademîya Civaka Demokratîk, şerê taybet û bikranînên wî, çapa yekem mijdar 2017, weşanger: Komîteya Lêkolînên Zanistên Civakî- Qamişlo, r226.

[107] Nîbal Ibrahîm, êl û eşîrên ereban li Sûriya û welatên ereban, civînekê li Humsê li dar dixe: Em hebûna hêzên dagikerîyê li ser xaka xwe napejirînin. Weşanger: Rojnameya Basê, dîrok: 14. 9. 2024. Lînk: https://newspaper.albaathmedia.sy/2024/09/14/العشائر-والقبائل-العربية-في-سورية-وال/

Çawa ku pêwîstîya Şamê bi bakur û rojhilatê Sûriyayê heye da ku ji nû ve Sûriya ava bike û rewşa aborî baş bke û sîstema xwe ya leşkerî çeksaz bike, wisa Rêveberîya Xweser jî hewcedarî başkirina têkilîyên xwe bi Şamê re ye da ku dorpêçî ji ser herêmê here û pêngavên dijminane yên rêjîmê li dijî xwe rawestîne, nemaze piştî ragihandina girêbesta civakî ya rêveberîyê ku Şamê weke paytexta Sûriyayê dibîne. Ji ber wê jî berjewendîya Şamê di levhatina bi Rêveberîyê re ye, ne berovajî wê. Ji bo dema mayî ji vê salê jî, ji ber hewildanên levhatina di navbera rêjîmên sûrî û tirkî de (dibe ku heya sala bê didomin), helwesta rêjîma sûrî li dijî Rêveberîyê dê bidome. Di heman demê de rêjîm dê tevlînebûna xwe ya di nakokîya îranî-israîlî de bi kar bîne da ku helwesta dijminane ya welatên rojavayî li ser xwe sivik bike lê ji ber bazirganîya wî ya bi hişbiran ji bo sivikirina alozîya aborî, dê hinekî vê razîbûna rojavayî li ser dereng bihêle. Bi awayekî giştî dibe ku bi rêya wekîlan têkilîyên aborî di navbera rêjîm û Rêveberîyê de baş bibin lê ev yek dê siyaseta wî ya dijminane li hember herêmê zêdetir bike; nexasim li hember HSD û aştîya navxweyî. Ew ê helwesta rêjîma tirkî ya dijminane li hember herêmê bi kar bîne. Ji ber wê jî xuya ye rêjîma sûrî stratejîka xwe bi awayekî giştî der barê herêmê  de di sala bê de naguhere. Di heman demê de alozîya rêjîmê ya hundirîn jî dê bidome. Dibe ku nakokî di navbera cemserên rêjîmê de ([108]alîgirên Rûsiya û alîgirên Îranê) zêde bibe. Dibe ku şepêleke din a ku pişta xwe bi Siûdîye, Misir û Ordunê xurt bike jî derkeve.

Ji bo Rûsiya û Îranê berjewendîyên wan bi yê rêjîmê re ne. di heman demê de ew dixwazin heya ji wan were ziyanê bigihînin hêzên amerîkî yên li bakur û rojhilatê Sûriyayê. Xuya ye biryara wan a başkirina têkilîyan bi Rêveberîya Xweser re, dûr e. bragmatîya rûsî ziyaneke mezin gihand herêmê  ji dema alîkarîya wê di dagirkirina Efrînê de. Niha jî ew dixwaze têkilîyên di navbera rêjîmên tirkî û sûrî de li ser zemîneke dijberî Rêveberîya Xweser baş bike. Heya niha di şerê wê yê li dijî welatên rojavayî de, bidestxistina hevaltîya rêjîma tirkî li ba Rûsiyayê yek babetên stratejîk di bawerîya wê ya siyasî û leşkerî de ye. Ya ku vê yekê tekez dike, hewildanên wê yên levhatina di navbera rêjîma sûrî û

[108] ji bo agahîyên zêdetir der barê vê analîzê de: lînk: The Economist; Is Syria's drug-dealing dictator coming in from the cold?; Posted: 11.09.2024; Link: https://www.economist.com/middle-east-and-africa/2024/09/11/is-syrias-drug-dealing-dictator-coming-in-from-the-cold

tirkî de ne. her wiha ew nakokîya îdyolojîk a dîrokî di navbera dewletan de bi kar tîne (Îran, Tirkiya û Siûdîyê) da ku hin sedem peyda bibin ku bi rêya wan Rûsiya karibe desteserîya xwe ya li ser rêjîma sûrî misoger bike û desteserîya wî ya li ser tevahî xaknîgarîya sûrî di bin sîwana balafirên rûsî de û bi rêya pêngavên saloxgerî vegerîne. Ev yek jî weke bijarteyekê ye ku bi rêya wê dixwaze rêkeftinên di navbera xwe û rêjîma sûrî de (der barê baregehên leşkerî li beravê û biwarên aborî de) biparêze. Ji ber wê jî tu guhertin di helwesta rûsî li hember herêmê dê tune be û ew ê her û her helwesta dijminane ya tirkî bi kar bîne da ku hebûna xwe ya leşkerî biparêze; ew jî di bin buhaneya ``gerantorê agirbestê`` (weke ku xwe dide danasîn). Ji bo Îranê, ew dibîne ku deverên di bin kontrola rêjîmê de jê re ji herêmên bakur û rojhilatê Sûriyayê baştir in, çimkî li herêmên rêjîmê projeyên wî yên siyasî û aborî bêtir li Sûriyayê tên parastin. Stratejîka hinartina ``şoreşa islamî`` weke ku di edebîyata îdyolojîk a Xumeynî de tê gotin, yek ji rêgezên ewlehiya neteweyî ye ku rêjîma îranî bi xwe danîye. Ev yek jî li ser Îranê disepîne ku ew desteserîya xwe li ser Sûriya, Iraq, Ordun, Libnan û Kendavê bisepîne. Bi giştî rêjîmên îranî û rûsî ne xwedî navdarîyeke baş li ba piranîya sûriyan in. ji ber wê jî ew bêtir xwe dispêre parastina rêjîmê ji ketinê.

**Ji bo çalakîyên Daişê:**

Ji ber tunebûna hevkarîyeke herêmî li dijî Daişê, ev yek derfetê didiyê ku çalakîyên xwe yên îdylojîk bi rêxistin bike, mirovan leşker bike û pêngavên xwe pêk bîne. Rêjîma tirkî mîna ``benkekê`` ji çekdarên islamî li herêmên ku li Rojava dagir kirine, damezirandiye. Van çekdaran dide hin alîyên din da ku şer li Azerbîcan, başûrê Kurdistanê, Lîbiya, Nîcir û çiyayên Qendîlê bikin. Tê pêşbînîkirin ku ew li Ukrayna jî şer dikin.[109]piranîya tundrewan hê jî li wan deveran çalak in, nemaze li herêmên bakur û rojavayê Sûriyayê. Ya ku vê tekez dike, ew e ku Hevpeymana Navneteweyî bi dehan ji wan li wir kuştin. Yek ji kesên herî navdar ên ku hatin kuştin, Ebû Ebdirehmanê Mekî [110]bû ku ew di

[109] Rûsiya îro: Zaxarova nerîna xwe der barê danûstandinên rêjîma Kêêf bi terorîstên Sûriyayê re dide. Dîroka weşanê: 10. 9. 2024. Lînk: https://arabic.rt.com/world/1599280-زاخاروفا-تعلق-على-مفاوضات-نظام-كييف-مع-الإرهابيين-في-سوريا/

[110] Diya Ode, piştî derbeya Mekî…çi ji Heres el-Dîn li Sûriyayê maye? Weşanger: malpera el-Hure. Dîrok: 26. 8. 2024. Lînk: https://www.alhurra.com/syria/2024/08/26؟ضربة-المكي-بقي-لـحراس-الدين-في-سوريا/

rêxistina ``Huras el-Dîn`` de fermandarekî navdar bû û alîgirê Qaide bû. Bê guman Daiş sûdê ji bê jîngehê digire. Rêjîma sûrî jî, tevî ku gelek endamên Daişê ketin ber levhatinên ewlekarîyê li herêmên desthilata wê, lê ew hê jî nikare Daiş tune bike yan jî zêdebûna êrîşên wî kêm bike. Daiş sûdê ji çolistana berfereh a ku dikare xwe tê de veşêre, digire û ji wir êrîşên bilez li dijî hêzên rêjîmê û hevpeymanên wê dike. Li gor pêngavên Daişê yên li çolistan û Derayê ku tên ragihandin, xuya ye Daiş dixwaze careke din wê herêmê desteser bike û tecrubeya xwe ya salên 2011 û 2014 vegerîne û li gor derfetê bajaran desteser bike. Jixwe bajarên herî zêde ji bo desteserîya Daişê hilbijartî ne, Tedmur, Dera û Dêra Zorê ne. ew jî ji ber ku civakên xwecihî yên wan deveran gazinan ji rewşa heyî dikin û îdyolojîka îranî yan jî hêzên rûsî napejirînin.

Li gor şopandina malperên nûçeyan ên ku pêngavên Daişê romal dikin, em ê bibînin ku xwe dûrî şerê rasterast bi HSDê re dike û di êrîşên xwe de li armancên hêsan dixe û reşkujîyan li herêmên ku şaneyên girêdayî rêjîma sûrî û tirkî çalak in, pêk tîne. Her wiha tê dîtin ku piraniya tektîkên wî mîna tektîkên şaneyên girêdayî rêjîmê ne. di van êrîşan de ew cesareta ku gerek e ji enerjîya bawerîya îdyolojîk tê bidesxistin, tune ye. Di van êrîşan de hejmarek gule bi ser bendeke kontrolê yan siwareyan de tên berdan û paşî direvin û paşê jî vê pêngava biçûk di ragihandinê de gelekî mezin dikin. Ew nikare êrîşine mîna yên li çolistanê, li herêmê pêk bîne. Ji alîyekî din ve Daiş danûstandina hêsan a Rêveberîya Xweser bi deverên ku ji Daişê rizgar kirine, bi kar tîne. Ji ber wê jî pêwîst e ev dever ji alîyê ewlekarî ve bêtir li ser wan were sekinandin. Xuya ye Rêveberî naxwaze rêxistinên ku xwe weke berevanên mafên mirovan dibînin, aciz bike.

Bi awayekî giştî Daiş stratejîka ``xwexurtkirin û westandina dijmin`` bi kar tîne. Ew jî bi rêya xurtkirina îdylojîya xwe li herêmê û êrîşkirinên bêsûd lê ew ji bo propogendaya ku xizmeta vê xurtkirinê dikin, pêwîst in. Di vê derbarê de cîgira alîkarê wezîrê berevanîya amerîkî ``Dana Strol``[111] di hevdîtineke berê de wisa der barê Daişê de gotiye: ``Hê îdyolojîka pêwîst ji bo xurtkirina endamên xwe û leşkerkirina wan di refên xwe de, peyda ye. Hê binyata xwe ji nû ve sazkirinê li bal wê heye tevî ku tu xak niha di bin destê wê de tune ye. Ev jî

[111] ji bo tevahî diyalogê: Bayloza Amerîkî li Sûriyayê: Puxteyeke taybet der barê girîngîya bibinxistina Daiş. Dîrok: 28. 2. 2023. Lînk: https://sy.usembassy.gov/ar-إيجاز-خاص-حول-مهمة-هزيمة-داعش/

dihêle em pabendî bênferehîya stratejîk û piştgirîya hevkarên xwe bin da ku rê li ber karîna vê artêşa terorîs a xweavakirinê were girtin û da ku ji nû ve milet û niştecihan li Iraq, Sûriya û tevahîya Rojhilata Navîn netirîsne…`` Îcar Daiş dê tektîka xwe ya ku xwe dispêrîyê de bidomîne û dê hewil bide kêmasîyê ewlekarî li herêmê bi kar bîne. Jixwe ew valahî û kêmasîyên ewlehîyê ji hêla rêjîmên herêmî yên dijberî Rêveberîyê ve û ji ber guhertina seqayî peyda dibin. Her wiha Daiş dixwaze hin pêngavan li kampa Holê pêk bîne û endamên xwe yên girîtî ji wir derxe. Ceneral Maykil Korêla (fermandarê birêveberîya navenî ya amerîkî) li ser vê yekê tekez kir û got[112]: ``Armanca sereke ya Daşê, rizgarkirina çekdarên xwe yên girtî ye da ku çalakîyên wê bidomin…`` Ji alîyekî din ve, çalakîyên Daişê yên xerabkirinê li bakur û rojhilatê Sûriyayê, ji bo siyasetên rêjîmên herêmî baş in, loma ew pêngavên xwe yên şer li dijî herêmê ranewestînin heta ku xizmeta Daiş jî bikin. Jixwe dibe ku levkirin di navbera wan û Daiş de jî hebin.

**Ji bo karên sûcên birêxistinkirî:**

Ewlehîya civakî dê her misoger bimîne madem hevkarî di navbera civak û Rêveberîya Xweser de ji bo rawestîna li hember van kiryaran heye. Dibe ku fişara ewlehî li ser hişbiran zêdetir bibe, çimkî alozîyên sûrî ber bi zêdebûnê ve diçin. Bazirganên hişbiran jî dê hewil bidin vê yekê bi kar bînin da ku derbasî herêmê bibin û di heman demê de bazirganên xwecihî jî dê hewil bidin rêbazên xwe yên firotin û belavkirina hişbiran bi pêş bixin û hejmara kesên hişbiran bi kar tînin zêde bikin, nexasim xortên ji alîyê darayî ve nûhatî yan jî kesên pirsgirêkên derûnî û darayî li ba wan hebin. Ji bo dosyeyên gendelîyê jî Rêveberîya Xweser dê xwe neçar bibîne ku karê dezgehên çavdêrîyê zêde bike, çimkî gendelî ramana sereke ya ku Rêveberî li ser ava bûye, lawaz û sînordar dike. Têkilîyeke berovajî di navbera cewherê Rêveberîyê û gendelîyê de heye; her ku gendelî zêde dibe, cewherên Rêveberîyê lawaz dibe û berovajî wê. Rêjîmên herêmî û Daiş vê yekê baş dizanin, loma gerek e Rêveberî bi awayekî cidî li ser vê babetê bisekine.

---

[112]@ [112] CENTCOMArabic; 03.09.2024; Link: https://x.com/CENTCOMArabic/status/1830743843001582030?ref_src=twsrc%5Egoogle%7Ctwcamp%5Eserp%7Ctwgr%5Etweet

**Ji bo wêranbûna jîngehî:**

Tevî ku pêşbînî dibêjin ku zivistana vê salê dê baş be, lê mirov nikare ji vê rastîyê piştras bibe, nemaze ku piranîya lêkolînên girêdayî diyardeya hilandina germahîyê û guhertina seqayê amaje kirine ku mirov nikare bi awayekî hûrgul rewşa seqayê binase. Bi gelemperî rewşa zuhabûnê ya ku herêm tê re derabas dibe, dê bidome û gerek e Rêveberîya Xweser pilansazîyên stratejîk pêşkêş bike û sûdê ji tecrubeyên cîhanî bigire da ku ev zuhabûn belav nebe. Ji bo alozîya avê, madem helwesta dijminane ya rêjîma tirkî li hember herêmê berdewam e, alozîya avê jî dê bidome. Heya niha tu pilaneke stratejîk a rêveberîyê nhatiye dîtin ku bi rêya wê çareserîyek ji bo alozîya avê were dîtin. Projeyên awarte yên ku hatine pesendkirin jî bi awayekî hêdî kar dikin. Ji bo qirêjbûnê jî, hin projeyên baş li ba Desteya Jîngehê li herêmê hene; ew jî bi rêya çandina daran û hesabkirina rêjeyên qirêjîyê. Ji bo kombûna tingan (sergo) li hin herêman, tê pêşbînîkirin ku civak fişarê li Desteya Şaredarîyan bike da ku çareserîyekê bibîne. Jixwe ji ber xwespartina mezin a li jenetorên kehrebeyê û hejmara mezin a siwareyan  û berdewamîya karê parzûnên betrolê û ji ber ku gelek beşgeh newêrin ji ber gefên tirkî di biwarê enerjîyê de projeyan vekin, tê pêşbînîkirin ku qirêjîya hewa û ya bihîstinê û ya dîtinê bidome.Tê pêşbînîkirin ku Rêveberîya Xweser rê li ber zêdebûna vê wêranbûna jîngehî bigire lê diheman demê de ew nikare vê rêjeyê kêm bike.

Di encamê de herêma bakur û rojhilatê Sûriyayê, rastî torek ji hevpeymanên dijminane û bandorên guhertina seqayê tê. Ev jî dê bihêle babetên ewlehî û berevanîyê her tim weke tirsekê di dilê civakên xwecihî yên herêmê de bimînin. Piranîya karînên madî  û dahatan ji bo bersivdana van dozan werin bikaranîn. Dibe ku hin bersivdan bi awayekî neyînî derkevin pêş; her wekî koçberî yan jî xerçnekirina pereyan di veberhênanan de yan jî zêdebûna xerçkirina leşkerî. Dibe ku rêjeya nehazirbûna di dibistanan de jî ji ber rewşa aborî ya zehmet û sedemên din zêde bibe. Di heman demê de dê duliyeke mezin ji tirsa windabûna welat bidome; nexasim ji ber helwesta neyînî ya civaka navneteweyî ya der heqê alozîya Sûriyayê de. Dibe ku rêjîm jî li ser hişmendîya xwe ya desteser bimîne yan jî hevpeymanê bi Tirkiyayê re girê bide yan jî bi rêya Îran an Rûsiya herêmê vegerîne bin desteserîya xwe yan jî dibe ku herêm rastî parçebûn û dagirkerîyeke tirkî ya nû were. Rêjîm heya niha hê li ser

çareserîya leşkerî û ewlekarî ji alozîya sûrî re rijd e û wê weke rêgezeke stratejîk bi kar tîne. Rêveberîya Xweser di nêzîkatîya xwe ya berevanîya li hember van astengîyên ewlekarî, berdewam e. Ew ê li gor qebare û şêweyên van gef û astengîyan neçar be ku nêzîkatîya xwe bi pêştir bixe. Li gor wê jî hevsengîya dudil a ku herêm wê dijî, dê di sala 2025an de jî bidome, lê dibe ku guhertinên ji nişkan ve di stratejîkên hêzên aktîv di dosyeya sûrî de çêbin an jî guhertin di stratejîka Rêveberîya Xweser de çêbin.

**Rêbaz û alavên çareserkirina dozên ewlekarî û berevanîyê li herêma bakur û rojhilatê Sûriyayê:**

Hêza gefên ewlehîyê çiqazî mezin be û çareserkirina wan zehmet be, her tim rêbazin hene ku mirov dikare di çareserîyê de xwe bispêre wan. Birêveberîya stratejîk di guncavkirina van rêbazan bi dahat û karînên peyda derdikeve pêş. Ev yek heya astekê di nêzîkatîya Rêveberîya Xweser a li hember van astengîyan ku ew ji deh salan ve rastî wan tê, tê xuyakirin. Lê hê Rêveberî zehmetîyan ji ber van astengîyan dikişîne û nikarîbû wan bi awayekî pûç bike ku bandora wan tune bike. Ji ber wê jî gerek e Rêveberîya Xweser rêbazekî bi kar bîne ku cihên lawazîyê yên ku jêderên van astengîyan sûdê ji wan digire, çareser bike. Mirov dikare hin pêşinyaran pêşkêş bike ku dikarin heya astekê sêwirandineke berferehtir a vê nêzîkatîyê saz bike; ew jî bi rêya xwespartina li astengîyên navborî û rêbazên çareserkirina wan ji hêla Rêveberîyê ve û nirxandinên ku ji hêla pisporên van biwaran hatine pêşkêşkirin; ew jî bi vî awayê li jêr:

a) Xurtkirina hukmê durist û zana:

Danasîneke diyar ji bo hukmê durist tune ye lê piranîya lêkoleran weke şertekî sereke ji bo pêkanîna geşepêdana ewlehîya mirovî li ser tekez kirine. Weke nimûne, rapora geşepêdana mirovî ya erebî wisa ew pênase kiriye: [113]``Hukmê durist, ew hukm e ku ferehîya mirov tê de ye, xurt dike, pişta wê digire û dipaêze. Ew karînên mirovan û bijarte, baldarî û azadîyên wan ên aborî,

[113] ji bo agahîyên zêdetir: Menal Cirûd, wateya hukmê durist The concept of good governance, weşanger: Ferhenga Berfereh a siyasî. Dîrok: 31. 5. 2022. Lînk:
https://political-encyclopedia.org/dictionaryمفهوم%20الحكم%20الراشد/

civakî û siyasî firehtir dike û hewil dide hemû pêkhateyên gel bi awayekî tekûz û temam binimîne. Ew li hember milet berpirsiyar e ku ew berjewendîyên hemû endamên gel dabîn bike.`` Girêbesta civakî ya herêma bakur û rojhilatê Sûriyayê bingehên hukmê durist dabîn dike; [114]her wekî beşdarkirin, berpirsiyarî, çavdêrî û dadmendîya civakî, zelalîya zagonê, avakirina sazûmanî û nerîna stratejîk. Şerên nifşê çarem û pêncem ango şerê taybet xwe dispêre lawazkirin û sînordarkirina Rêveberîya Xweser da ku nikaribe siyaseta hukmê durist bimeşîne. Ev yek di siyaseta dijminane ya rêjîmên herêmê û Daişê de baş xuya ye. Jixwe me hinekî berî niha behsa diyardeyên vê dijminatîyê kiriye. Wate, her ku Rêveberîya Xweser berê xwe da hukmê durist, ew qasî ew ê bêtir karibe li hmber astengîyên cûr bi cûr raweste. Di encamê de, gerek e Rêveberîya Xweser hukmê durist weke dozeke sereke ji dozên ewlehî û berevanîyê bibîne, çimkî ew rêbazê herî bikêr e di zêdekriina bawerîya welatîyan bi Rêveberîya wan û bi vî awayî ew ê karibe hembêzên civakî yên ku Daiş wan ava dike, armanc bigire. Hikûmetên durist tenê dikarin li hember wan bi vî rêbazî rawestin

b) Bipêşxistina rêkarên riwangeh û çavdêrîyê da ku li hember şerên dane û şerên sîbranî were rawestandin:

Pêwîst e bêtir pere di vê biwarê de werin xerçkirin û teknelojîka pêwîst were dabînkirin. Piranîya lêkolînan amaje dikin ku Daiş di belavkirina propogendayên xwe de û di leşkerkirina endamên xwe û dana agahîyan ji bo pêkanîna operasyonan de xwe gelekî dispêre alavên pêwendîyê û malperên eleketronîk. Her wiha rêjîmên herêmî artêş ji ``mêşên eleketronîk`` [115]saz kirine da ku şerê derûnî li dijî herêmê bi kar bîne û Rêveberîya Xweser di navbera rexneyên ku xwe dispêrin azadîya nerînan û propogendaya ku li dijî wê tê meşandin de dudilî

[114] Peymangeha Karûbarên Ewlehîya Cîhanî û berevanîyê (IGSDA), nifşên şer, weke ku kolonêlê amerîkî Wîlyem Is Lînd pênase kiriye. Dîrok: 21. 11. 2020. Lînk: https://igsda.org?/أجيال-الحروب-كما-وضعها-الأمريكي-كولو/lang=ar

[115] mebest ji mêşên eleketronîk, hisabên teorî yên li ser malperên civakî ne ku bi rêya bernameyên taybet tên xebitandin û bi rêya wê hin weşan bi awayekî gelekî zêde tên weşandin û belavkirin; di wan de agahîyên ne giştî yan jî yên derew hene da ku rastîyan derw derxînin û nerîna giştî biguherin. Ji bo agahîyên zêdetir: Elî Sedî Ebdilzehre Cibêr. Bandora mêşên eleketronîk li ser nerîna gitşî. Weşanger: ferhenga giştî ya siyasî. Wê jî ji kovara Doz (qedaya) a girêdayî Fakulteya Zanistên Siyasî li Zanîngeha Nehrên, veguhestîye. Lînk: https://political-encyclopedia.org/library/1487/download

maye. Ji alîyekî din ve pêwîst e tektîkên ku bi rêya wan dikarin li hember şaneyên veşartî[116] rawestin, werin bipêşxstin. Nexasim ku her rêjîmek xwedî ejinde ye li bakur û rojhilatê Sûriyayê ku ew şaneyên veşartî yên taybet bi xwe dadimezrînin.

c) Diplomasîya tê meşandin were bipêşxistin û nema tenê xwe bispêre diplomasîya ku tê meşandin:

Gerek e kenalên pêwendîyê bi civakên ewropî, erebî û amerîkî re û bi zanîngeh û şaredarîyan re werin vekirin; nemaze ku her desteyek xwedî beşekî taybet bi têkilîyên diplomasî ye. Heya astekê van beşên diplomasî têkilîyên xwe li gor pêwîstiya xwe aktîv kirine. Hin têkilîyên dostanîyê bi çend şaredarîyên alamanî, îtalî û ji bilî wan re hene. Pêwîst e ev têkilî bêtir bi pêş bikevin û têkilî bi şaredarîne din re jî were çêkirin. Pêwîst e li ser jîngehê di têkilîyên diplomasî de were tekezkirin, nexasim ku jîngeh bingeha sereke ya Rêveberîya Xweser e. çalakîyeke jîngehî li gelek welatan heye, çimkî jîngeh ji dozên girêdayî ewlekarîya mirovî li derdora cîhanê ye. Ji ber wê jî gerek e têkilîyên diplomasî bi hemû tevger û çalakvanên di biwarê jîngehê de werin avakirin û rêkeftin bi wan re werin çêkirin, çimkî jîngeha me xizan e û pêwîstiya wê bi geşepêdanê heye. Karê ku di vê biwarê de tên kirin, negihaştine asta ku tê xwestin û tenê di çarçoveya semînerên teorî de sînorkirî mane.

d) Fêrkirin û rawestîna li  hember gotara kînê:

Ragihandin bi roleke girîng di vê babetê de dilîze. Her wiha gerek e birpirsên Rêveberîya Xweser pêwendîyeke domdar bi payebilindên civakî, çandî, siyasî û aborî re bikin û rastîya alozîyên ku em wan dijîn agahdarî nerîna giştî dikin û bi awayekî bêalî rexneya xwe bidin. Gerek e gel jî beşdarî çêkirina biryarê bibe; ew jî bi rêya meclisên wî yên hilbijartî û rapirsînên cihêreng bi rêya ragihandin û navendên lêkolînan. Her wiha gerek e mekanîzmeyên danûstandin û hevkarîyê di navbera komîn û sazîyan de werin bipêşxistin. Gerek e gilîyên pêşkêşkirî ji

---

[116] şaneyên veşartî: komek ji mirovan e ku bi awayekî nehênî hatiye damezirandin, di nav civakê de dihele û bi bêdengî dixebite; ew jî piştî ku ji alîyê raman û reftaran ve were amadekirin da ku bi gelek erkan rabe; ew jî li gor pilana ku jê re ji hêla birêveberîya wî ya rêxistinî ve hatîye danîn; her wekî komkirina agahîyan, kuştin, reşkujî…ji bo agahîyên zêdetir: Dr. Mensûr kurê Seîdê Qerenî. Şaneyên Veşartî çekeke tirsdar in. weşanger: Hevpeymana Islamî ya Leşkerî ya li dijî Terorê. Hejmara 6. Çile 2024, r6. Lînk: https://www.imctc.org/ar/eLibrary/TerrorismIssues/Pages/TerrorismIssues05.2.2024.aspx

hêla komînan ve û pêşinyarên ku ji hêla Hêzên Parastina Civakê ve tên pêşkêşkirin, werin lêkolînkirin; nexasim li herêmên gundewarî, çimkî ew xeta parastinê ya yekem in li hember şerên nifşê çarem û pêncem. Ji alîyekî din ve, gerek e Rêveberîya Xweser bêtir li hember gotara kînê raweste[117] û zagonên taybet pê derxe.

Di vê derbarê de pisporên birêveberirina berevanîyê di civaka demokratîk de[118] dibînin ku gefa herî dijwar a ku her welat dibe ku rastî were, ``tevlîhevbûn û wêranbûna têgihiştina civakî ya gelekî (gel bi hemû pêkhate û helwestên xwe). Ji ber dûrbûna vî gelî ji zanîn û zanista rastî û hizirînê, karînên afirandin ji alîyekî ve têk diçin û ji alîyê din ve gengeşe û nakokîya pûç û vala û parçebûna civakî pêk tê. Girîngtirîn rêbazên têkçûna têgihiştina civakî ew e dema ku ragihandina hikûmetê ya nedurist û ragihandina gendel û malperên civakî ji bo komkirin û birina nerîna giştî ber bi alîyê kîn û nakokîyê ve û ber bi başkirina hin sazîyan û nebaşkirina hinên din ve û ber bi qedirbilindkirina hin kesayetan ve û kesandina her tiştî bêyî ku tu guhî bidin helwest, rastî û rêbazên zanistî…``

e) Çareserkirina alozîyan bi awayekî teknoqratîk:

Gelek girîng e ku kesên pispor ji bo çareserkirina alozîyên cûr bi cûr (qirêjî, kêmbûna av, sûtemenî û nerejîyê, zehmetîya dabara jiyanê û ji bilî wan) werin erikdarkirin; ew jî li gor derfet û dahatên peyda û bi rêya komîte yan navendên lêkolînan an jî girûpên kar. Her wiha gerek e bi awayekî demkî û bi rêya girêbestan hin sazîyên xizmetguzarî ji bo beşa taybet werin kirêdan; her wekî beşa paqijî û avê.

---

117 stratejîk û pilansazîya karê NY der barê gotara kînê de, wisa pênase kiriye: ``…Her cûreyekî pêwendîyê ya devkî, nivîskî û zimanekî nerazîbûnê bi kar tîne êrîşî kesekî yan komekê li ser esasê nasnameyê dike. Bi gotineke din, li ser esasê ol, girêdana etnîkî yan zayendî yan jî nijadî yan jî reng yan jî êl an jî cûreyê civakî û yan jî faltorên din ên ku nasnameyê diyar dikin…``ji bo agahîyên zêdetir: Malpera NY, gotara kînê, lînk: https://www.un.org/ar/hate-speech/understanding-hate-speech/what-is-hate-speech

118 Peymangeha karûbarên ewlekarîya cîhanî û berevanîyê (ICSDA). Nifşên şer, weke ku kolonêlê amerîkî Wîlyem Is Lînd danîne, dîrok: 21. 11. 2020. Lînk: https://igsda.org/أجيال-الحروب-كما-وضعها-الأمريكي-كولو/?lang=ar

f) Gerek e li ser zagona qedexekirina malgiritinê were tekezkirin û çavdêrîya buhayê heyberan were kirin. Pêwîst e hevrêzî di navbera desteyên têkildar û civakê de bi rêya komîn û ragihandinê were kirin.

g) Gerek e bazirganîya hişbiran weke metirsîya Daiş were dîtin û dosyeya qirkirina terorê û ya qirkirina hişbiran bi hev ve werin girêdan. Wate, gerek e diyaedeya hişbiran weke çalakîyeke rêxistinkirî ya xwedî armancên siyasî were dîtin ne tenê weke bazirganiyeke ne rewa. Gerek e nerîna giştî serwextî vê rastîyê bibe.

h) Herêma bakur û rojhilatê Sûriyayê dikare bibe herêmeke biewleh ji bo hemû sûrîyan. Rêveberîya Xweser mîna bendavekê li hember komên tundrew e, loma her ku pişta wê were girtin, girtina rê li ber desteserîya komên tundrew li ser herêmê tê misogerkirin. Ev sedemek e ku rewşa siyasî ya bakur û rojhilatê Sûriyayê were pejirandin. Pêwîst e Rêveberîya Xweser hin guhertinan bike ku guncavî rewşa çareserîya alozîya Sûriyayê bin. Weke mînak, rêjîma tirkî dixwaze tawîzan pêşkêşî rêjîma sûrî bike da ku rê li ber levhatina di navbera Şam û Rêveberîyê de bigire û rêjîma tirkî bûye mîna bendekê di navbera pêwendîya di navbera bakurê rojavayê Sûriya û Rêveberîya Xweser de. Tecrubeya Rêveberîya Xweser tekez dike ku diplomasîya civakî ya bakur û rojhilatê Sûriyayê dikare bendên ku îdyolojîka tundrew di navbera civakên sûrî û civakên bakur û rojhilatê Sûriyayê de danîne, rake. Weke mînak, rê ji bo çînekê were dan ku li zanîngehên Rojava bixwînin û rêjeyek li nexweşxaneyên wê werin dermankirin û hin alîkarî, tîmên bijîşkî, av, sûtemenî… ji bo hin herêmên wêranbûyî werin şandin û hwd. Ev tişt dikarin pêk werin çimkî serokatîya gerînendeya Têkilîyên Derveyîn di Rêveberîya Xweser de ``Ilham Ehmed`` got ku dergehên herêmê ji bo hemû sûriyan vekirî ne û ev yek bi rêya hevrêzîya bi desteyên têkildar re pêk tê. Di heman çarçoveyê de fermandarê giştî yê HSDê Mezlûm Ebdê da diyarkirin ku ``ew amade ne ku hemû şêweyên piştgirî û alîkarîyê û pêşwazîyê pêşkêşî koçberên Idlib û herêmên bakur û rojavayê Sûriyayê bikin…``[119] û got ku ew ji bo diyalogê `` bi hemû alîyên niştumanî li Idlibê re û bi hemû hêzên niştumanî yên sûrî yên xemxurên yekîtiya xaka sûrî re, amade ne…``

119 SDF PRESS: Fermandarîya giştî ya hêzên me, civînekê bi artêşa şoreşger û lîwaya el-Şimal el-Dîmokratî re li dar dixe. Dîrok: 18. 9. 2024. Lînk: https://sdf-press.com/?p=43134

i) çareserkirina dosyeya perwerdeyê:

Parvebûnek di civakê de di navbera branşên rêjîm (ji ber ku danpêdan ji hêla rêxistinên navneteweyî pê heye) û biranşên Rêveberîya Xweser (ji ber ku xwe dispêre rêgeza demokrasîyê di perwerdeyê de lê danpêdaneke berfereh pê tune ye) heye. Jixwe biranşên rêjîma sûrî jî di asta herî jêrîn a nirxandinên cîhanî yên der barê biranşên perwerdeyê de ye. Ji bo çareserkirina vê kêşeyê, gerek e Rêveberîya Xweser stratejîkên xwe di perwerdeyê de bi pêş bixe û xwe di vê yekê de bispêre ramana demokrasîya perwerdeyê; çimkî ew di civakên pêşketî yên cîhanî de baş tê pejirandin.[120] Mebest jê jî ku biranşên perwerdeyê li herêmê ji hêla sîstema cîhanî ya perwerdeyê ve were pejirandin bêyî ku berovajî girêbesta civakî ya Rêveberîya Xweser be. Her wiha gerek e xebatên zêdetir werin kirin da ku li hember şerê derûnî yên ku bi ser beşa perwerdeyê de ji hêla rêjîmên desthilatdarîyê yên herêmî û Daişê ve tê kirin, werin kirin. Pêwîst e zanistên piratîkî weke binegeheke sereke ya stratejîka perwerdeya zanîngehê werin bikaranîn.

Metirsîya astengîyên ewlehî di aktîvbûna şaneyên veşartî bi sitembarîyên civakî û kêmbûna têgihiştina zanistî re ye. Bi giştî madem vîneke navneteweyî yan jî herêmî tune ye ku derfeta êrîşkirin û dagirkirina herêmê bi awayekî rasterast bide, dê sûd ji vê aktîvbûnê bi rêya rêbazê şerên çarem û pêncem were girtin da ku Rêveberîya Xweser were lawazkirin. Ji ber wê jî rêbazê herî hêsan ê rawestîna vê aktîvbûnê, şikandina vê hevrêzê ye. Pêşinyarên ku hatin gotin, dê karibin vê yekê pêk bînin; çimkî hukmê durist dê karibe kêşeyên civakî yên ji ber tunebûna dadwerîyê peyda dibin, çareser bike û dê nijadperestî çewsandin û xizanîya ku jîngeheke baş ji bo propogendaya tundrew peyda dikin, tune bike. Her wiha ew xwedî rolekê di zêdekirina têgihiştinê li hember gotara dîmogajî de ye ku olê yan jî nijadê di siyasetê de bi kar tîne. Ev tişt tev dikarin bandora van astengîyan kêm bikin. Mebest ji vê bexşanê ew e ku hukmê durist dê karibe alavên din ên navborî dabîn bike; her wekî xurtkirina riwangeh û çavdêrîyê, bipêşxistina diplomasîyê, zêdekirina têgihiştinê…

[120] ji bo agahîyên zêdetir der barê perwerdeya demokratîk û dîmokrasîya perwerdeyê li ba welatên rojavayî:
The European Democratic Education Community (EUDEC); Link: https://wiki.eudec.org/Aims
IDEC 2005 Resolution; Link: http://en.idec2005.org/data.dl/resolution_en.pdf
Julia Collins and Others; Democracy education; Link:
https://democracyeducationjournal.org/cgi/viewcontent.cgi?article=1432&context=home

**Dawî:**

Di sala 2024, sirûşta şer li Sûriyayê ji ber guhertina alîyên aktîv di alozîya sûrî de ji tektîkên xwe di birêvebirina nakokîyên xwe de, hat guhertin. Herêma bakur û rojhilatê Sûriyayê rastî rêbazên nekilasîkî yên şer hat; armanc ji wan rêbazan neçarkirina wê ku ew xwe radest bike. Ev yek jî dide diyarkirin ku ev herêm xwedî cihekî taybet e di stratejîkên hêzên desteser ên cîhanî û herêmê li Rojhilata Navîn. Di demeke ku tu stratejîkên êrîşkirinê li hember hêzên ku dixwazin wê têk bibin, Rêveberîya Xweser hewil dide helwesta xwe ya berevanîyê biparêze. Jixwe pêwîstiya vê helwestê jî bi pêşxistina rêbazan bi awayekî ku bi astengîyên heyî re bigunce, heye; çimkî ev astengî ji guhertina stratejîkê di helwesta hin dewletan de tên der û ji hewildanên Daiş ên berdewamkirina çalakîyên xwe û zêdebûna kêşeya karînên torên sûcan li Rojhilata Navîn û berdewamîya bandorên guhertina seqayê tên der. Ev bipêşxistina rêbazên Rêveberîyê bi rêya dariştina nêzîkatîyeke nû yan pêşketî di pêngavên xweparastina leşkerî, ewlekarî, siyasî û geşepêdanî pêk tên. Bi vî awayî rayedarên Rêveberîya Xweser dê katibin bi berpirsiyarîyeke mezintir bixebitin û stratejîkên nû û zelal ji bo rawestîna li hember rêjîmên desthilatê yên herêmî (bi taybet rêjîma tirkî û astengîyên din deynin.

Astengîyên ewlehî yên ku Rêveberîya Xweser rastî wan tê, bûne faktor ji bo astengkirina pêkanîna stratejîkên wê.  Dibe ku ew di rawestîna li hermber van astengîyan bidome. Dibe ku pêwîstîya wê bi guhertina nerîna xwe der barê nêzîkatîyên wê yên siyasî, ewlehî û aborî yên li hember dozên ewlehî û berevanîyê de hebe. Jixwe wê serkeftina xwe weke hêzeke nerim û navîn li Sûriya û herêmê tekez kiriye û ew bûye mîna faktoreke hedarî û aramîya ewlehîya herêmî û navneteweyî. Ev yek jî berovajî rêjîmên desthilatê yên herêmî yeku bûne jêdera alozîyên herêmê. Rêveberîya Xweser di rewşekê de hat damezirandin ku ne di hesabê hêzên desteserîyê yên herêmî û navneteweyî bû û wê karîbû di jîngeheke ewlehîyê ya aloz û tije metirsî de bimîne. Civaka kurdî, erebî, suryanî û tevahî pêkhateyên din stûna wê pêk anîne. Madem ev rêveberî cihê bawerîya van civakan e, ew ê bimîne loma gelekî pêwîst e ku rêgezên hukm û birêveberîya durist werin pêkanîn û xurtkirin û pêwîst e metirsîya gendelî û xemsarîya karmendî weke metirsîya Daişê, sûcên birêxistinkirî û enjindeyên rêjîmên herêmî yên tundrew were dîtin. Pêwîst e hemû pêşinyar di ber çavan re werin girtin. Tê pêşbînîkirin ku

rewş ber bi vê rêyê ve herin çimkî dozên ewlehî û berevanîyê li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyayê dozeke hebûnê ji bo Rêveberîya Xweser û tevahî sazî û desteyên wê yên siyasî, kargêrî, leşkerî, çandî û civakî tê hesibandin.

------------------------------------------------------

## Jêder û çavkanî:

### a) Lêkolîn û analîz:


1. *Dr. Eymen Ibrahîm el-Sûqî, xweparastina stratejîk a li Rojhilata Navîn. Weşanger: Kovara Siyasî ya Naveteweyî. Hejmar: 215, çileyê 2019, bergîna 54.*

2. *Cêms Siladin û hinên din. Stratejîka rûsî li Rojhilata Navîn, weşanger: sazîya Rand/2017. Lînk:*

*https://www.rand.org/content/dam/rand/pubs/perspectives/PE200/PE236/RAND_PE236z1.arabic.pdf*

3. *Ceneral Robêrt Simêt: Bikêrhatina şer: hunerên şer li cîhana hemdem. Wergêr: Mazin Cendelî. Çapa yekem 2008, weşanger: Sazîya Muhemed bin Raşid Al Mektûm û Mala Erebî ya zanistan (Naşirûn) Beyrût.*

4. *Zeyneb Husnî Izedîn. Bandora şerên nifşê çarem li ser ewlehîya neteweyî ya erebî, lêkolînkirina rewşê: Daiş. Weşanger: Navenda Denokratîk a erebî ya lêkolînên stratejîk, aborî û siyasî. Dîrok: 24. 7. 2016. Lînk: https://democraticac.de/?p=34525*

5. *Selîm Qesûm, alîyên nû di lêkolînên ewlehîyê de (lêkolînek di pêşketina têgeha ewlehîyê di têkilîyên navneteweyî de) weşanger: Navenda Îmarat a lêkolînên stratejîk-Ebû Zebî/Îmarat, bê hejmara çapê û dîroka weşanê.*

6. *Dr. Şadî Ebdilwehab Mensûr, şerên nifşê çarem: rêbazên teqandina ji hundir ve li qada Navneteweyî. Çapa yekem, 2019, weşanger: el-Erebî ya weşan û belavkirinê-Qahire.*

7. *Dr. Şehrezad Edmam, Bikerên tund ji bilî dewletan: Lêkolînek der barê çarçoveya têgihê û teorîyan. Weşanger: Kovara Siyasetên erebî- hejmar 8. Nîsana 2014. Lînk:*

*https://siyasatarabiya.dohainstitute.org/ar/issue008/Pages/Siyassat08-2014_Edmame.pdf*

6. *Ebdela Ocelan, Manefîsto şaristanîya demokratîk-bergîna pêncem (Doza kurdî û çareserîya neteweya demokratîk) wergêr: Zaxo Şiyar, çapa duyem 2014, bê weşanger.*

7. *Dr. Elî Hac Hesen, şerên nifşê pêncem, weşanger: Navenda el-Mearif a lêkolînên çandî. Dîroka weşanê: 9. 6. 2022. Lînk:*

*https://almaarefcs.org/4749/339*

8. *Mihemed Hisên Heykel: Girêkên derûnî yên ku Rojhilata Navîn kontrol dikin. Çapa yekem- nîsana 1958,weşanger:  Beşgeha el-Erebîye ya çap û weşanê-Qahire.*

9. *Karil Fon Kilawizfîtiz, der barê şer de, wergêr: Selîm Şakir el-Îmamî, çapa yekem 1997. Weşanger: Sazîya el-Erebîye ya lêkolîn û weşanê, Beyrût.*

10. *Komîteya Lêkolînên zanistên civakî li Akademîya Civaka Demokratîk, şerê taybet û bikaranînên wî. Çapa yekem, çile 2017, weşanger: Komîteya Lêkolînên Zanista Civakî-Qamişlo.*

11. *Peymangeha Karûbarên Ewlehîya CÎhanî û Berevanîyê (IGSDA) nifşên şer, weke ku kolonêlê amerîkî Wilyem Is Lînd danîne, dîrok: 21. 11. 2020 lînk:* *https://igsda.org/أجيال-الحروب-كما-وضعها-الأمريكي-كولو/?lang=ar*

12. *Dr. Mensûr bin Seîd el-Qerenî, şaneyên veşartî çekine bitirs in. weşanger: Hevpeymana Islamî ya Leşkerî ya Şerê Terorê. Hejmar 6, ji weşanên Doza Terorê-çile 2024. Lînk:* *https://www.imctc.org/ar/eLibrary/TerrorismIssues/Pages/TerrorismIssues05.2.2024.aspx*

## b) Hevdîtin:

1. *Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk (NRLS): Hevdîtin bi birêz Ilham Ehmed re (hevseroka Gerînendeya Têkilîyên Derveyîn di Rêveberîya Xweser a bakur û rojhilatê Sûriyayê de). Dîroka hevdîtinê: 13. 9. 2024.*

*2. Bera Sebrî, geşta bakur û rojhilatê Sûriyayê: Diyalogeke taybet bi fermandarê giştî yê HSDê Mezlûm Ebdê. Weşanger: Peymangeha Waşinton a siyasetên Rojhilata Nêz, dîroka weşanê: 6. 1. 2022. Lînk:*

*https://www.washingtoninstitute.org/ar/policy-analysis/rhlt-shmal-shrq-swrya-hwar-khas-m-qayd-qwat-swrya-aldymqratyt-aljnral-mzlwm-bdy*

*3. Nivîsgeha Rahihandinê ya herêmî li Dubey/Wezareta Derve ya Amerîkî: puxteke taybet der barê erkê têkbirina Daişê de. Weşanger: Balyoza Amerîkayê li Sûriyayê. Dîrok: 28. 2. 2023. Lînk:*

*https://sy.usembassy.gov/ar/إيجاز-خاص-حول-مهمة-هزيمة-داعش/*

*4. El-Hedes: hevdîtineke taybet bi fermandarê giştî yê HSDê Mezlûm Ebdê re, weşanger: Malpera el-Erebîye el-Hedes. Dîroka weşanê: 28. 12. 2023. Lînk: https://youtu.be/2vd3hVA_aXU*


## c) Ferheng û ferhengên fireh:


*1. Bol Robinson, ferhenga Ewlehîya Navneteweyî, çapa yekem 2019, wergêr û weşan: Navenda Îmarat a Lêkolînên stratejîk-Ebû Zebî.*

*2. Ferhenga ``First``…jîngeha veberhênanê çi ye? Lînk:https://www.firstbankeg.com/16636*

*3. Ferhenga el-Meanî el-Cami, berevanî; lînk: https://www.almaany.com/ar/dict/ar-ar?/دفاع/*

*4. Minal Cerûd, têgeha hukmê durist -The concept of good governance, weşnager: Ferhenga Siyasî, dîrok: 31. 5. 2022. Lînk:*

*5. 2022.05.31 :الرابط؛ https://political-encyclopedia.org/dictionary/مفهوم%20الحكم%20الراشد*

*6. Ferhenga zanist û teknîkan, jîngeh (wêranbûn) weşanger: ferhenga el-Erbîye. Lînk:*

*https://arab-ency.com.sy/tech/details/773/6*

*7. Ferhenga Siyasî, ji kovara Dozên ku ji Fakulteya Zanistên Siyasî li Zanîngeha el-Nehreyn Derketî. Lînk: https://political-encyclopedia.org/library/1487/download*

*8. Wîkîpîdya-Ferhenga el-Hure.*

## d) Malperên rêxistinên mafên mirovan:

*1. Sûriyên ji bo rastî û dadwerîyê, 158 rêxistinên sûrî armancgirtina tirkî ji avahîyên bajarên bakur û rojhilatê Sûriyayê şermezar dikin, dîrok; 28.12. 2023. Lînk: https://stj-sy.org/ar/158/منظمة-سورية-تدين-الاستهداف-التركي-لل-*

*2. Rêxistina Lêborîna Navneteweyî, Sûriya: Mirineke komî, êşkence û binpêkirinên din li dijî girtîyan ku ew piştî têkçûna Daişê hatin girtin. Raporeke nû, dîrok: 17. 4. 2024. Lînk: https://www.amnesty.org/ar/latest/news/2024/04/syria-mass-death-torture-and-other-violations-against-people-detained-in-aftermath-of-islamic-state-defeat-new-report/*

*3. Riwangeha Sûrî ya Mafê Mirovan: bi tewana hewildana derbasbûna di xaka tirkî de…girûpeke girêdayî Tirkiya 5 kesan di herêma ``Kanîya Aştiyê`` de digire. Dîrok: 16. 5. 2024. Lînk: https://www.syriahr.com/بتهمة-محاولة-دخول-الأراضي-التركية-فصي/714161/*

*4. Navenda Belgekirina Binpêkirinan, dosyeke taybet: Agahî û navên fermandar û çekdarên Daişê yên ku heya niha di refên girûpên girêdayî Tirkiyeyê de li bakurê Sûriyayê şer dikin. Dîrok: 19. 8. 2024. Lînk: https://vdc-nsy.com/archives/27336*

*5. Hibe Ziyadîn, topbarana tirkî xerabîyê li bakur û rojhilatê Sûriyayê belav dike. Weşanger: Human Rights Watch, dîroka weşanê: 4. 8. 2024, Lînk:*

*https://www.hrw.org/ar/news/2024/02/09/turkiyes-strikes-wreak-havoc-northeast-syria*

## e) Malperên sazîyan:

*1. Komek raporên ku Rêveberîya Xweser li ser malpera xwe ya fermî ji kanûna pêşîn 2023yan ve û heya îlona 2024an weşandine.*

*2. Malpera NY: Komîteya NY hişyarî ji zêdebûna rageşîya şer li Sûriyayê dide, nexasim di rewşke ku alozîya mirovî zêde dibe û cûreyên sûcên şer û tirsa ji nakokîyeke herêmî ya berfereh zêde dibin. Dîrok: 10. 9. 2024. Lînk:*

*https://www.ohchr.org/ar/press-releases/2024/09/un-commission-warns-syrian-war-intensifying-amid-continuing-patterns-war*

*Gotara Kînê, lînk: https://www.un.org/ar/hate-speech/understanding-hate-speech/what-is-hate-speech*

*3. Baylozxaneya amerîkî li Sûriyayê, puxteyeke taybet der barê têkçûna Daişê, dîroka weşanê: 28. 2. 2023. Lînk:https://sy.usembassy.gov/ar/إيجاز-خاص-حول-مهمة-هزيمة-داعش/*

*4. Malpera fermî ya Hêzên Ewlekarîya Hundirîn-Bakur û Rojhilatê Sûriyayê; Daxuyanîye gongira taybet bi çalakîyên roja cîhanî ya qirkirina hişbiran. Weşanger: Malpera fermî ya Hêzên Ewlekarîya Hundirîn-Bakur û Rojhilatê Sûriyayê, dîrok: 26. 6. 2024. Lînk: https://asayish.com/?p=12342*

*Girtina şaneyên Daişê di kampa Holê de û rawestandina pêngaveke wan a metirsîdar a ku hindik mabû pêk were. Dîrok: 24. 4. 2024. Lînk: https://asayish.com/?p=11662*

*Girtina heft kesan ku êrîşa çekdar û şelandin li gundewarên Hesekê kirine. Dîrok: 14. 6. 2024. Lînk: https://asayish.com/?p=12307*

*Girtina endamên Daişê ku bacan ji welatîyên gundewarên Dêra Zorê distînin, dîrok: 21. 9. 2024. Lînk: https://asayish.com/?p=13176*

*Pêngaveke cuda ya Dezgeha Ewlekarîya Giştî di girtina mîrekî navdar ê Daişê li gundewarên Dêra Zorê girt. Dîrok: 14. 7. 2024. Lînk: https://asayish.com/?p=12566*

*5. Meclisa Gelên Demokratîk, Zagona budceya giştî a sala darayî 2024, hejmar 7, dîrok: 9. 6. 2024. Lînk: https://smne-syria.com/gc/archives/3098*

*6. CENTCOMArabic; 03.09.2024; Link:*

*https://x.com/CENTCOMArabic/status/1830743843001582030?ref_src=twsrc%5Egoogle%7Ctwcamp%5Eserp%7Ctwgr%5Etweet*

**f) Malperên nûçeyan:**

*1. Navenda Ragihandina HSD (SDF PRESS):*

*Encama komkujîyên rêjîmê li gundên Dehle û Cideydet Begar, dîrok: 9. 8. 2024. lînK:*

*https://sdf-press.com/?p=42808*

*Hêzên Meclisa Dêra Zorê ya Leşkerî,tola şehîdên komkujîya Dehle û Cideydet Begar hiltîne. Dîrok: 12. 8. 2024. Lînk:*

*https://sdf-press.com/?p=42853*

*Encama pêngava ewlehîyê ya li dijî Daişê di nîva yekem a sala 2024. Dîrok: 4. 7. 2024. Lînk;*

*https://sdf-press.com/?p=42544*

*Hêzên Me şaneyeke Daişê li Reqayê ji hev dixe ku wê şaneyê sehrîcên dabînkirina sûtemenîyan armanc digirtin. Dîrok: 17. 8. 2024. Lînk:*

*https://sdf-press.com/?p=42864*

*Encamnameya qonaxa sêyem a pêngava ``Mirovahî û ewlehî`` li kampa Holê. Dîrok: 6. 2. 2024. Lînk:*

*https://sdf-press.com/?p=41602*

*Encama pêngavên ewlehîyê yên li dijî Daişê di nîva yekem a sala 2024. Dîrok: 4. 7. 2024. Lînk:*

*https://sdf-press.com/?p=42544*

*Fermandarîya giştî  ya hêzên me civîneke bi artêşa şoreşger û lîwaya El-Şimal el-Dîmokratî re li dar dixe. Dîrok: 18. 9. 2024. Lînk:*

*https://sdf-press.com/?p=43134*

*2. Ajansa Hewarê (ANHA):*

*Bi hejmar, binkeftîyên cotkarên bakur û rojhilatê Sûriyayê ji ber topbarana tirkî û çeteyên wê. Dîrok: 13. 6. 2024. Lînk:*

*https://hawarnews.com/ar/بالأرقام-خسائر-مزارعي-إقليم-شمال-وشرق-سوريا-جرّاء-القصف-التركي-ومرتزقته*

*hejmarên bitirs û beşên ku nema têra rewşên jehrîyê di nexweşxaneya Gel li Hesekê de nakin, dîrok: 13. 6. 2024. Lînk:*

*https://hawarnews.com/ar/أعداد-مخيفة-وأقسام-لا-تتسع-لحالات-التسمم-بمشفى-الشعب-في-الحسكة*

*xebatên zêde yên tenduristîya Minbicê ji bo rawestandina nexweşya Laşmanyayê, dîrok: 5.6.2024.Lînk:*

*https://hawarnews.com/ar /جهود-مكثفة-للصحة-في-منبج-لمكافحة-اللشمانيا*

*Herikîna avê di kenala Xabûrê de û îstegên avê dikevin xizmetê, dîrok: 1. 7. 2024. Lînk:*

*https://hawarnews.com/ar/تدفق-المياه-في-قناة-الخابور-ومحطات-المياه-تدخل-الخدمة*

*şaredarîya Amûdê, lêborîna xwe bi gavine berbiçav werdigerîne, dîrok: 26. 6. 2024. Lînk:*

*https://hawarnews.com/ar /عقب-الاعتذار-عن-التقصير-بدء-أعمال-نظافة-واسعة-في-مدينة-عامودا*

*3. Nors Pres:*

*Teysîr Mihemed; Mezlûm Ebdê: Em ji bo diyaloga bi tevahî hêzan re (di nav de Tirkiya jî) amade ne, dîro: 20. 7. 2024. Lînk: https://npasyria.com/189672/*

*Teysîr Mihemed: Bêçareyeke kombûyî û tu pilanên çareserkirinê tune ne…Ragihandineke dereng a budceya 2024 a Rêveberîya Xweser. Dîrok: 13. 6. 2024. Lînk: https://npasyria.com/187769/*

*Robîn Umer: Rêveberîya Xweser Hesekê weke herêmeke wêranbûyî ji ber qutkirina Tirkiye ji ava wê re, radigihîne. Dîrok: 3. 7. 2024. Lînk: https://npasyria.com/187769/*

*Mihemed Qadî: Rêveberîya Xweser 50 kesî ji malbatên Daişê radestî şandeya Komara Tacîkistanê dike. Dîrok: 25. 4. 2024. Lînk: https://npasyria.com/184871/*

*5. Ajansa Anadolê:*

*Kan Bozdoxan: Nimêjkerên tirk li 90 hezar mizgeftê ji bo serkeftina artêşa wan li Şaxê Zeytûnê lava dikin. Dîrok: 21. 1. 2018. Lînk:*

*https://www.aa.com.tr/ar/تركيا/المصلون-الأتراك-في-90-ألف-مسجد-يدعون-لنصرة-جيشهم-في-غصن-الزيتون/1037339*

*Mizgeftên Tirkiye û hin welatên din bi lava û xwendina Quranê tije bûne da ku hêzên ``Kanîya Aştîyê`` bi ser bikevin. Dîrok: 10. 10. 2019. Lînk:*

*https://www.aa.com.tr/ar/السياسة/مساجد-تركيا-وبلدان-أخرى-تصدح-بالأدعية-وتلاوة-القرآن-نصرة-لقوات-نبع-السلام/1608482/*

*6. Tirkiya Niha: Hûrgulîyên nû der barê bûyera derçûna leşkerî li Tirkiyayê, dîrok: 12. 9. 2024. Lînk:*

*https://www.turkeyalaan.net/2024/09/12/تفاصيل-جديدة-حول-حادثة-تخرج-الأكاديمي/*

*7. Tirk Pres: Necil Erbekan tekez dike ku gerek e sûrî vegerin welatê xwe, dîrok: 27. 6. 2024. Lînk: https://www.turkpress.co/node/101984*

*8. TRT Erebî: Erdogan: Hin hene ku dixwazin pêleke kînê biafirînin…dîroka me bi kirêtîyê nehatîye îmzekirin. Dîrok: 13. 9. 2024. Lînk:*

*https://www.trtarabi.com/now/أردوغان-هناك-من-يحاول-خلق-موجة-كراهية-وتاريخنا-لم-يتلطخ-بوصمة-الاستعمار-18207574*

*9. Malpera Hure:*

*``Çengkirina şêran`` rêveberîyeke daişî ya navdar dorpêç dike…hûrgulîyên pêngava Enbarê. Dîrok: 13. 9. 2024. Lînk:*

*Ehmed Minim û Mehmûd el-Waqi: Sûriya…paytexta Pintakonê, bê dîroka weşanê, lînk:*

*https://www.alhurra.com/shorthand-story/161سوريا-عاصمة-الكبتاغون/*

*Diya Ode: Piştî derbeya Mekî…çi ji ``Heres el-Dîn`` li Sûriyayê ma? Dîrok: 26. 8. 2024. Lînk:*

*https://www.alhurra.com/syria/2024/08/26/ضربة-المكي-بقي-لـحراس-الدين-في-سوريا؟*

*10. Rêşard Foks: Bandorên ``Şaxê Zaytûnê`` digihêjin mizgeftên Almanyayê. Weşanger: DW, dîrok: 26. 1. 2018. Lînk:*

*https://www.dw.com/ar/تداعيات-غصن-الزيتون-تصل-لمساجد-ألمانيا/a-42326838*

*11. Rûsiya Îro: Zaxarova der barê danûstandinên rêjîma Kêfê bi terorîstên sûrî re diaxive. Dîrok: 10. 9. 2024. Lînk:*

*https://arabic.rt.com/world/1599280-زاخاروفا-تعلق-على-مفاوضات-نظام-كييف-مع-الإرهابيين-في-سوريا/*

*12. Samir Ebû Werde: Zevîyên betrolê li Sûriyayê… hiladîya gelek û hilberîna hindik. Weşanger: Malpera Enerjîyê, dîrok: 20. 1. 2024. Lînk:*

*https://attaqa.net/2024/01/20/حقول-النفط-في-سوريا-احتياطيات-واعدة-وإ/*

*13. Spotnîk erebî; Pêşewayê partîyekê di perlemana tirkî de doz dike ku hêz ji welatê wî ber bi Xezayê ve herin. Dîrok: 2. 11. 2023. Lînk:*

*https://sarabic.ae/20231102/زعيم-حزب-في-البرلمان-التركي-يدعو-لإرسال-قوات-من-بلاده-إلى-غزة-1082730189.html*

*Malpera el-Alem: Mizgeftên Tirkiyayê beşdarî êrîşa bi ser Efrînê de dibin. Dîrok: 22. 1. 2018. Lînk: https://www.alalam.ir/news/3307086/جوامع-تركيا-تشارك-في-الهجوم-على-عفرين*

*14. Nibal Ibrahîm: êl û eşîrên ereban li Sûriya û welatên ereban, dîdara êlan li Humsê li dar dixin: Em ê hebûna hêzên dagirkerîyê li ser xaka xwe nepejirînin. Weşanger: Rojnameya el-Bas. Dîrok: 14. 9. 2024. Lînk: https://newspaper.albaathmedia.sy/2024/09/14/العشائر-والقبائل-العربية-في-سورية-وال*

*15. Hişam el-Xenam: Destê Bintakonê hat şikandin. Çawa Sûriya vê hişbirê ji bo mebesta fişara siyasî bi kar tîne. Weşanger: Navenda Malkom Kîr-Karnîgî ya Rohilata Navîn. Dîrok: 7. 8. 2024. Lînk: https://carnegieendowment.org/research/2024/07/border-traffic-how-syria-uses-captagon-to-gain-leverage-over-saudi-arabia?lang=ar&center=middle-east*

*16. Menbera Berevanîya Afrîkî: Piranîya êrîşên Daişê welatên afrîkî armanc digirin. Weşanger: Africa Defense Forum. Dîrok: 16. 7. 2024. lînK*

*17. https://adf-magazine.com/ar/2024/07/غالبية-هجمات-داعش-تستهدف-البلدان-الإف*

## g) Malper, lêkolîn û raporên ingilîzî:

*1. Ben Hubbard and Safak Timur; He Warned Turkey About Earthquakes. Now He Fears for Istanbul; Posted:06.10.2023; Link: https://www.nytimes.com/2023/10/06/world/europe/turkey-earthquakes-naci-gorur.html*

*2. Cambridge; defense; Link: https://dictionary.cambridge.org/dictionary/english/defense*

*3. The Economist; Is Syria's drug-dealing dictator coming in from the cold?; Posted: 11.09.2024; Link:*

*https://www.economist.com/middle-east-and-africa/2024/09/11/is-syrias-drug-dealing-dictator-coming-in-from-the-cold*

*4. The European Democratic Education Community (EUDEC); Link: https://wiki.eudec.org/Aims*

*IDEC 2005 Resolution; Link: http://en.idec2005.org/data.dl/resolution_en.pdf*

*5. Julia Collins and Others; Democracy education; Link:*

*https://democracyeducationjournal.org/cgi/viewcontent.cgi?article=1432&context=home*

*6. Reuters; Turkey's Erdogan calls for Islamic alliance against Israel; Posted: 07.09.2024; Link:*

*https://www.reuters.com/world/middle-east/turkeys-erdogan-calls-islamic-alliance-against-israel-2024-09-07/*

*7. Satbyul Estella Kim and Others; Positive Association of Aggression with Ambient Temperature; Published: National Library of Medicine; Published online 2023 Jun 30; Link:*

*https://www.ncbi.nlm.nih.gov/pmc/articles/PMC10303254/*

*8. Syria INGO Regional Forum; Escalation of Hostilities in Northeast Syria, January 16th 2024; Posted: 17 Jan 2024; Link: https://reliefweb.int/report/syrian-arab-republic/escalation-hostilities-northeast-syria-january-16th-2024*

*9. World Meteorological Organization; July sets new temperature records; 13 August 2024; Link:*

*https://wmo.int/media/news/july-sets-new-temperature-records*

# EWLEKARÎYA XWARINÊ LI BAKUR Û ROJHILATÊ SÛRIYÊ

**D. Murşid Yûsif**

**pêşgotin:**

Ewlekarîya xwarinê pêwîstiyeke stratîjîk a jiyanê ye û jiyana kes û koman bêyî xwarinê nikare berdewam be, jixwe astên herî kêm ên ewlekarîya xwarinê yek ji rehendên herî sereke ne yên ku jiyana mirovan li ser hatiye avakirin, tê dîtin.

Qeyranên aborî yên mezin bi awayê birçîbûnên li deverên curbecur ên cîhanê di dîroka kevnar, nûjen û hevdem de hatine dîtin, nemaze li parzemîna Afrîka û beşek ji parzemîna Asyayê. Jixwe hinek welat hene ku îro nikarin xwarinê di asta herî kêm de ji welatiyên xwe re dabîn bikin.

Materyalên sereke yên dabînkirina ewlekarîya xwarinê ya cîhanê, Genim, Garis, Ceh, Nok, Nîsk û Fûl... HWD ye.

Li gorî nexşeya çandiniyê; Di hilberîna genim de Çîn di asta yekem de ye (131 mîlyon ton), li dû wê Hindistan, paşê Rûsya, paşê Amerîka, Kanada, Fransa û Ukrayna tên.

Di hinardekirina genim de Rûsya (37 milyon ton) di asta yekem de ye, piştî wê Amerîka paşê Ukrayna bi 8 milyon ton di rêza pêncemîn de ne.

Lewra; krîza Rûsya û Ûkraynayê di peydakirina genim de tevlihevîyek peyda kiriye. Jixwe vê yekê jî li nirx û ewlekarîya xwarinê li piraniya welatên cîhanê bandor kiriye. Ji aliyê din ve, Misir welatê herî mezin ê jiderveanîna genim e, li dû wê Endonesya... HWD.

Ewlekariya xwarinê di "Konferansa Navneteweyî ya Xwarin û Çandiniyê" de ku di sala 1943 de hate lidarxistin, wek " Her mirovek têra xwe û bi awayekî domdar xwarinê bi dest bixe" hate destnîşankirin.

Di sala 1986 de, Benka Cîhanî raporek bi sernavê: (Hejarî û birçîbûn) belav kir, ku tê de ewlekarîya xwarinê wiha da nasîn:

" Di hemî qeyranan de her kes ji bo jiyanek çalak û tendurist têra xwe xwarinê bi dest bixe."

**Beşa yekem:**

**Ewlekarîya xwarinê di dîrokê de:**

Pêvajoya derbasbûna mirovan ji berhevkirina giya û fêkiyên çolê ber bi çandiniya sîstematîk ve li bakurê Mezopotamya (Kurdistan) di Serdema Neolîtîk de xaleke dîrokî û şoreşeke şaristanî ya grîng bû, ku ev yek jî di cîhana kevnar de nîşaneya bandora mezin û guhertineke berfireh li ser asta ewlekariya xwarinê û qût e.

Agahiyên arkeolojîk diyar dikin ku kedîkirina cureyên şînatî û ajalan destpêkê li bakurê Mezopotamya (Kurdistan) pêk hatiye.

Prof. Childe Gordon yê awstralî got:

"Kurdan şaristaniya kevin ava kirin. Ew in yên destpêkê fêrî cotkirina xakê bûn û bi jinên xwe yên afirîner re biserketî bûn; Lewra jî çandiniyê li welatê wan dest pêkir."

Ev veguhertin guhertineke giring û şaristanî bû, ku civak ji jiyana tevger û koçeriyê veguherand jiyana aram, ne tenê ev; lê belê, awayê jiyana mirovatiyê ji kok de guherand, ew jî bi rêya çandina ên xwarinê li gel çalakiyên wek avdanî û berfirehkirina zeviyên çandiniyê, ku vê yekê jî rê da anîna xwarinên zêde, û di warê kedîkirina ajalan, çêkirina qafik û amûrên kevirî yên şahîkirî û xaniyên çargoşe de geşedanên din çêbûn. Van geşedanan, bi giştî, ji bo pergala navendî, û statûyên siyasî û îdyolociyên qoçî û pergalên zanînê bingeha siyasî û ramanî yên wek nivîsandin, wargeh, pisporî, dabeşkirina kar, têgeha xwedîtîyê, dabînkirina xwarinê û hwd, dabîn kirin.

Jixwe zanyaran Têgeha "Şoreşa çandinîyê" bo diyarkirina kûratî û berfirehiya guhertinê û giringiya encamên wê li ser dîroka û şaristaniya mirovahîyê bi giştî, bi kar aniye.

Ya rat ew e ku "Şoreşa çandiniyê" bi heman awayî li hemû herêman çênebû, lewra jî gelek şêwe bi xwe re anîn, jixwe herêma

Bakur û Rojhelatê Sûriyê (Beşek ji herêma Mîzopotamya jorîn û warê guhertinên neolotîkî ye) avakirin û biwarbûn lê hat dîtin, Genim û Ceh jî lê hat çandin, ajalên mîna Bizin, Çêlek, Xezal, Beraz û HWD lê hatin kedîkirin, jixwe şûnwarên derdora Ferat ta bi Xabûr û Diclê li Cezîra Jorîn, ev yek diyar kirin, li gel vê guhertina aborî jî guhertineke din a civakî ya kûr hebû, nîşaneya vê guhertinê jî huner û baweriyên ku di wênedîwar, xemil, amûr û peykerên mirov û ajalan ku nimêj û bawerîyên nû diyar kirin, mîna: Bawerîya dayika xwedawend, baweriay perestkirina bavûkalan û baweriya Gaperestiyê.

Her wiha pêşketineke teknîkî jî çêbû ku çekan ev yek diyar kir, nemeze serê tîran, alavên çandiniyê, dasik, bivir, destar û satil, qafik jî hatin vedîtin; di encama şoreşa dema kevirî de xwarin û ewlekarîya xwarinê li Mezopotamyayê zêde bû.

Her wiha hemî çîrokên dîrokî tekez dikin ku herêma Cizîr û Feratê ji ber zengînî û gencîneyên wan yên çandinî û ajalan, di serdema xelîfe Umer bin Elxetab de de bûn armancên desteserkirinên islamî

Her du dîronasan Elwaqidî û Elyaqûbî behsa rêjeya baca Cizîr û Feratî di serdema Muawiye bin Sufyan de sala 679 z. kierin, gotin:

"Baca Cizîr û Feratê ji ya Musilê bilindtir bû"

Ibin Hewqel got ku Nisêbîn bi tena xwe salane 1000 dînar pêşkêş dikir.

Jêderên Xiristyanî jî behsa wê yekê kirin ku xaka Cezîr û Feratê pir zengîn e û gencîneyên wê jî pir in.

Her wiha rahubê xiristyanî Elzoqînî (747z) di derbarê zengîniya xaka Cizîrê de got:

"Xaka Cizîrê pir zengîn e, zeviyên wê jî bi mêw û cureçandiniyên din jî zengîn in."

Lewra; ava zêde, gencîneyên xwezayî û cihê wê yê stratecîk ku di navbera rojhilat û Rojava de ye, hişt ku ew bibe armanca dagirkeran.

**Beşa duyem:**

**Têgeha "Ewlekarîya xwarinê" di dîroka nûjen û hevdem de:**

Bi avabûna civakên mirovî ên mezin re têgîna "Ewlekarîya xwarinê" pêş ket. Têgeha hilanîn, embarkirin û parastina di rewşên awarte û aloziyan de bi mebesta peydakirina xwarinê bi rêyên domdar û ewle, û gihîştina wan di dema pêwîs de, diyar bû.

Ev têgeh çend aliyan li xwe digre, ew jî: Têretijî ango; karîna hilberandina xwarinê bi awayekî ku xwestekên nişteciyan têr bike, misogerkirina ku her kes karibe xwarinê bi dest bixe, û pergaleke dabeşkirina bi bandor hebe, û şiyana rûbirûbûna qeyran, pirsgirêk, bobelatên xwezayî, qeyranên aborî û pevçûnan. .

Bi vî awayî; Ewlekarîya xwarinê beşeke sereke ya geşedana domdar û tendrustiya civakê ye, ev yek jî hevrêziyê di navbera ferwerî (hikûmet), rêxistinên navneteweyî, rêveberiyên xweser û civakên xwecihî de gerek dike.

Neteweyên Yekbûyî têgeha Ewlekarîya xwarinê di sala 1970 de bikar anî, ew jî ji ber belavbûna nakokî, birçîbûn,xwepîşandan, nerazîbûn, hejarî, bêkarî û piştguhkirinê li seranserî cîhanê. Ku ew yek jî bû dozeke giştî û pirsgirêkeke pir giring; ji ber ku dibe ev yek bibe sedema encamên xirab li ser aştiya navxweyî, tendrustiya giştî û geşepêdana civakî û aborî.

Ji ber giringiya ewlekarîya xwarinê di jiyana gelan de, ew di nakokiyên navxweyî û derve de wek çekekê hatiye bikar anîn, mîna dorpêça xwarinî û şerên birçîkirinê.

**Beşa sêyem:**

**Rewşa ewlekarîya xwarinê li Sûriyê:**

Berî krîzê, Sûriyê welatekî çandiniyê yê xwetêrker bû, û rêjeya %40 ji xelkên wê karê çandinî û xwedîkirina sewal û mirîşkan dikirin. Ev jêderên sereke yên dabînkirina ewlekarîya xwarinê, bi sedema şerê heyî, rastî ziyaneke mezin hatin; ew jî ji ber wêrankirina zeviyan, koçberkirina niştecîyan, dorpêçkirin, valakirina herêman ji niştecîyên wan yên resen û pêkanîna guhertina demografîk ya ji aliyên cûrbicûr ve bi awayekî armanckiriî û sîstematîk hat kirin, ji bilî hişkesalên

li pey hev; ku ev yek jî bû sedema kêmbûna anîna genimê, ku çar milyon ton dihat texmînkirin, û anîna genimê avdayî li Sûriyê ji 3 tonan daket 1700 tonî.

a Sûriyê ji genim di salên 2020-2021 de gihişt milyonek ton.

Guhertina avhewayê bi giştî yek ji wan sedeman bû ku kirîza ewlekarîya xwarinê li Sûriyê çêkir, bi taybetî di salên 2020-2021-2022

Wek tê zanîn, li Sûriyê nan çavkaniyeke sereke ya xwarinê ye, û gelek welatiyên Sûrî êdî nema dikarin nan ji bo malbatên xwe dabîn bikin, û nebûna nanê rojane, li Sûriyê bûye taybetmendiya hevbeş a jiyanê, ji xwe Sûriyê li ser herêmên ku şerê hev dikin hatiye dabeşkirin.

Sekreterê giştî yê Netewên Yekgirtî (Antonyo gutêriş) diyar kir ku pirsgirêka xwarinê li Sûriyê gihiştiye wê astê ku êdî nema dikare were çareserkirin, û da zanîn ku %90 ji xelkên Sûriyê di bin sînorê hejariyê de dijîn û %60 ji wan radsî tunebûna ewlekarîya xwarinê tên.

Raporên Netewên Yekgirtî diyar dikin ku 11.1 milyon kes li Sûriyê pêwîstiya wan bi alîkariyên mirovî heye, û nêzîkî 9.3 milyon kes tûşî bêewlekarîya giran a xwarinê tên; û di encama dirêjkirina dema pevçûnê de pêwîstiyên mirovî berdewam zêde dibin.

Li dawiyê, di sala 2020-2021 de, li herêmên rejîmê her malbatek kîsek nar jê re hate terxankirin, ango di rojê de kêmtir ji du nanan her kesekî re, jixwe tê zanîn ku ji bo gelek malbatan nan keresteya sereke ye.

**Beşa Çarem:**

**Rewşa Ewlehîya Xwarinê li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê:**

Ewlehîya xwarinê li herêmên Rêveberîya Xweser (ya ku berî alozîyê tûrik û jêdera xwarinê ya yekm a Sûrîyê ya darîya dexl û danan; bi taybet genim bû), hinekî ji hundirê sûrî cûdatir e, ew jî ji ber çend sedeman, yên giring ev in: Ji alîyekî rewşa aramîya baş di bin siha Rêveberîya Xweser a Demokratî de, ji alîyekî din ve jî, ji ber rewşa şer, pir ziyan negiha axên wê**.** Tevî wilo jî, darîya genim kêm bû, ew jî ji ber zuhabûn û kêbûna baranê, her wiha di salên borî de, şewtandina bimebest a ên çandiniyê ji hêla artêşa tirk û çeteyên wê an jî ji hêla hin alîyên hundirîn ên ku dixwazin vegerin herêmên Rêveberîya Xweser.

Jixwe rêbazên dorpêçkirin û birçîkirinê, ji rêbazên rûbirûbûna wan alîyan bi herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê, hizreke sereke ye.

Jixwe tevî êrîşên ku her demek û demkê li ser herêmên Rêveberîya Xweser a ku tûrika xwarinê ya Sûrîyê ye çêdibin jî, lê derfetên heyî dihêlin ku karibe pêwistîyên xwe bi dest bixe, ew jî bi jêderên gaz û petrolê, her wiha sûdwergirtina ji ava çemên Dîcle û Feratê û ava gol û bendavan, ji alîyekî dinm jî karîna berhînana xakên çandinîyê ku bi avên binerd tên avdan.

Di sala 2021 de, ewlehîya xwarinê li herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyê, kêm bû, ew jî bi sedema zuhabûn, astengîyên alîkarîyên xawrinê yên di rêya sînoran re, daketina nirxê lîreya sûrî ku hişt nirxên xwarinê bilind bibin ku ne li gorî karîna kirînê ya piranîya mirovan û kêmbûna darîya genimê avdayî û bejî. Jixwe ji bo kêmbûna darîya genim, hin sedemên din hebûn, ew jî ev in: Kiryarê êrîşkar ên Tirkîyê, weke girtina ava çemê Feratê û jikarderxistina ava Elok, vê jî hişt ku av li ser deverên Hesekê kêm bibe. Êdî di 2022 de, Tirkîyê av ji ser bajarê Hesekê bi giştî girt.

**Beşa Pîncem:**

**Astengîyên ku Rêveberîya Xweser dikşîne ji bo peydakirina ewlehîya xwarinê li Bakur û Rojhilatê Sûeîyê:**

Bê guman ewlehîya xwarinê ji pirsgirêk û astengîyên herî giring ên ku tên pêşberî gelek welatên cîhanê, bi taybet ên ku şer û astengîyan jiyan dikin, jixwe asta ewlekarîya xwarinê, karîna dewlet û rêveberîyan ji bo peydakirina pêdivîyên xwarinê yên têrker û tendurist ji mirovan re; dinimîne.

Jixwe herêma Bakur û Rojhilarê Sûrîyê (deverên Rêveberîya Xweser a Demokratî), yek ji herêmên ku di ware ewlehîya xwarinê de, astengîyên dijwar dikşîne, ew jî ji ber komeke karîgeran, ji wan jî ev in:

Guherînên avhewayê, kêmbaran, zuhabûn, nakokîyên hundirîn, jevketina aborî, hilweşîna binesazîyê, kêmbûna teknîka nûjen, bilindbûna rêjeya wermînê, ketina diravê, bilindbûna nirxê pertalên mezaxkirî, kêmbûna hewldanên teknîka çandinîyê, şewtandina rûberên berfireh ên ên çandinîyê, bilindbûna nirxê gubre, pêdivîyên darîya çandinîyê, tov, zindîkuj û wizeyê, ji ber

sedemên cûda kêmbûna daryîa rûbereke çandinîyê, rawistandina gelek çalakîyên çandinîyê û di werên havînê de sûdnewergirtina ji rûberên berfireh.

Her wiha bandora alozîya sûrî û encamên wê li ser herêmên Rêveberîya Xweser, roj bi roj dijwartir dibin ku çareyên piralî û pêşxerîyên afrîner, ji bo kêmkirina bandorên nerênî li ser jiyana mirovan, têne xwestin.

Çareyên Pêşkêşkirî:

- Hewldana rawestandina şer û çarekirina alozîyê, ji ber ku rewşa bêewlehî û nearamî, nahêlin tu hewldan ji bo ewlehîya xwarinê pêk were.
- Peydakirina piştgirîya dareyî û teknîkî ji bo pêşxistina xebata çandinî û pîşesazîyê û pirbûna berhînana di çalakîya çandinîyê de.
- Zanîna çandinîyê bibe jêhatî û çalakîyên ku li ser erdê pêk werin.
- Parastin û berevanîya jîngehê.
- parastina jêderên avê û bizanebûn xerçkirina wan.
- Amadekirina stratîcîyeke demdirêj ya ewlehîya xwarinê.
- Amadekirina bernameyên geşpêdanên xwearinê.
- Pabendîya bi pilana xwetêrkirinê, anku Rêveberî xwe bispêre derftên xwe ji bo peydakirina pêdivîyên welatîyan ji pertalên mezaxkirî re.

Êdî tevî ku herêmên Rêveberîya Xweser, dikevin sînorên deverên aramîya xwarinê, lê Rêveberî hewl dide ku ewlhîya xwarinê û xwetêrkirinê peyda bike, ew jî bi rêya pêşxistina xebata çandinîyê û handankirina çotkaran ku rêbazên herî baş ji bo pêşxistina pirojeyên wan ên çandinîyê bi kar bînin, êdî di heman demê de, ji bo misogerkirina ewlehîya xwarinê, pêwîst e li ser hin alîyên din bal were kişandin; weke siyaseta nirxan û piştgirîya nirxê gubreyan, jixwe ji vê giringtir jî, destpêkirina bernameya geşepêdana domdar û jîngeha îkolocî ya ewlehîya nxwarinê.

**Beşa Şeşem:**

**Geşepêdana Domdar û Jîngehe Îkokocî ji bo peydakirina Ewlehêya Xwarinê li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê:**

Geşepêdana domdar, têgeheke aborî, civakî û cîhanî ye, armanca wê başkirina rewşa jiyanî ya hemû endamên civakê û pêşxistina amûrên

hilberandinê, rêbaz û rêveberina wan bi awayên zanistî, êdî ji ber vê yekê di sala 2015 de, hemû welatên ku endamên NY ne, ji bo hilanîna xizanîyê û rewşên newekhevîyê kêm bibe, pabendî bi armancên geşepêdana domdar kirin.

Geşepêdana domdar, pêngaveke berdewam e ku mirov bingeh û amûra wê ye, ji ber vê yekê, divê kes, civak, ferwerî û rêveberî, jêderên heyî bi awayeke baş û bi rêbazine heyjihebûn, bibandor û biewle berhînan bikin, êdî divê pêngava geşepêdana domdar berdewam û pêşkeve, ew jî ji ber cûdabûn û pirbûna pêwîstîyên civakê, her wiha divê bi awayeke stratîcî û demdirêj be.

Jixwe geşepêdana domdar, bi wateya xwe ya birfireh, ew geşepêdana ku rehendên civakî û jîngehî-îkolocî ber çav digire, tevlî rehendên aborî, ew jî ji bo jêderên niştimanî bi rêbazeke nimûneyî were bikaranîn, ew jî bi armanca peydakirina pêwîstîyên kes û civakê.

Jixwe mirov ji bo serketina geşepêdana domdar, karîgereke sereke ye, bi taybet di civakên jevketî û xizan, ji ber vê yekê beşdarbûna sûdwergirtîyên ji pêngava geşepêdana domdar, mijareke jiyanî ye, lê divê em rola teknîka agahîyan ji bo pêkanîna geşepêdana domdar û pêywendîyan jibîr nekin.

**Geşepêdana domdar li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê**

Bê guman peydakirina jiyana xwarinê ya biewle ya ku Rêveberîya Xweser a Demokratî ya Bakur û Rojhilatê Sûrîyê, dê bi rêya geşepêdana domdar be, ew jî ya ku dê ji mirovan re derftên cih, kar, xwendin, trnuristî û hin raje û sazîyên giştî yên din, peyda bike, êdî di vê çarçûveê de, divê Rêveberî gelek pirojeyên stratîcî yên niştimanî amade bike û yasayên şaredarî û jîngehî-Îkolocî yên ji bo veguherîna ber bi geşepêdana dodar saz bike.

Jixwe jiyana îkolocî, yek ji hêmanên sereke yên geşepêdana dodar e, ji ber vê yekê divê Rêveberîya Xweser di her warî de, giringîyê bide vê mijarê, ew jî ji ber ku bandorên wê yên aborî, civakî, jîngehî û çandî li ser jiyana welatîyan hene, ew jî li ser van bingehan:

- Avakirina avahîyên jîngehî-Îkolocî, hewldana ku ji her kesî re û li gor bernameyeke hevtekûz ji bo peydakirina ava tedurist û paqij, rajeyên bingehîn were bidestxistin, peydakirina rajeyên karêz û paqijîya tendurist û destkarîya li avê û ji nû ve bikaranîna wê, ev yek jî bi rêya avakirina gundên rêyan tê bidestxistin, ew jî gundên nûjen in ku xanîyên wan li ser her du alîyên rê ji

destpêkê ta dawîya rê, dikevin ku her xanîyek xwedî bax û perçeyeke erd e ku çandina şînkatîyan û xwedîkirina lawirên kedîkirî.

Êdî di rewşa Cizîrê û Feratê de, avakirina gundên îkolocî yên mezin ji dêvla gundên biçûk ên belawela yên heyî yên ku mercên jiaya mirovî ya birûmet tê de peyda nabe, bi rastî ev jî dê çareyeke şoreşî û domdar be, jixwe pêwîstîya jiyana îkolocî her dem bi avê heye, êdî li deverên Cizîr û Feratê, rêbaza her baş a peydakirina av ê ew e ku du co werin kişandin; yek ji çemê Feratê ber bi Kobanê, Girêspî, Hesekê û Qamişloyê û ya din jî ji çemê Dîcleyê ber bi Tilkoçer, Tilhemîs û Şedadê, paşê li ser van her du coyan gundên îkolocî û bîrên irtîwazî, werin avakirin.

Êdî dema ku av ji van gundan re wer peydakirin, dê ji bo jiyaneke hevbeş û dodar, bibin nimûneyên herî baş.

Bê guman, gundên îkolocî weke civakeke xwezayî tên pênasekirin, ew jî ne ji vê roja ve çêbûne, lê belê bi hezarên salan, mirov (li Mozobotamyaya jorîn û jêrî) di civakine nêzxwezayî jiyan dikirin, jixwe gundê îkolocî, çareyeke herî baş ji pirsgirêkên dijwar ên di jiyana mirvan ya civakî, aborî û hwd de ne, li gor raporên NY li ser jîngha sala 2000 ku bêtirî 850 zanyar û hoste û 30 amojgehên jîngehî lê beşdar bûne; jiyana mirovan li ser erdê dê rastî bobelatên mezin bibe ku herêma me xaleka herî lawaz di nav de ye, êdî nema dibe ku ev pirsgirêk werin derengxistin, li gor vê jî, mirovên ku li gundên îkolocî jiyan dikin, hestê berpirsyarîyê li beramberî her kes û tiştî, dê ji yên din bêtir be, ew jî tevî ku ew ê rêzgirtinê ji gerrkên xwezayî re bigirin.

Jixwe mirov li gor rewş û derftên xwe yên aborî yên ku pêdivîyên wan yên sereke peyda dikin, xwe dispêrin pergalên jîngehî, lê ji ber sedemên cûda, bi awayyeke bisûd û domdar an jî bi tu awayî; pêdivîyên melyonên mirovan nayên peydakirin, li gor raporên fermî, milyar kes li cîhanê pirçî ne û milyar û nîv kes jî li herêmên kêmav jiyan dikin.

Êdî rêbaza baş ji bo ku em pêdivîyên welatîyan peyda bikin ew e ku em bi zanebûn pergalên xwe yên jîngehî bi rêve bibin û li gor pîvanên ku civakên pêşketî gihaştinê, ramanên nû derxînin.

Em dizanin ku rewşên heyî yên ku Sûrî tê re derbas dibe, ji bo peydakirina derftên aborî yên mezin ji bo em ber bi jîngeha îkolocî ve biçin, ne alîkar in, her wiha di rewşa niha de şaredarîyên herêmên Cizîr û Feratê, ji bo avakirina

civakên îkolocî li ser çemên Dîcle û Feratê, nikarin coyan vekin û avê ji wan bişînin, ji ber vê jî divê em baş bihizirin ku berbijêrkên gengaz bibiînin ku hêdî hêdî em ber bi jiyana jîngehî ve biçin.

Bi rastî, ji ber hin sedemên ku vir ne cihê wan e ku em bînin ziman, pîvanên jîngehî yên ferwerîyê, ne her dem li gor pêdivîyên welatîyan e, tişta ku ji mirovan re pêwîst e, rastbînîya ku bi rastî pê hest dikin, wek hewaya li derdora wan zelal û şîn be ku bi dûmana şegmanên erebeyan, gaza karboduoksîd, dûmana parzûnan û şewatkokên petrol, ne qirêj bin, ava çem, co û avdanê bi ava karêzan ne qirêj be, rê paqij bin, rewşa karêzan baş be, niûtecihgeh xweş be û hwd.

Êdî li ser vê bingehê, dibe ku stratîcîyên taybet werin sazkirin, ew jîê yên li ser dê çawa ber bi rastbînîya jîngehî ya ku li gor derfetên heyî, em hewl didin ku bigihênê, were veguhestin.

Li herêmên Cizîr û Feratê yên ku binesazîyên jîngehî lê tune ne, astengîyên dijwar li beramberî geşepêdana domdar û pêkanîna çareserîyên domdar ji binesazîya heyî û ya ji xwezaya li derdorê tê bi dest xistin, hene ku ber bi civaka jîngehî were veguhestin, êdî ne gengaz e ku ew astengî bi awayeke giştî werin naskirin ne ku em nas bikin ku sêyekên niştecihên Cizîr û Feratê, ji kêmbûna ava vexwarinê êşê dikşînin, bi taybet li herêmên ku li başûrî rêya navneteweyî (M4) dikevin ta baûşrê Hesekê, li alîyekî din gundên li vir û wir li hemû deverên Cizîrê û Feratê belawela ne, rêyên zivtkirî lê tune ne, êdî dema ku em çareya guncav ji pirsgirêka av û veguhestinê/çûnûhatinê, nebînin, ew jî ji sedemên giring ên niştecihbûna bajarvanî ya jîngehî li ser asta (civakî, aborî û jiyanî), ew jî ji bo girêdana hêman û navendên hilberandinê bi hev ve, ew jî bi rêya veguhestina kes, kelûpel, pertal, heyberên sereke, berhemên lawir û çandinîya û hwd; dê pêngava veguhestinê bi tu awayî ne gengaz e.

Di sala 2000 de min çend caran serdana bajarê Meyadîn ku girêdayî Dêrezorê ye kir, û min rêya ziftkirî ya li kêleka çemê Feratê yê mezin girt û ji bajarê Dêra Zorê dest pê kir, pişt re El-Eşara û El-Meyadîn, ta bajarê El-Bûkemal li ser sînorê Sûriyê-Iraqê. Wê demê, xaniyên li ser rê, çewlik û axurên ku ta çav dibîne, li her du aliyên rê belavbûn, bala min kişandin. Min li aliyê rastê dît ku di navbera riya zift û sînorê çemê Feratê de ne bihtir ji pêncsed metreyan e (bi dehan metre

kêm an jî zêde). Ji aliyekî din ve, min li milê çepê yê rê dît ku dûrahiya di navbera rêya giştî û xaka beyabanê ya bêxêr de di navbera derdora 500 - 3000 M ne.

Bi vî awayî, rêza xaniyan ya beramberî çem, bi qasî pêncsed metre fireh bû, û li aliyê din, rêza xaniyan ya beramberî çem bû, pêncsed heta sê hezar metre fireh bû, firehiya rê jî tevî sînorên wê jî derdora 30 metre bû. Firehî û rûbera xanûberên li ser rê li her du rêzaan, ji derdora bîst ta pêncî metreyan bû, rûbera xanûber û çewlikan jî ji hev cûda bû û derdora 1000 - 6000 metre çargoşe bû, min bala xwe dayê ku tevger û çalakiya mirovî, civakî, aborî, çandinî li ser vê rêzê di asta xwe ya herî bilind de bû, herwiha rê jî sedema danûstendina civakî, leza tevgerê û pêkvejiyana civakî xurt kir, û hevsengî jî di hemû warên jiyanê de peyda kir.

Tişta ez dixwazim bibêjim ew e ku li hemû herêmên Sûriyê û herêmên Cizîr û Feratê jî, jêrzemîna girêdayî riyên çûnûhatinê - ta astekê – peyada dibe. Xaniyên gundewarî û çewlikên îkolocîk li her du aliyên riyan dikarin werin avakirin (Avakirina xaniyên îkolocîk dikarin li her du aliyên riya navneteweyî yak u wek riya M4 tê naskirin, ya ku Tilkoçer ta bi Kobanî ku di Tiltemir re derbas dibe. Herwiha riya ku Dêrik, Tirbespî, Qamişlo, Hesekê, Şedadê ta bi Dêrazorê bi hev ve girêdide. Riya ku Qamişlo û Serêkaniyê bi hev ve girêdide û di Amûdê û Dirbêsiyê re derbas dibe. Riya ku Qamişlo û Tilhemîs bi hev ve girêdide. Riya ku Hesekê û Holê bi hev ve girêdide. Riya ku Hesekê û Amûdê, Hesekê û Dirbêsiyê, Hesekê û Tiltemir bi hev ve girêdide. Riya ku Girêsipî û Reqayê bi hev ve girêdide. Riya ku Reqa û Dêrazorê bi hev ve girêdide. Herwiha li her du aliyên Çemê Feratê ji sînorên Tirkiyê ta bi Reqa û Dêrazorê; bi vî awayî emê guhertineke mezin di jiyana nişteciyan de çêbikin, ev guhertina han şiyanên darayî yên mezin jê re nepêwîst in, tenê pêwîstiya wê bi dabînkirina toreyên avê heye ku ew yek jî bi riya kolana bîrên artiwazî li her du aliyên rê û dabînkirina toreyeke ekektrîkê ku li ser hêza rokê kar dike, pêk tê.

Di vî alî de, mijara herî giring ew e ku yasa û zogonên ku karê şaredariyan di vî warî de birêxistin dikin, werin sazkirin û derxistin.

Bê goman, herêma Mezopotamya ku herêma Bakur û Rojhelatê Sûriyê parçeyekî wê yê giring e, di warê şûnwar û dîrokê de dema ku Herî, dep û şaxên daran di avakirin û avahiyan de bikar anîn, gelek tişt ji dest dan û winda kirin. Eger pêşiyên me (Somer, kûtî û Hûrî - Mîtanî) di avakirina koşk, perestgeh,

zîgorat, xanî û dîwarên bajarên xwe de kevir bi kar anîba, dê îro di warê avkirinê de şaristaniyeke me ya herî binirx heba, herwiha dê şûnwarên me yên mayinde û herî mezin ku wek Ehramên kevirî yên Misrê jî heba.

Ya rastî ew e ku ta roja îro em nizanin sedema sereke ya ku hişt gelên mezopotamyayê, di ware avakirinê de, Heriyê li şûna keviran bi kar bînin, çi ye. Dibe ku tunebûna hejmareke baş ya kevirgehên nêzîk li herêma Someran sedema wê yekê be, lewra jî; Akadî, Babilî û Aşûrî – wek her car - li ser riya Someran çûn û avahiyên xwe ji heriyê çêkirin, tevî ku herêma Babil û aşûriyan bi kevirgehan jî zengîn e.

Li Bakur û Rojhelatê Sûriyê ji melyonên salan ve kevirgeh hene, lê tevî wê yekê jî xelkên deverê xaniyên xwe ji heriyê ava kirin, sedemên wê jî ji me re nediyar in, dibe ku hejarî yan jî nezanî sedema wê yekê be.

Bê goman, beşeke berfireh ji xaka Bakur û Rojhelatê Sûriyê deşt e, lê di nava wan deştan de jî çend çiya hene, mîna: Çiyayê Kizwana (Ebdilezîz)- Çiyayê Qereçox- Çiyayê Tilkoçek- Çiyayê Hawar – Çiyayê Kewkeb – Girê Cibisa - Girê kepez, herwiha gir kepez û helçûnên volkanî jî hene. Bi riya van çiyay û bilidahiyan xwezayê kevirên cûrbicûr dane herêmê, ku hinek ji wan keviran hişk in, mina kevirê Bazilt û Granîtê volkanî, ku jêdera wî Çiyayê Kewkeb yê nêzî bajarê Hesekê ye, herwiha çiyayê Qereçoxê ku nêzî bajarê Dêrikê ye, û bilindahiya Elhime û Kewkeb li ser riya Dirbêsiyê – Hesekê, û çiyayê Hawar li Reqayê ye, ku li hemberî kenara rastê ya Çemê Feratê ye. Herwiha ji wan keviran jî yên nerim in wek kevirên gêçî û xîzî ne, herwiha ji wan keviran yên di navbera her du cûreyan de ne, mîna kevirê Mermer, ev yek herêmê dike jêdereke sereke bo kevirên avakirinê, jixwe Çiyayê Homan (Kezwana - Ebvdilezîz) li herêma Cizîrê jêdereke sereke bo kevirên avakirinê ye.

Çiyayê Homan – Kizwana yan jî Ebdilwzîz (ku ew bixwe li ser navê şêx Ebdilezîzê Gêlanî ku yek ji efserên Selahedînê Eyûbî bû) ew çiya li milê bakur û başûrê bajatê Hesekê ye, 25 KM dûrî bajêr e, ew bixwe rêzeçiyayeke dirêjahiya wê 80 KM û firehiya 7 – 15 KM,

Di nava wê rêzeçiyayê de komek gir û kepezên ku bilindahiya wan jî cûrbicûr e hene, herwiha li wî çiyayî çend lutke jî hene ku giringtirîn lutke ev in: Merqeb Elî 920 M, Ricim Berzan 882 M, Işaret Elbedî 805M, ew rêzeçiya ta bi milê Rojava dirêj dike, rûbera wê ya giştî 840 KM çargoşe ye, axa wê gêçî ye ku koka wê axê

jî ji lata gêçî ye, gelek parçeyên wê gêçî ne, Çiya ji kevirên gêçî yên dolomîtîk pêk tê (kevirekî hişk, nezelal e, rengê wî spî ye, damarên spî yên geş li ser belav dibin, pirêcaran rengê damaran gewr e, ew bixwe baştirîn cure kevirê avahîsaziyê ye), Axa li herêma çiyê gêçê di nava xwe de dihewîn e; gêç jî heybereke xwezayî ye ku mirovên berê ew wek heriya seyandinê bikar anîne, herwiha Ji bo spîkirina xaniyan li şûna gêçê jî bikar anîne, ew di nava axê de bi awayê lat an jî parçeyên camî yên ku bi şewitandinê dibin gêç, tê dîtin.

Pirsa girîng ev e:

Çima niha li şûna avahiyên axî yên herivî û avahiyên betonî, berê xwe didin çêkirina avahiyên kevirî yên îkolojîk?

Bê guman; avahiya kevirî ji aliyê lêçûn û enerjiyê ve xwedî taybetmendiyên girîng ên ekolojîk ne, Li gorî lêkolîneke elmanî, avahiyên ku ji kevirên xwezayî hatine çêkirin xwedî sûdên mezin ên jîngehî ne; lêçûnên wan pir kêm in (nemaze piştî bilindbûna nirxê çîmento û hesin), û pêdiviya germkirina avahiyên kevirî di zivistanê de û hînikkirina  û sarkirina wan di havînê de kêmtir in,  ji bilî van taybetmendiyan, lêçûnên çakkirina xanî û avahîyên kevirî nîvê lêçûnên xanî û avahiyên ji çîmento, hesin û heyberên din hatine avakiriin. Her weha, karê derxistina keviran, birîn, çêkirin û xemilandina wan çavkaniya herî mezin a kar ji bo karkeran e û ji bo dahatan çavkaniyek baş e. Li Israîlê, beşa ku di keviran de kar dikin 1,200 kompaniyan li xwe digire, rêjeya wê 25% ji hilberîna pîşesaziya neteweyî ye, anku bi qasî 30 milyar dolar e.

Di sala 2014 de, Filistîniyên ku ji bo lsraîlê di karê keviran de dixebitin, di nav mezintirîn hilberînerên keviran ên cîhanê de di rêza diwazdemîn de cih girtin. Li gorî van hejmaran, em dikarin jê re nave "Petrola spî" an jî "zêrê spî" lê bikin.

Jixwe kevir kelûpela bingehîn û sereke a Felestînî ye ku pêwîstiya Îsraîliyan ji Felestîniyan bi wê heye, beşa herî mezin ji kevirên Felestînê ( zêdetir ji %70) di nav bazara Israîlî de cih digire. Eger em keviran di warê avakirinê de bikar bînin, hosta û karkerên li herêmê di warê avahiyê de kar dikin dê pisporiyên pîşeyî yên astbilind pêş bixin. Ya rast ew e ku dema em bibêjin ku avakerên Felestînî bajarên Heyfa, Yafa, Eka, Elxelîl, Quds û Beytlehem ava kirin, her wiha karkerên Felestî yên di warê keviran kar dikin piraniya bajarên Îsraîlê ava kirin, dê ew gotina me ne zêde be

**Beşa çandiniyê li Bakurê Rojhilatê Sûriyê li ser rêya geşepêdana domdar e:**

Beşa çandiniyê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî dikare li ser rêya geşepêdana domdar were danîn; ew jî bi rêya komek biryarên ku armanca wan ev e:

- Parastina û ragiriya avê.

- Handankirn û piştgiriya bikaranîna teknîk û alavên nûjen bo avdanê.

- Handan û piştgiriya hilberîna  û sebzeyan ku dibin sedema dabînkirina ewlekarîya xwarinê.

Bê guman; bandor encamên kirîza Sûriyê li ser ewlekarîya xwarinê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê li ser gelek astan tên dîtin. Lewra; pêwîste Rêveberiya Xweseriya Demokratîk berê hemû şiyanên xwe bide bidestxistina ewlekarîya xwarinê. Wê demê pêwîst e guhdan bi çend beşan were kirin, mîna: Aboriya gundewarî ku xwe dispêre çandiniyê her wiha xwedîkirina sewalan, û avakirina kargehên ku van an çêdikin, wek çêkirina xwarinên ku li ser bingeha hilberên çandiniyê yên wek neytebitî (makarona), hilberên qutîyan û hilberên şîremenî.

Aboriya gundewarî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi kêşeyên mezin re rûbirû ye, wek bingeha lawaz, herwiha gihiştina bazaran bi awayekî lawaz û sînordar, lewra; ji Rêveberiya Xweseriya Demokratîk tê xwestin ku xwe bispêre rêbazên çandiniyê yên nerm, herwiha  derbaskirina pêdiviyên çandiniyê hêsan bike, û astengiyên rêxistinî û gumrikî sivik bike; ew jî bi armanca cîbicîkirina plansaziyên stratejîk ên li ser bingeha amadekarî û şiyanên herêmî ava dibin.

**Rola projeyên biçûk di cibicîkirina ewlekariya xwarinê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê de:**

Projeyên biçûk û yên herî biçûk di cîbicîkirina ewlekarîya xwarinê û başkirina rêbazên jiyana birûmet de rolek pêşeng dilîzin.

Projeyên biçûk jî nirxekî zêde li aboriya welat zêde dikin û hêza kirînê ya çînên hejar piştgir dikin, Rêveberiya li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dikare projeyên biçûk ji bo pêşxistina aboriya malbatî, bi awayekî xurt bi kar bîne.

Jixwe ferwerî (Hikûmet) û rêveberî piştgiriya darayî didin kesên ku dixwazin projeyên xwe yên taybet bidin destpêkirin, nemaze jinên dilxwaz, ji bo wan bi

hêz bikin. Ezmûnê jî ew yek tekez kiriye ku malbatên jin semyaniya wan dikin bêtir ji projeyên herî biçûk sûd werdigirin.

**Encam**:

Riya bihêzkirina ewlekarîya xwarinê tije astengî ye, û bi derbasbûna demê re jî mijar gringtir dibe, û komek karîger û pîvan bandore li ser hilberîna çandiniyê dikin. Qebareya valahiya di warê xwarinê de li Bakur û Rojhilatê Sûriyê di van xalan de diyar dibe: Kêmbûna çavkaniyên avê, kêmbûna rûbera zeviyên avdayî, bilindbûna buhayê gubreyê, lawaziya teknîk û lêkolînên çandiniyê, lawaziya projeyan di warê çandiniyê de, lewra; Ji bo kêmkirina bandora wê pêwîst e destpêşxerî bên destpêkirin, mîna berdewamkirina pêşxistina lêkolînên çandiniyê yên ku dibin sedema bilindkirina asta hilberînê.

Herwiha; geşepêdan û pêşxistina gundewarên ku xizmetguzariyên wan yên binesazî, çavdêriya niştecîbûnê, civakî, tendirustî, perwerdeyî û xizmetguzariyên çandiniyê, nemaze xizmetguzariyên wan yên raberiya çandiniyê û parastinê lawaz in, daku li ser maseya bernameyên ewlekarîya xwarinê di dema niha de werin danîn, mijareke pêwîst e.

Li aliyê din; ji bo pêkanîna ewlekarîya xwarinê çavkaniyên me yên mîna xak, av, teknîk û darayî hene, herwiha pisporiya me jî heye, lê pêwîstiya van hemûyan bi çareserî û rêxistinkirinê ji bo pêşxistina bikaranîn û garantiya sûdjêgirtin û baş peywirandin wan, heye. Jixwe ev yek jî girêdayî hebûna vîn û daxwazê ye ku wek giringtirîn kilîta zanista geşepêdan û ewlekarîya xwarinê tê naskirin.

Li dawiyê: Derdê yekem û yê dawî ji bo mirovahiyê ewlekarîya xwarinê ye; jixwe her aliyê ku ewlekarîya xwarinê bidest bixe dê azadî û biryara xwe jî bidest bixe. Werzevan, cotkar û karkerên Bakur û Rojhelatê Sûriyê bi qasî karîna xwe bi erkê xwe radibin, ji xakê û bo xakê dijîn.

---------------------------------------------------------------

## Çavkanî:

1 – د. صالح البعاج -الأمن الغذائي – أبعاده ومحدداته وسبل تحقيقه.

2 – د. سالم توفيق - الأمن الغذائي العربي.

3 – محمد حافظ إسماعيل- أمن مصر القومي في عصر التحديات.

4 – سالم توفيق النجفي - الأمن الغذائي العربي.

5 – الدكتورة فوزية عربي – الزراعة العربية وتحديات الأمن الغذائي وحالة الجزائر.

6 – د. محمد السيد عبد السلام – الأمن الغذائي للوطن العربي.

7 - د. محمد السيد عبد السلام – التكنلوجيا الحديثة والتمية الزراعية في الوطن العربي.

8 – وهيبة زبيري – التهديدات البيئية وإشكالية بناء الأمن الغذائي.

9 – د. فتحي بيومي السيد حسن - الأمن الغذائي في الصين.

10 – صبحي قاسم – تحديات الأمن الغذائي العربي.

11 – د. رقية خلف حمد الجبوري – السياسات الزراعية وأثرها في الأمن الغذائي في بعض البلدان العربية.

12 – د. صلاح وزان - تنمية الزراعة العربية – الواقع والممكن.

13 – د. سالم توفيق - الأمن الغذائي العربي - مقاربات إلى صناعة الجوع.

14 – م. رائد حتر – أوضاع ومؤشرات الأمن الغذائي العربي.

15 – حسان قطنا – الأمن الغذائي في سوريا – مفاهيم ومؤشرات.

16 – د. محمد سلمان - مشكلة الأمن الغذائي في الجمهورية السورية وآفاق حلها.

17 – إشكالية الأمن الغذائي العربي – النموذج السوري.

18 –محمد جمال باروت - تحدي الأمن الغذائي – رؤية مشروع سوريا -2025.

19 – انعدام الأمن الغذائي في سوريا.

20 – مشكلة الأمن الغذائي في سوريا.

21 – المركز السوري لبحوث السياسات. الأمن الغذائي والنزاع في سوريا.

22 – أزمة المياه والأمن الغذائي في سوريا.

23 – بيتنا - تحديات وعوامل تمكين التعافي المبكر في الشمال السوري.

24 – د. فاطمة بكري – رابح حمدي باشا - الأمن الغذائي والتنمية المستدامة.

25 – حالة انعدام الأمن الغذائي في العالم – مكتبة نور.

26 – حسن عبد المطلب الأسرح - تفعيل دور المشروعات الاقتصادية المشتركة في تحقيق الأمن الغذائي العربي.

27 – عالم المعرفة - ملامح استراتيجيات الأمن الغذائي في الدول العربية

# Bipêşxistina pergalên çandinîyê li herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyê (weke bersiv li hember guhertina seqayê)

**(1 ji 2)**

**Naverok:**

- Serenav
- Naverok
- Pêşgotina lêkolînê
- Girîngiya lêkolînê û armancên wê û avahîsazîya lêkolînê
- Agahî der barê herêmê de
- Lêkolîna berhema genim
- Lêkolîna berhema ceh
- Lêkolîna berhema pembo
- Lêkolîna berhema garisê zer
- Lêkolîna berhema kemûnê
- Lêkolîna berhema bacanên sor
- Lêkolîna berhema zeytûnan
- Paşxaneyek der barê guhertina seqayê û bandora wê li çandinîyê
- Nirxandina pergalên çandinîyê yê niha û astengîyên girêdayî wê
- Stratîcîyên guncavbûna bi guhertina seqayê re li bakur û rojhilatê Sûrîyê
- Siyasetên niştimanî û navneteweyî û rola wan di piştgirîya Stratîcîyên guncavbûna bi guhertina seqayê re
- Lêkolîna hin rewş û tecrubeyên serkeftî yên herêm û welatên din
- Hilbijartina berhemên guncav yên ku dikarin bi guhertina seqaya Bakur û Rojhilatê Sûrîyê re biguncin
- Başkirina derbirîna xakê û taybetmendîyên wê
- Parastina avê li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyeyê
- Qewîtî û siyasetên pêşerojê yên bipêşxistina pergalên çandinîyê
- Analîza ``Swot`` a beşa çandinîyê
- Jêder û çavkanî

**Pêşgotina lêkolînê:**

Herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyê bi xaka xwe ya berhemdar, cihêrengîya xwe ya xaknîgarî (deşt, çiya, zozan, gelî, çem…) navdar e. Seqaya wê jî ya Deryaya Spî ye; havîna wê dijêr û zuha û bagerm û kêmhêm e û zivistana wê sar û pirbaran e û buhara wê sarogermo ye û bara wê rojinan heye û rojinan tune ye. Herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyê xwe bi awayekî sereke dispêre çandinîyê weke jêdereke dabara jîyanê û aborî. Xaka çandinîyê li ser rûbera hejmarek parêzgeh belavkirî ye (Heseke, Dêra Zorê, Minbic û ji bilî wan). Ew jêdereke sereke ya hilberandina genim, ceh û pembo ne. her wiha sewal jî li van herêman tên xwedîkirin û çalakîyên girêdayî hilberîna lawiran jî hene. Lê ji ber astengîyên dijwar ên ji ber guhertinên seqayê pêk tên û ji ber paşketina jîngehî, ev beşa byolojîk rastî astengîyên dijwar tê.

Ev guhertinên seqayê van guhetinan dihewînin; bilindbûna pileyên germahîyê, guhertina şêweyên barîna baranê, zêdebûna dijwarîya diyardeyên atmosferî (her wek zuhabûn û bagerên xîzê). Ev guhertinên seqayê ne tenê bandorê li berhemên çanidnîyê û hilberîna axê dikin, lê belê ew dahatên avê yên peyda kêm dikin. Ev jî dihêle fişara li ser pergalên avdanê yên kilasîkî zêde bibe. Her wiha şer û nakokîyên domdar li welêt bandorê li berhemaên çandinîyê dikin û rê li ber peydakirina piştgirîya pêwîst ji bo cotkaran digirin.

Bi zêdebûna van astengîyan re, pêwîstî bi bipêşxistina pergalên çandinîyê yên domdar û nerm heye da ku bi guhertinên seqayê yên niha û pêşerojê re biguncin. Pêwîstîya vê yekê jî bi guhertineke mezin a rêbazên hilberandina çandinîyê û bikaranîna dahatan heye da ku hilberîna çandinîyê baştir bibe û ewlekarîya tîmarî were dabînkirin. Îcar danûstandina bi guhertinên seqayê re ne tenê girêdayî başkirina teknîkên avdanê yan hilbijartina cûreyên berheman ên nû ye, lê belê gerek e ev dahatên xwezayî bi rêbazine nû werin birêvebirin û Stratîcîyên geşepêdanê yên ku armanc ji wan xurtkirina domdar a çandinîyê û nermbûna jîngehî ye, werin meşandin.

Yek ji astengîyên vê raporê yên herî mezin, cihêrengîya çandinîyê ya mezin li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê ye, çimkî zehmet e hermû hûrgulîyên wê werin dorpêçkirin; ew jî ji ber ku her herêmek xwedî taybetmendîyeke çandinî û xaknîgarî ya cuda ye; loma em hêvîdar in ku karibin di vê raporê de wêneyekî

zelal ê beşa çandinîyê li herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyê pêkêş bikin ku her kesê dixwaze di vê beşê de geşepêdanê bike, sûdê jê bigire.

Çandinî yek ji bingehên sereke yên aborî û ewlekarîya tîmarî li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê ye lê ev beş rastî hejmarek astengîyên nû tê. Sedema van astengîyan jî guhertina demografîk e. Ev yek gefan dixwe ku ew ê hedarîya aborî û tîmarî li herêmê tevlîhev bike. Ev herêma ku bi xaknîgarîya xwe û jîngeha xwe cihêreng e, rastî zêdebûna pileyên germahîyê, kêmbûna jêderên avê û guhertina pergala hatina baranê tê. Ev yek jî bandoreke mezin li hilberîna çandinîyê dike.

Di salên borî de, zuhabûn li herêmê zêde bû. Vê jî hişt qebareya rûberên çandinîyê û berhem kêm bibin. pergalên çandinîyê yên kilasîkî jî nikarin bi van guhertinên seqayê re biguncin. Loma pêwîstî bi pêşxistina Stratîcîyên çandinîyê yên nû û bikêr hebû.

Girîngîya lêkolînî ya vê mijarê di van xalan de tê xuyakirin:

- **Pêkanîna ewlekarîya tîmarî:** Civakên xwecihî xwe dispêrin çandinîyê weke jêderke sereke ya tîmar û dahatê.
- **Başkirina birêvebirina dahatên xwezayî:** Pêwîstîya guncavbûna bi guhertinên seqayî re bi başkirina birêvebirina av û axê heye.
- **Xurtkirina domdarbûnê:** Bipêşxistina Stratîcîyên çandinîyê yên domdar ku pişta karîna jîngehê û pergalên çandinîyê digire da ku karibin bi guhertinên seqayê re biguncin.

**Armancên lêkolînê:**

**Ev lêkolîn dixwaze armancên li jêr pêk bîne:**

- Rewşa herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyê lêkolîn bike (genim, ceh, garisên zer, kemûn, pembo, bacanên sor û zeytûn).
- Bandorên guhertina seqayê werin analîzkirin: Bandorên guhertina seqayê li ser çandinîya Bakur û Rojhilatê Sûrîyê bi rêya analîzkirina daneyên seqayê û berhemadana çandinîyê werin analîzkirin.
- Nirxandina pergalên çandinîyê yên heyî: Pergalên çandinîyê yên berbelac werin naskirin û astengîyên ku li hember guhertina seqayê rastî tên, werin diyarkirin.

- Bipêşxistina Stratîcîyên guncavbûnê: Stratejîk û qewîtî ji bo başkirina teknîkên çandinîyê, birêvebirina dahatên avî û bipêşxistina jêrzemîna çandinîyê werin pêşkêşkirin.
- Pêşkêşkirina siyasetên piştgirîyê: Siyasetên niştimanî û navneteweyî yên peyda werin pêşkêşkirin û qewîtî ji bo başkirina wan bi awayekî werin pêşkêşkirin ku bi astengîyên heyî re biguncin.

**Avahîsazîya lêkolînê:**

**Lêkolîn dê van mijarên li jêr bigire dest:**

- Rewşa herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyê lêkolîn bike (genim, ceh, garisên zer, kemûn, pembo, bacanên sor û zeytûn).
- Paşxaneyek der barê guhertina seqayê û bandora wê li ser çandinîyê pêşkêş bike.
- Pergalên çandinîyê yên heyî û astengîyên girêdayî wê pêşkêş bike.
- Stratîcîyên guncavbûna bi guhertinên seqayê re.
- Siyasetên niştimanî û navneteweyî û rola wan di piştgirîya Stratîcîyên guncavbûnê de.
- Lêkolîn û tecrubeyên serkeftî li herêmê û welatên din.
- Hilbijartina berhemên ku bi guhertina seqayê re li herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyê re diguncin.
- Başkirina hilberandina axê.
- Parastina avê li herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê
- Qewîtî û siyasetên pêşerojê.
- Analîza ``swot`` a beşa çandinîyê li herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê .

**Agahî der barê herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyê de:**

Herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyê bi xaka xwe ya berhemdar, cihêrengîya xwe ya xaknîgarî (deşt, çiya, zozan, gelî, çem…) navdar e. Seqaya wê jî ya Deryaya Spî ye; havîna wê dijêr û zuha û bagerm û kêmhêm e û zivistana wê sar û pirbaran e û buhara wê sarogermo ye û bara wê rojinan heye û rojinan tune ye.

Rûbera xaka ku bi kêrî çandinîyê tê û tê bikaranîn, nêzî du melyon û sê sed hezar hektarî ye. Ji vê rûberê nêzî 450 hezar hektar tê avdan, ji wan 450 hektarî vêca 250 jê bi ava bîran tê avdan û ya mayî bi ava çeman tê avdan. Her wiha rûbera zevîyên ku bi awayê reşandinê tên avdan, 30 hezar hektar e û 4 hezar hektar bi rêya dilopan tê avdan. Hejmara bîrên ku zevî bi wan tên avdan 48 hezar bîr e.

**Berhema genim:**



Herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyê rastî diyardeya zuhabûn, çolistanbûn û kêmbûna barîna baranê tê. Her ku diçe ev diyarde zêdetir dibe û êdî zuhabûn bûye astengîyeke cidî li hember geşepêdana aborî û gefan li rûberên mezin ên çandinîyê dixwe ku digihêje %60. Herêmên herî zêde yên ku rastî vê metirsîyê tên ên başûr in. rêjeya baranê li van herêman di navbera 100-250mlm de ye. Herêmên din jî rastî vê metirsîyê tên lê bi awayekî kêmtir. Vê yekê jî hiştiye ku hilberîn kêm bibe û pêwîstî bi hawirdekirina hin dahatên çandinîyê di hin salan de hebe. Her wiha carinan garisê zer tev li ard dibe da ku pêdivîya milet bi nan were romalkirin. Bêtir girîngî ji bo genim heye çimkî ew bingeha sereke ya pêkanîna stratejîka ewlekarîya tîmarî ye. Genim nan peyda dike û nan yek ji pêdivîyên mirovî yên herî pêwîst li Sûrîyê ye. Her wiha ev berhem derfetên kar peyda dike (ji bo kesên di biwarê çandinîya wî û biwarên girêdayî wî de

dixebitin). Ev jî dihêle betalî kêm bibe. Her wiha genim di dabînkirina êm ji bermahîyên xwe de girîng e. Ev yek jî hilberîna lawirî zêde û geşepêdan dike. Her wiha girîngî heye ku cûreyên genim ên sereke werin parastin çimkî bi salan ev cûre hatine neqandin û başkirin.

**Bipêşketina rûbera ku bi genim çandî ji sala 2017 heya 2022an:**

Ji alîyê rûbera ku bi berheman li herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyê çandî, genim di pileya duyem de ye. Ew berhema herî girîng e li herêmê. Lîsteya li jêr bipêşketina rûberê di dema lêkolînê de diyar dike. Rûberên ku bi genim hatine çandin (1000 hektar) li herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyê di navbera salên 2017-2022:

| **Sal** | 2017 | 2018 | 2019 | 2020 | 2021 | 2022 |
|---|---|---|---|---|---|---|
| **Rûber** | 590 | 520 | 600 | 620 | 700 | 658 |

Daneyên Desteya Çandinî û Avdanê li herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê

Di lîsteyê de ferehbûna rûbera ku bi genim hatiye çandin li herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyê diyar dibe. Di sala 2021ê de rûber gihaşt nêzî 700 hezar hektarî. Sedema vê yekê jî başbûna barîna baranê û başbûna nirxê genim. Vê yekê jî cotkar han dan ku rûbera çandinîyê zêde bikin lê di sala 2022an de ji ber kêmbûna baranê rûber kêm bû.

**Bipêşketina hilberîna genim (kg/hektar) li herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê :**

| **Sal** | 2017 | 2018 | 2019 | 2020 | 2021 | 2022 |
|---|---|---|---|---|---|---|
| **Hilberîn** | 1800 | 2200 | 2500 | 2600 | 1100 | 900 |

Daneyên Desteya Çandinî û Avdanê li herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê

Di lîsteyê de tê diyarkirin ku hilberîn li gor salan cuda dibe. Ew di salên tijebaran de zêde dibe û di salên kêmbaran de kêm dibe. Kêmbûna hilberîna çandinîya bejî ne tenê girêdayî kêmbûna baranê ye lê belê girêdayî belavbûna vê baranê di qonaxa ajbûna riwekê de jî ye. Sala herî kêm a hilberînê 2022 ye. Gelek sedemên kêmbûna hilberînê hebûn; her wek bilindbûna nirxê pêdivîyên

hilberînê û peydanebûna peyn û semadê û kêmtêghiştina cotkaran di rêbazên çandinîyê yên nûjen de.

**Astengî û zehmetîyên çandinîyê yên berhema genim li herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê :**

- Mekanîzmeya belavkirina ardûyê (mazot) ku ji bo pêxitina jemetoran tê bikaranîn, bi kêr nayê. Her wiha mekanîzmeya belavkirina semadê jî bi kêr nayê çimkî ne di dema xwe de tê belavkirin; di encamê de ev yek sûda wê ji dest dide û piranîya cotkaran neçar dimînin ku semad û mazotê ji sûka reş bi nirxên buha bikirin.

- Mekanîzmeya çavdêrîyê şermok û bêsûd e; tevî ku ew girîng e da ku beşa taybet were şopandin; çimkî hin cûreyên heyberên çandinîyê (tov, derman…) tên firotin ku bandorên bobelatî li xak û riwekên çandinîyê kirin. Her wiha hin madeyên hirmonî û yên qedexe jî bê çavdêrî tên firotin.

- Kêmbûna bikêrhatina raberîyên çandinîyê û kêmbûna cihên raberîyê û yên heyî jî bi awayekî rastîn bi rola xwe ya agahdarkirina cotkaran ranabin û bi awayekî rasterast serpereştîya dorvegerên çandinîyê û qonaxên wê nakin da ku rêjeya herî bilind a hilberînê pêk bînin û berhemaên durist û baş bi dest bixin.

- Bikaranîna rêbazên avdanê yên kilasîkî: Vê jî hiştiye ku dahatên avê kêm bibin û vê jî hiştiye ku gelek cotkar berê xwe bidin hin cûreyên çandinîyê yên pêwîstîya wan bi gelek av tune ye. Her wiha derengmayîn di çeksazkirina torên avê de heye.

- Nirxê semad û tov bilind bûye û piştgirîya teknîkî û komîteyên serpereştîyê nemane. Her wiha qerzên diravî ji bo cotkaran nemane.

**Alîyên destwerdanê yên pêşinyarkirî:**

- Pêwîst e bi rêya torên avdanê yên nûjen pişta cotkaran were girtin çimkî ew di zêdekirina rûbera çandinîyê û kêmkirina perelêdanê û kêmkirina keda avdanê de gelekî girîng in.

- Pêwîst e hevkarî di navbera rêxistinên ne hikûmî û yên xwecihî û sazîyên xwecihî de pêk were da ku perwerdeyên fêrkirinê der barê bikaranîna herî baş a teknîkên çandinîyê yên nûjen de werin dan; da ku hilberîn were başkirin. Her wiha da ku pêvajoyên çandinîyê bi awayekî durist werin bikaranîn û rê li ber bikaranîna tov û deremanên nedurist were girtin.

- Gerek e girîngî ji bo karê hevbeş were dan, cotkar di koperatîfan de werin birêxistinkirin û perwerde der barê karê hevbeş û mekanîzmeya karê koperatîfan de werin dan.

- Pêwîst e hevkarî di navbera rêxistin û alîyên hikûmî de pêk were da ku torên avê werin çeksazkirin û coyên avdanê yên nûjen werin bikaranîn. Ev yek jî dê hilberîn û rûbera zevîyên çandinîyê zêde bike.

- Pêwîst e lêkolînek der barê kêmkirina nirxê sûtemenîyan ji bo cotkaran de were çêkirin da ku nirxekî domdar were danîn ku hemû pêdivîyên cotkaran dabîn bike. Ev yek nirxê sûtemenîyan li bazarê kêm dike çimkî nema zêde li bazarê tê xwestin.

- Ji alîyê firotina genim, pêwîst e dezgehên Rêveberîyê û bi hevkarîya bi pisporîyên xwecihî û navneteweyî hewil bidin lêçûnên veguhestina genim bo navendên radestkirinê kêm bikin û hêsanîyan di vê biwarê de pêşkêş bikin; nexasim ji bo cotkarên biçûk. Her wiha gerek e hewil bidin ku pêngava radestkirina genim bi rêxistin bikin. Di encamê de dema libendêmanê kêm bibe; ew jî bi rêya xurtkirina şiyanên kargêrî û mirovî yên peyda. Her wiha pêwîst e rêkar werin hêsankirin û astengî û kelem werin rakirin da ku pereyên cotkaran zû ji bo wan werin dan.

Ji ber ku beşeke mezin a niştecihên herêmê xwe dispêrin genim weke jêdereke sereke ya dahatê û ji ber stratejîka vê berhemê û alîkarîya wê di peydakirina ewlkarîya tîmarî de, pêwîst e ev astengîyên li pêşberî vê berhemê derdikevin, werin rakirin da ku berjewendîya cotkar were dabînkirin û domdarîya hilberînê bi awayekî baş wer pêkanîn; ev jî pergala çandinîyê dê bi pêş bixe.

### Berhema ceh:



Ceh ji alîyê rûber û hilberînê ve berhema êm a herî girîng li herêma lêkolînkirî ye. Dema girîngî ji bo wê tê dan, armanc jê başkirina sewaldarî û pêkanîna hevsengîyê di navbera hilberîna riwek û lawirî de ye. Ji ber ku bi awayekî xwecihî û cîhanî gelekî tê xwestin, pêwîst bû hilberîna wî bi hemû rêbazên çandinîyê yên peyda were zêdekirin da ku pêdivîya xwecihî were dabînkirin û hilberîna lawirî were piştgirtin. Di encama zuhabûna ku herêm rastî tê, hilberîna ceh kêm bû û lêçûnên çandinîyê zêde bûn. Vê yekî bandoreke neyînî li beşa lawirî li herêmê kir, çimkî ew bi awayekî rasterast girêdayî vê berhemê ye. Her wiha ji ber ku astengîyên firotinê jî hene, gelek cotkar naxwazin vê berhemê biçînin.

**Bipêşketina rûbera ku bi ceh hatiye çandin li bakur û rojhilatê Sûrîyê .**

| **Sal** | 2017 | 2018 | 2019 | 2020 | 2021 | 2022 |
|---|---|---|---|---|---|---|
| **Rûber** | 616 | 630 | 750 | 920 | 880 | 800 |

Ji lîsteyê tê diyarkirin ku rûbera ku bi ceh hatiye çandin li herêmê zêde bûye û sala herî zêde hatiye çandin 2020 bû, rûbera hatî çandin jî 920 hezar hektar bû. Ew jî ji ber ku baran di sala 2019an de baş hat lê di sala 2022yan de ji ber zuhabûna sala 2021ê, rûber kêm bû.

**Qasiya ku ji ceh tê hilberandin (bi hezar tonan):**

| **Sal** | 2017 | 2018 | 2019 | 2020 | 2021 | 2022 |
|---|---|---|---|---|---|---|
| **Hilberîn** | 550 | 510 | 1250 | 1400 | 81 | 51 |

ji lîsteyê tê diyarkirin ku hilberîna ceh li herêmê di salên 2019-2020an de zêde bûye; ew jî ji ber barana baş. Di sala 2022yan de hilberîn gihaşt melyon û 400 hezar tonî û paşê di sala 2021ê de ji ber kêmbûna baranê, hilberîn gelekî kêm bû.

**Astengî û zehmetîyên ku rastî berhema ceh li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê tên:**

- Bazareke hikûmetê ya firotina ceh tune ye.
- Pêdivîyên hilberînê buha bûne.
- Bazirgan destwerdanê di nirxê ceh de dikin.
- Tovê baş û paqij tune ye û bêtir cotkar xwe dispêrin cûreyên hawirdekirî.
- Gelek cotkar dev ji ceh berdidin û berê xwe didin berhemên bisûdtir.

**Alîyên destwerdanê:**

- Pêwîst e piştа cotkaran bi pêdivîyên çandinîyê û tovên baş were girtin.
- Pêwîst e pişta wan bi torên avdanê yên nûjen were girtin da ku rûbera çandî were zêdekirin û lêçûn û ked were kêmkirin.
- Pêwîst e perwerde ji bo cotkaran der barê rêbazên herî baş ên çandinîyê û teknîkên nû û girîngiya karê hevbeş de werin dan.

**Berhema pembo:**



Pembo yek ji berhemên herî girîng ên stratehî û civakî ye. Nêzî %18 karker tê de dixebitin (ji çandinîyê dest pê bike û heya tu bigihêjî asta mezaxtina wî). Ne tenê wisa, pembo berhemeke hinardekirî ye. Çandina pembo yek ji girîngtirîn berhemên avdayî yên herêmê ye.

Pembo yek ji berhemên ku rastî gelek kêşeyan hatiye. Vê yekê jî bandor li kêmbûna hilberîn û dahatên wê kiriye. Vê jî hişt ku gelek cotkar êdî nema pembo biçînin.

Rûberên ku bi pembo hatine çandin (hezar hektar) di navbera salên 2017-2022 de

| **Sal** | 2017 | 2018 | 2019 | 2020 | 2021 | 2022 |
|---|---|---|---|---|---|---|
| **Rûber** | 16 | 48 | 33 | 24 | 18 | 27 |

Daneyên Desteya Çandinî û Avdanê li herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê

Di lîsteyê de cudabûna rûbera ku bi pembo hatiye çandin li herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyê diyar dibe. Di sala 2018an de rûbera herî zêde hat çandin ku gihaşt nêzî 48 hezar hektarî. Paşê careke din kêm bû di sala 2022yan de gihaşt 27 hezar hektarî. Ev kêm bûn ji li hejmarek sedem vedigere, her wek: bawerî nema tê ka berhem dê nirxê lêçûna xwe derxe, dabînkirina cûreyên baş ên pembo ne peyda ne, sûtemenî têrê nake çimkî pêwîstîya pembo bi kêmanî bi 14 car avdan heye (hefteyê carekê).

**Astengî û zehmetîyên ku rastî berhema pembo li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê tên:**

- Bazirgan destwerdanê di nirxê pembo de dikin çimkî bazareke hikûmetê ya firotina wî tune ye.
- Tovê baş û paqij û ji jêdereke piştrast tune ye û piraniya cotkaran xwe dispêrin cûreyên başkirî çimkî ew li hember afetan bêtir xwe digirin. Ji vî cûreyê tove re tovê reş tê gotin.
- Pêdivîyên hilberînê buha bûne.
- Gelek cotkar dev ji ceh berdidin û berê xwe didin berhemên bisûdtir çimkî hilberîna wê kêm e û lêçûnên wê zêde ne.

**Alîyên destwerdanê:**

- Pêwîst e pişta cotkaran bi pêdivîyên çandinîyê û tovên baş were girtin da ku lêçûn kêm bibin û dahata cotkaran ji vê berhemê zêdetir bibe

- Pêwîst e pişta wan bi torên avdanê yên nûjen were girtin da ku sûd were zêdekirin û lêçûn û ked were kêmkirin.

- Pêwîst e hewil were dan ku enerjîyên berdêl (enerjîya rojê..) werin bikaranîn da ku lêçûnên xerçkirina mazotê werin kêmkirin û dev jê were berdan

- Hevkarî di navbera rêxistin û sazîyên xwecihî de were kirin da ku asta hilberînê zêdetir bibe; ev jî bi rêya dana perwerdeyan da ku pisporîya cotkaran zêdetir bibe û karibin teknîkên çandinîyê yên nû werin bikaranîn.

- Li gor pêdivîya vê berhemê mazot were zêdekirin û di demên wê de werin dan û nirxê wê jî ji bo cotkaran were kêmkirin.

- Çavdêrî li ser pêdivîyên hilberînê li bazarên xwecihî ji alîyê cûre û kiwalîtê ve were zêdekirin û tov li gor pêdivîya cotkaran were dabînkirin.

- Pêwîst e bi awayekî pêşwext were ragihandin ka ev berhem dê were kirîn û firotin an na û nirxê wê jî were diyarkirin. Pêwîst e ev nirx bi lêçûnan re guncav be û pêwîst e nirxê hawirdekirin û hinardekirina wê jî arzan bibe û rêkarên derbasbûnê hêsan bibin

**Garisê zer**



Garisê zer yek ji berhemên himbizker ên girîng e. Ew li gola Feratê xwedî girîngiyeke çandinî û aborî ye. Reqa yek ji herêmên ku garis bi qasîyên gelek lê tê çandin û hilberîneke baş ji vê riwekê derdixe. Çinîna garisê zer jêdereke girîn a dahat, tîmar û ewlekarîya tîmarî ji bo cotkar û civakên xwecihî ye. Lê hin astengî hene li pêşberî cotkaran derdikevin her wek arzanbûna nirxê garis, bilindbûna nirxên lêçûnê û kêmbûna ava avdanê (ji ber kêmkirina rêjeya avê di Çemê Feratê de)

Garisê zer yek ji berhemên ku bikaranînên wê pir in. mirov dikare wê di gelek pîşeyan de bi kar bîne, her wek çêkirina êmê lawiran, xwarina mirovan…Jixwe seqa û xaka Reqayê ji bo çandina garis guncav e; çimkî seqaya herêmê germ û zuha ye û havînên wê dirêj in. pêwîstîya garisê zer bi qasîyeke rêjeyî (navîn) a avê heye û gerek e xaka wê bi hêmanên tîmarker zengîn be da ku hilberîneke baş were bidestxistin.

**Qasîyên hilberînê yên garisê zer di navbera salên 2017-2022**

| **Sal** | 2017 | 2018 | 2019 | 2020 | 2021 | 2022 |
|---|---|---|---|---|---|---|
| **Hilberîn** | 50 | 51 | 55 | 74 | 75 | 90 |

Daneyên Desteya Çandinî û Avdanê li herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê

Di lîsteyê de tê diyarkirin ku hilberîn li gor rûbera çandî zêde dibe. Sala gelekî zêde hilberîn tê de hebû, 2022 bû ku hilberîn gihaşt 90 hezar tonî.

**Astengî û zehmetîyên çandinîyê yên berhema garisê zer:**

Dibe ku astengîyên ku cotkarên garis li Reqayê rastî tên ev bin: Guhertina seqayê, kêmbûna dahatên avê, nexweşî, afatên çandinîyê û kêmbûna cihên ku garis lê tê zuhakirin. Ev jî dihêle gelek cotkar garis li ser rêyên giştî zuha bikin. Di encama vê yekê de jî gelek qezayên rê çêdibin. Tevî wê jî xebat ji bo başkirina vê çandinîyê û xurtkirina lêkolînên çandinîyê ji hêla Rêveberîya Xweser ve berdewam in da ku ev astengî werin derbaskirin û hilberîna vê berhemê baştir bibe. Hejmarek zuhakerên garis hene lê ji ber berhema zêde, ev zuhaker têrê nakin.

**Alîyên destwerdanê yên pêşinyarkirî:**

- Pêwîst e hevkarî di navbera rêxistin û sazîyên xwecihî û de pêk were da ku zehmetîyên firotinê ji alîyê hilandin û zuhakirinê ve werin çareserkirin.
- Pêwîst e torên avdanê yên nûjen werin bikaranîn da ku kêmbûna dahatên avî were qerebûkirin.
- Pêwîst e perwerdeyên fêrkirinê der barê çareserkirina afatên berhemê werin dan da ku pêvajoyên çandinîyê bi awayekî durist werin bikaranîn.

Hilberîna garis yek ji dahatên girîng ên dabara jiyanê, tîmar û pêkanîna ewlekarîya tîmarî ji bo cotkar û civakên xwecihî ye. Garis geşepêdana çandinîyê ya domdar xurt dike û sûdmendîya aborî û jîngehî li herêmê pêk tîne. Bi rêya bikaranîna rêbazên çandinîyê yên nûjen û veberhênana di biwarê lêkolîna çandinîyê de, ev berhem dikare pêşerojeke baş ji bo beşa çandinîyê û civakên xwecihî pêk bîne.

**Kemûn:**



Riwekên bijîşkî û bênxweş (biharat) ji riwekên herî kevin in ku mirov ew nas kirine. Di serdema me de jî gelek bikaranînên wan hene. Ew weke madeyên parastina xwarinan ji xerabûnê, çêjxweşkirinê, dilbijînê û ji bilî van bikaranînan,

tên bikaranîn. Her wiha ew di nav dermanan de jî tên bikaranîn çimkî hin madeyên bikêr tê de hene ku gelekî ji bo dermanan girîng in. ji ber ku pêwîstîya wan gelekî bi avê tune ye û ji bo firotinê baştir in, vê yekê hişt gelek cotkar berê xwe bidin çandina wan.

Rûberên ku bi kemûnê hatine çandin (hezar hektar) di navbera salên 2017-2022 de

| **Sal** | 2017 | 2018 | 2019 | 2020 | 2021 | 2022 |
|---|---|---|---|---|---|---|
| **Rûber** | 23 | 21 | 19 | 17 | 11 | 15 |

Daneyên Desteya Çandinî û Avdanê li herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê

Ji lîsteyê tê diyarkirin ku rûbera çandinîyê li gor salan tê guhertin û her ku diçe kêmtir dibe; ew jî ji ber ku lêçûnên wê gelek in û metirsîyên jîngehî li ser vê berhemê hene.

**Astengî û zehmetîyên ku rastî berhema kemûnê tên:**

- Bazirgan destwerdanê di nirx û firotina kemûnê de dikin.
- Tovê baş û paqij û ji jêdereke piştrast tune ye û piraniya cotkaran xwe dispêrin cûreyên başkirî çimkî ew li hember afetan bêtir xwe digirin. Ji vî cûreyê tove re tovê reş tê gotin.
- Pêdivîyên hilberînê buha bûne, nexasim nirxê tovê kemûnê li hember berhemên din.
- Çinîna bi destan lêçûnan zêdetir dikin.
- Metirsîya nexweşî û afatan heye.
- Kemûn gelekî bi rewşa jîngehê bandor dibe.

**Alîyên destwerdanê:**

- Hevkarî di navbera rêxistin û sazîyên xwecihî de were kirin da ku asta hilberînê zêdetir bibe; ev jî bi rêya dana perwerdeyan da ku bêtir karibin li hember nexweşîyên kemûnê li ber xwe bidin.
- Pêwîst e pişta cotkaran bi pêdivîyên çandinîyê û tovên baş were girtin û dermanên baş û werin bikaranîn.

- Patoz werin peydakirin da ku ked û lêçûn werin kêmkirin.
- Agahdarî were zêdekirin da ku karê hevbeş di hilberîn û firotina komî de were pêkanîn, çimkî ev yek hilberînê zêde dike.

**Bacanên sor**



Hilberîna çandinîyê(nexasin sepze), tevî hemû astengîyan, li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê  gelekî bi pêşk ketine. Astengîyên herî girîng ev in: lêçûnên çandinîyê (kirîya alavên ku di çandinîyê de tên bikaranîn, nirxê tov, semad û sûtemenî û alavên veguhestinê) zêde bûnearmanc ji dana girîngîyê ji bo hilberîna sepzeyan (nexasim spezeyên havînê), ji bo pêkanîna xwetêrkirinê ji bo niştecihên herêmê û peydakirina pêdivîyên herêmê ji sepzeyan e. her wiha da ku hevrikîyê bi sepzeyên hawirdekirî re bikin da ku nirxê wan arzan bibe. Tê dîtin ku gelek cotkar êdî berê xwe didin çandina di konên bilastîkî de. Tevî ku hejmarek astengî li hember çandina di konên bilastîk de hene jî (her wek buhabûna avakirina van konan û xerabbûna van konan gelek caran ji er bayê dijwar û baranên pir) lê ew tecrubeyeke baş e ku dikare alîkarîyê di pêkanîna xwetêrkirinê ji sepzeyan pêk bîne, hilberîna çandinîyê zêde bike û derfetên kar peyda bike. Berhema bacana sor weke nûner ji sepzeyên havînê yên li herêmê hat lêkolînkirin.

**Rûberên ku bi bacanên sor hatine çandin (hezar hektar) di navbera salên 2017-2022 de**

| **Sal** | 2017 | 2018 | 2019 | 2020 | 2021 | 2022 |
|---|---|---|---|---|---|---|
| **Rûber** | 4.2 | 2.3 | 2.8 | 3.1 | 3.5 | 3.2 |

Daneyên Desteya Çandinî û Avdanê li herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê

Ji lîsteyê diyar dibe ku rûbera herî zêde ku tê de bacan hatine çandin, di sala 2017an de bû ku ew jî 4 hezar hektar bû. Paşê kêm bû û di sala 2019an de gelekî kêm bû. Ev jî diyar dike ku astengî hene, her wek zêdebûna lêçûnê, kêmbûna dahatên avê  ku bandor li rûbera ku bi bacanan hatiye çandin, kir.

**Qasîyên hilberînê yên bacanên sor di navbera salên 2017-2022**

| **Sal** | 2017 | 2018 | 2019 | 2020 | 2021 | 2022 |
|---|---|---|---|---|---|---|
| **Hilberîn** | 110 | 45 | 63 | 68 | 85 | 74 |

Daneyên Desteya Çandinî û Avdanê li herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê

**Astengî û zehmetîyên ku rastî berhema bacanên sor tên:**

- Hin cûreyên baş ên tov ji bazaran qut bûne û li şûna wan tovên ku jêdera wan ne diyar e û kiwalîteya wan ne gelekî baş e tên bikaranîn. Ev jî dihêle mûsim bi bin bikeve. Di necamê de rûberên ku bi bacanan hatine çandin kêm bûne.
- Bilindbûna lêçûnên hilberînê dihêle hevrikîya sepzeyên xwecihî li hember ên dahatî kêm be.
- Di peydakirina pêdivîyên hilberînê de (semad, derman û tovê nedurist) xwe dispêrin bazirgan û beşa taybet.
- Xwe di çandinîyê de dispêrin dêzilê.
- Xwe dispêrin avdana kilasîkî. Ev yek jî ked û lêçûnan zêde dike  û rûbera çandinîyê kêm dike.

**Alîyên destwerdanê:**

- Pêwîst e pişta cotkaran bi pêdivîyên hilberînê were girtin da ku cûre û hilberîn baştir bibe.
- Pêwîst e pişta cotkaran bi pêdivîyên çandinîyê were girtin; her wek konên bilastîkî çimkî ew hilberînê zêde dikin û lêçûnan kêm dikin.
- Pêwîst e pişta cotkaran bi torên avdana bi dilopan were girtin da ku xerçkirina avê kêmtir bibe û lêçûn û ked kêmtir bibe.

- Perwerde werin dan da ku pêvajoya çandinîyê baştir bibe û cotkar girîngîya çandinîya di konên bilastîkî de û avdana nûjen û tenkînên çandinîyê yên nûjen binase,

**Zeytûn:**



Zeytûn dareke aborî ye ku dahateke baş dide cotkaran. Pêwîstîya wê bi ava zêde tune ye li gor darên din. Gelek cûreyên zeytûnan hene, her wek zeytûnên zeytê, xelxalî, nebalî, soranî…Lê zeytûnên herî zêde berbelav li herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyê (bi taybet li Minbic û gundewarên wê) zeytûnên zeytê, xelxalî û soranî ne. darên zeytûnan bi qasî %20 ji rûbera zevîyên çandinîyê li Minbic û gundewarên wê mijûl dikin. Mirov dikare bibêje ku hilberîna zeytûnê li Minbic û gundewarên wê, Bakur û Rojhilatê Sûrîyê romal dike. Her wiha zêdeyî herêmê jî hilberîn heye loma ji bo derveyî herêmên Rêveberîya Xweser jî tê hinartin.

Pêwîstîya dara zeytûnê bi du-sê avan heye heta ku têra xwe bistîne. Her wiha gerek e zevî sê-çar caran di salê de were cotkirin. Yek ji taybetmendîyên zeytûnan ew e ku salekê ber baş digire û salekê na. niha jî gelek cotkar cûreyê xelxalî yê zeytûnan diçînin çimkî ew bêtir xwe li ber nexweşiyan digire û dahata wî baş e. Mûsimê zeytûnan ji bo niştecihên herêmê (herêma gola Feratê ya bakur di navbera Cernîye û Tebqayê de) weke mûsimekî sereke ye.

**Rûberên ku bi zeytûnan hatine çandin (hezar hektar) di navbera salên 2017-2022 de**

| **Sal** | 2017 | 2018 | 2019 | 2020 | 2021 | 2022 |
|---|---|---|---|---|---|---|
| **Rûber** | 19 | 19 | 19 | 19 | 19 | 19 |

Daneyên Desteya Çandinî û Avdanê li herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê

Ji lîsteyê diyar dibe ku rûbera bi darên çandinîyê çandî ye, weke xwe maye; ew jî ji ber ku di salên lêkolînê de bi pêş neketiye. Ev jî diyar dike ku astengî li hember pêşxistina çandina wê hene, lêçûnên wê zêde ne û şitlên baş tune ne.

**Qasîyên hilberînê yên zeytûnan di navbera salên 2017-2022**

| **Sal** | 2017 | 2018 | 2019 | 2020 | 2021 | 2022 |
|---|---|---|---|---|---|---|
| **Hilberîn** | 16.5 | 16.5 | 20.1 | 19.8 | 18 | 15 |

Tevî ku rûber weke xwe maye jî lê hilberîn di hin salan de cuda ye; ew jî li rewşa seqayê vedigere û ji ber ku zeytûn salinan berhema wê zêde ye û salinan na. sala herî zêde biberhema 2019 e ku 20 hezar ton jê hatin. Sala herî kêmberhema jî 2022 ye (15 hezar ton).

**Astengî û zehmetîyên ku rastî berhema bacanên sor tên:**

- Bilindbûna nirxê lêçûna hilberînê û xwedîkirina daran.
- Hin dermanên dijafat bi kêrî darên zeytûnan nayên, ev jî bandorê li hilberînê û cûreya wê dike.
- Cotkar xwe dispêrin dîzelê weke jêdereke enerjîyê. Ev jî lêçûnan zêdetir dike û avdan di dema wê de pêk nayê.
- Xwedîyên gufaşgehan astengîyan ji ber tunebûna pîşeyên xwecihî yên madeya ``tefel`` (paşmayên zeytûnan piştî gufaştinê) dikişînin. Jixwe ji vê madeyê sabûn û komir tên çêkirin. Nirxê wê ji derveyî bakur û rojhilatê Sûriyeyê ji hundirê wê zêdetir e.

**Alîyên destwerdanê:**

- Pêwîst e pişta cotkaran bi perwerdeyan were girtin da ku girîngîya zeytûnan binasin.
- Gerek e bi rêya tora avdanê ya bi dilopan, pişta cotkaran were girtin da ku ked û lêçûm kêm bibin.
- Pêwîst e bi rêya dabînkirina pêdivîyên çandinîyê (derman û semad) pişta cotkaran were girtin.